



**K. T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

**Ezmuna Teyyib Cebbar ya Helbest û Rexne**

**DILSHAD JALAL M. AMIN**

**15950001075**

**WAN – 2017**

K. T.  
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSÂ BILIND

Ezmuna Teyyib Cebbar ya Helbest û Rexne

Amadekar

DILSHAD JALAL M.AMIN

15950001075

Şêwirmend

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

WAN - 2017

T.C  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEYYİP CEBBAR ŞİİRİNE ELEŞTİREL BİR YAKLAŞIM

HAZIRLAYAN  
DILSHAD JALAL M. AMİN  
15950001075

DANIŞMAN  
Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

VAN – 2017

## NAVEROK

NAVEROK.....	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	V
ABSTRACT.....	VII
SIPASÎ.....	IX
Pêşkêşe.....	X
PÊŞGOTÎN.....	XI
DESTPÊK.....	1
1.1. LÎ SER TEYYÎB CEBBAR ÇI HATINE NIVÎSANDIN:.....	12
1.2 SERDEM Û JIYANA REWŞENBÎRIYA HELBESTVAN:.....	31
1.2.1 HELBESTVAN Û JIYANA SIYASÎ:.....	32
1.2.2 TEYYÎB CEBBAR Û JIYANA WÊJEYÎ:.....	33
1.2.3 BERHEMÊN HELBESTVAN:.....	40
1.3 BANDORIYÊN WÊJEYA EREBÎ LI SER HELBESTVAN:.....	42
1.4 TEYYÎB CEBBAR Û BERHEMÊN WÎ YÊN REXNEYÎ :.....	43
2. NAVEROKA MIJARÊN HONANDINÊ YÊN TEYYÎB CEBBAR:.....	52
2.1 Helbestên siyasî:.....	52
2.2 Helbestên Mirovatiyê (Humanistî):.....	60

2.3 Helbestên Felsefî:.....	64
2.4 Helbestên Evîndariyê:.....	74
3. HELBESTVAN Û NÛVEKIRINA SÎMA:.....	81
3.1 Awaz û Mûzîka Honandinê:.....	81
3.1.1 Awazên Derveyî Yên Tekstan:.....	83
3.1.2 Awaza Nava Tekstê:.....	97
3.2. Wêneyê Hunerî:.....	111
3.2.1 Çemk û Pênaseya Wêneyê Hunerî:.....	111
3.2.2 Wêneyê Tak û Wêneyê Lihevxiştî (Tevlîhev):.....	114
3.2.3 Wêneyê Rawesteyî – El-Sure El-Sabîte - Fixed Image:.....	118
3.2.4 Wêneyê Hestî:.....	121
3.2.5 Hinek Corên Din Ên Wêneyan:.....	130
3.3 Zimanê Şî'rî:.....	134
3.3.1 Peyvên Kurdî yên Resen û Nû:.....	140
3.3.2 Peyvên Biyanî:.....	145
3.3.3 Xwestî (Mecazî):.....	146
3.3.4 Sembol (Hêma):.....	148
ENCAM:.....	158
ÇAVKANÎ:.....	161

## KURTE

Eşkere ye ku helbest û rexne dû beşên girîng ên wêjeya hemû cîhanê ne. Ew jî bûye sedemeke girîng ku lêkolîneke xûrt û bi hûrgilî ya bi navê “Ezmûna Teyyib Cebbar ya Helbest û Rexne” encam bidin, Teyyib Cebbar yek ji helbestvan û rexnegirên diyar ê şêwezarê Kurmanciya Jêrîne (Sorani) li Başûrê Kurdistanê. Di sala 1954'an de li gundê Tepelû yê ser bi parêzgeha Kerkûkê ji dayîk bûye û bi xweşbextî niha jî dijî. Di vê lêkolînê de bi tevî ku behsa jiyan, asta rewşenbîrî û ew bûyerên ku bandor li ser jiyanê Teyyib Cebbar hebûne, her wiha bi awayeke teorî û praktîkî jî me helbest û rexneyên helbestvan berçav kirine bi tevî nivîskarên Kurd, Ereb û Faris. Lê ji ber nebûna şarezayîya me li ser zimanê Farsî tenê me hewl ji bo komkirina wan dîtin, nêrîn, gotar û lêkolînan daye ku bi zimanê Kurdî û Erebî li ser hatine encamdan. Me di beşeke din a lêkolînê de behsa mebest û naveroka berhemên helbestvan kiriye, bi taybetî ji aliyê siyasî, aborî, mirovatî, felsefîk û evîndarî. Piştî jî me behsa awaz û mûzîka hundirîn û derveyî yê helbestên wî bi awayeke teorî û praktîkî kiriye ku xwe di pîvan, qafiye, dûbarebûna deng, peyv, hevok û deste peyvyan de dibîne bi tevî behskirina mijarên rewanbêjîyê. Bi taybet ew mijarên ku helbestvan di helbestên xwe de girîngî pê daye weke şibandin, diywate û peyvên dûçeng. Her di vê lêkolînê de behsa wêneyên hunerî bi awayeke giştî hatiye kirin û piştî me hinek cureyên wêneyên hunerî di helbestên wî de berçav kirine. Ji ber ku helbestvan di helbestên xwe de girîngiyê mezîn bi wêneyên hunerî daye, ji aliyê ziman ve jî bi awayeke giştî me behsa zimanê honandinê kiriye û hinek dîtin û nêrînên nivîskar û helbestvanan me li ser zimanê helbestê berçavkiriye. Diyare Teyyib Cebbar jî girîngiyê zêde bi zimanê honandinê daye. Ji ber ku ziman ji bo gihandina peyama helbestvan faktoreke girîng e. Teyyib Cebbar zimanê sade û sakar bikaraniye. Ji ber ku helbestvan di vê baweriyê de ye divê helbest ji bo tevayî xelkê bête nivîsandin ne bi tenê ji bo çîn û nifşeke diyarkirî ya civakê.

Her çiqas helbestvan hewl daye kêmtirîn peyvên biyanî bikarbîne lê hinek caran jî peyvên Erebi di helbestên wî de tîn dîtin bi tevî ku sîmayeke Kurdî jî bi wan peyvên daye.

Her wiha helbestvan destekê bilind di mecaz û hêmayan de hebû lewra di piraniya tekstên wî yê helbestan de ew mijar tîn dîtin. Me jî li gorî şiyana xwe di lêkolîna xwe de ew mijar di helbestên wî de destnîşan û şîrove kirine. Ji ber ku rexne jî bi aliyê girîng tîn dîtin ji bo pêşvebirin û geşkirina asta rewşenbîriya civakê. Lewra Teyyib Cebbar çî weke helbestvan an jî rexnegir û rewşenbîrek diyar bi berdewamî di xizmeta neteweya xwe de bûye. Lewra bi berdewamî bi çavê rexneyî ve li berhemên wêjeyî, bûyer û guhertinên hevçax nêriye ji bo bilindkirina asta rewşenbîriya neteweya xwe.

## ÖZET

Şiir ve eleştiri, bütün dünya edebiyatının iki önemli bileşenidir. Bu da, “Teyyib Cebbar’ın Şiirine Eleştirel Bir Yaklaşım” adlı eserine detaylı ve güçlü bir incelemeyle yaklaşmamızın önemli bir nedenidir. Teyyib Cebbar, Soranî lehçesinin çok önemli bir şairi ve eleştirmenidir. 1954 yılında Kerkük’e bağlı Tepelu köyünde doğdu ve hâlâ hayattadır. Bu incelemede, Teyyib Cebbar’ın hayatı, aydın kişiliği ve yaşamının etkileyen şartlar üzerinde durduğumuz gibi, teorik ve pratik olarak, şairin eleştiri ve şiirlerini gözönüne alarak Kürt, Arap ve Fars yazarlarının onun eserleri hakkındaki değerlendirmeleri ele aldık. Ancak Farsça konusunda yeterli bilgimiz olmadığı için, daha çok Kürtçe ve Arapça eserlerde yapılan eleştiri, yorum, görüş ve incelemeleri esas aldık. İncelemenin bir bölümünde eserlerinin içerik ve amacı üzerinde durarak, onun siyasi, ekonomik, insani, felsefik ve sevgi konularını işleyiş biçimini inceledik. Daha sonra, şiirlerinin içeride ve dışarda şarkılarda nasıl kullanıldığını ki bu da daha çok kendini, ölçü, kafiye, ikileme, söz, mısra ve dördlüklerde gösteriyor. Her ne kadar retorikten bahsetsek de, şair, eserlerinde benzetme, zıtanlamalı ve çokanlamı kelimeleri kullanmaktadır. Bu incelemede, genel olarak sanatsal resimleri de ele aldık ve bu sanatsal betimlemelerin şiirlerinde nasıl kullanıldıklarını inceledik. Çünkü şair, eserlerinde sanatsal betimlemelere çok önem vermektedir. Dil konusunda da, özellikle onun dili nasıl işlediğini ele aldık, bazı şair ve yazarların bu konudaki görüş ve yorumlarına yer verdik. Tayip Cabar, dili bir örgü gibi işlemeyi çok önemsemiştir. Çünkü dil, şairin mesajlarının iletilmesinde çok önemli bir faktördür. Şair sade ve basit bir dil kullanmayı seçmiş. Şiirlerinin bütün toplumu hedeflemesi gerektiği inancındadır. Şiirin sadece belli bir sınıf ve kesime hitap etmesini doğru bulmaz.

Her ne kadar, şair çok az sayıda yabancı kelime kullanmayı esas almışsa da, yer yer Arapça kelimeler şiirlerinde yer almakta ve bunlara Kürtçe bir anlam da katmaktadır.



Bütün metin ve şiirlerinde mecaza özel bir önem verdiđi görölmektedir. Biz de, bu incelememizde gücümüz yettiđince, bu konuyu şiirlerinde işaret ettik ve yorumladık. Çünkü toplumun aydınlanma düzeyinin geliştirilmesinde eleştiri çok önemli bir yer tutmaktadır. Bundan dolayı, Teyib Cebbar, bir şair, eleştirmen ve aydın olarak her zaman ulusunun hizmetinde olmuştur. Her zaman eleştirel bir gözle tüm edebi eserleri incelemiş, çağdaş olay ve gelişmeleri kendi ulusunun aydınlanma düzeyinin geliştirilmesi için ele almıştır.



## **ABSTRACT**

It is clear that poetry and criticism are major parts of the world's literature, so this was an important factor to prepare a detailed research about "A Critical Approach to Teyyib Cebbar's Poetry". Teyyib Cebbar is one of poets and critics of Kurmanji dialect in south Kurdistan. He was born in 1954 in Tapalu village in Kirkuk governorate, and fortunately, he is still alive. In this study apart from his life, his cultural level, and those things that affected on his life, his poems and critical writings are going to be discussed theoretically and practically with other Kurdish and Arab writers. Because of having no experience in Persian language we have just tried to collect those thoughts and studies that are in Kurdish or Arabic. In another part of this research, we have dealt with the purpose and contents of his writings especially from political, humanity, emotional and philosophical point of view.

Later on we have talked about the internal and external tune of his poems theoretically and practically, which can be seen in rhyme, alliteration with mentioning rhetorical subjects especially those subjects that the poet focused on just like simile, contradictory and pun. Also in this research, we have dealt with images in general then the types of images of his poems since the poet has insisted on the images. we have talked about the language that he has used and collected several opinions of the other poets and writers. It is clear that Taib Jabbar has focused on poetry language as an important reason to convey the message. Taib Jabbar has used a simple language because he believes that poetry should be written for all people to understand not just for a specific class. Also Taib Jabbar has tried to use the minimum foreign words, but some Arabic words can be seen in his poems in a Kurdish style. The poet is well experienced in metaphor and denotation so this is clear in his poems. In this research, we have detected those subjects and tried to analyze them.

Criticism can be considered as an important part in the cultural development of society, and Teyyib Cebbar as a poet and egg-head has always tried to serve his nation, so he has often tried to look at the events and other writings of his era from critical point of view so as to improve cultural level of his nation.



## **Spas û Pêzanîn**

Rêz, spas û pêzanînên min:

Serokatiya Zanîngeha Yuzuncu Yilê re heye ku derfeta xwendinê ji min re garantî kir.

Ez pir spasiyan mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yuzuncu Yilê dikim ku bi ked û dilsoziyeke,

Birêz Doç. Dr Seyit Battal Uğurlu ku erkê serperîştîkirina teza min (mastername) li stûyê xwe girt. Bi dîtin û nêrînên xwe rê li pêşiya min ronî kir û serkeftina nameyê gelek li cem wî girîng bû.

Birêz Dr. Elî Tahir Berzincî li Zanîngeha Silêmaniyê bi zanyariyên hûrgilî û zansitî yên xwe hertim alîkariya min kiriye.

Helbestvanê qedirgiran Teyyib Cebbar hêjmareke çavkanî xist ber destên min û hinek caran min hevdîtin ligel saz kir.

## **Pêşkêşe Ji Bo**

Wê moma ku dişewite, daku rêya jiyana min ronahî bike, dayîka min ya mîhrîban.


Wî Kesê ku tovê Muhbet Zanistû Zenyariyê di hundirê Min de perwerde kirî, Bavê min yê koç û Xwedê jê razî.

Xwîşk û birayên min yên hêja

Hevjîna min Derya.

Kurên min Evrêst û Roj

Tevayî ew kesên vê nameyê dixwînin.



## PÊŞGOTÎN

Helbest û rexne dû berhemên girîng ên netewayetî û gêreyeke teji cehwer e ji bo nasnameya wêjeya tevayî gelan. Lewra helbest û rexneyan roleke girîng di dîroka wêjeya Kurdî de lîstine û rayên xwe di wêjeyê de birine xwar û bi yek ji cih û şopên wêjeyî hatine naskirin. Her ji wêjeya klasîk bigre heta bigihe wêjeya nû û hevçax, weke dû amrazên wêjeyî di hinek qonaxan de derbas bûye. Di her serdem û qonaxekê de bûye xwedî hêjmareke taybetmendiyên xwe. Lewra dibînîn di her çaxekê de hinek helbestvan û rexnegirên xurt derketine û bûne stêrkên geş ên serdemên xwe. Diyare Teyyib Cebbar jî weke helbestvan û rexnegirekê wêjeya nû di şêwezarê Kurmancî ya Jêr de dengeke diyar di wêjeya Kurdî de heye û di vî warî de hinek curên helbest û berhemên rexneyî nivîsandiye. Ya balkêş û cihê nêrîna me, ewe ku helbestvan di qonaxên jiyana xwe de weke her takekê din yê neteweya xwe rastî hinek bûyer, karesat û nexweşiyên hatiye. Ew bûyer û karesat kiriye hêvênê piraniya berhemên xwe yê honandî di warên siyasî, mirovatî, felsefî û evîndariyê de. Teyyib Cebbar weke keseke rewşenbîr û şareza di dawiya salên şêstan û destpêka salên heftêyan ên sedeya derbasbûyî de bi zimanek sade û sakar dest bi nivîsandina helbestan kiriye û bi wêne û mijarên rewanbêjî, hêma û xazeyen xwe di helbestan de roleke girîng di wêjeya Kurdî de lîstiyê. Lewra li nava rewşenbîr û rexnegirên wêjeya Kurdî, Erebî û Farsî de jî, rol û ciheke diyar heye û tenê di hinek rojname û kovaran de, hêjmareke nivîskar û rexnegirên wan neteweyan hinek gotar, hevdiîtin û şîrovekarî li ser berhemên wî yê honandinê kirine.

## **Destpêk**

NAV Û NÎŞANA TEZÊ: “EZMÛNA TEYYÏB CEBBAR YA HELBEST Û REXNEYÊ”

## **Sedema Hilbijartina Mijarê**

Li ser helbijartina vê mijarê ku ji (Ezmûna Teyyib Cebbar ya Helbest û Rexneyê) de pêkhatiye. Ji bo wê yekê vedigere ku tu behs û lêkolîneke akademîk a serbixwe li ser jiyana û berhemên helbestvan nehatiye kirin bi tevî ku di hinek gotar û lêkolînên kurt de behsa wî hatiye kirin. Lê tevayî ew serpêyî bûne û bi awayeke akademîk nehatiye nêrîn û gelek alî bi nediyarî mane. Wê sedemê em ber bi wê yekê ve birine ku jiyana, helbest û berhemên wî yê rexneyî bikin hêvî naveroka mijara lêkolîna xwe.

## **Sînorê tezê “çarçoveya tezê”**

Sînorê lêkolînê rûbereke mezine. Heyameke dûr û dirêj e. Ji êş û janên helbestvan tejiye. Her ji wê roja ku helbestvan devê xwe bi zimanê helbestê vekirîye û heta niha. Diyarê ev jî ji helbestvaneke wiha re gelek e, ku berhemên wî digihin zêdetir ji sê dîwanan. Geryan di nava wan dîwanên helbestan de karek wiha hêsan nîne lê li gorî karînan, me hewl daye kêmasiyê nekî û ya ku ji dest me hatibe me bijartin di dîwanên wî de kirîye, hinek wêneyên ciwan û xemilandî û îlham bexş me jê hilbijartine.

## **Armanca Tezê**

Armanca Tezê di destpêkê de berçavkirina jiyana wêjeyî, rewşenbîrî, bandorên wêjeya Erebi û behskirina berhemên rexneyî yê helbestvan e. Piştî berçavkirina naverok û mijarên wî yê helbestî û nûkirina rûhsar û sîmayên honandinê ye li cem helbestvan ku ji (awaza helbestê, wêneyê hunerî û zimanê honandinê) pêkhatiye.

### **Asteng û Pirisgirêkên Tezê**

Diyar e, weke her lêkolîneke din ev lêkolîn jî rastî hin asteng û pirsgirêkan hatiye bi taybetî jî ji aliyê çavkaniyan ve. Ji ber ku ezmûna Teyyib Cebbar ezmûneke nû ye û ew lêkolîn û behsên ku bi zimanê Kurdî li ser hatine kirin gelek kêr in û hêjmara wan jî ji tiliyên destan derbas nabin. Lewra ji bo tejiyêkirina wê valetiyê me sîd ji wan gotar û lêkolînan wergirtiye ku di rojname û kovaran de li ser hatine nivîsandin û wê yekê jî pêdivî bi hewl û westiyaneke mezin hebû ji bo kontrolkirin û serkeftina mijarê.

### **Rêbaza Tezê**

Di lêkolînê de diyare me rêbaza wesfî û şîrovekirinê bikaraniye û di destpêkê de me rêbaza wesfî girtiye ber da ku aliyê teorî yê lêkolînê bi awayeke zanistî berçav bikin û ji bo şîrovekirina tekstên helbestî û praktîzekirina hîmê wêneyî û şîrovekirinê me hewar (pena) ji bo rêbaza şîrovekirina naverokê biriye. Li gelek cihan her dû rêbaz tevî hev dibin û dibine tamamkerên hev dû.

### **Girîngiya Tezê**

Her çiqas ezmûna honandinê ya Teyyib Cebbar tenê lêkolîneke akademîk li ser nehatiye kirin lê ev lêkolîna me hewleke ji bo tamamkirina wate û ramana wan behs û lêkolînên serpêyî ku li ser wî helbestvanî hatine kirin. Ev ji aliyekî ve ji aliyê din ve jî, ji bo nasandina jiyana, berhem û ezmûna honandinê ya helbestvan bi şêwezarê Kurmancî.

### **Bernameya Tezê**

Lêkolîn ji kurtiyek, pêşgotin, sê beş, Encam, çavkanî û kurtiya lêkolînê bi Tirkî û Îngîlîzî pêkhatiye. Di pêşgotinê de nav û nîşana mijarê bi zelalî hatiye berçavkirin, bi tevî sedema hilbijartina mijarê, sînora, armanc, rêbaz, girîngiya lêkolînê, ew astengiyên ku li rastî lêkolînê hatin û ew bernameya ku me peyrew kiriye.



### **Beşa Yekem: Ji Çar Teweran Pêkhatiye**

Tewera yekem: Bi navê "Çi Li Ser Teyyib Cebbar Hatiye Nivîsandin e. Di wê tewerê de em gelek bi hûrgilî li pey wan gotar, nivîsandin û lêkolînan geriyên ku li ser jiyana asayî, rewşenbîrî û hunera Teyyib Cebbar hatine nivîsandin çî bi zimanê Erebî yan jî zimanê Kurdî ku ji aliyê nivîskar û rexnegiran ve li ser jiyana û berhemên helbestvan encamdane, bi taybetî nivîskar û rexnegirên Kurd û Ereb. Ji ber ku helbestvan di destpêkê de bi zimanê Erebî dest bi nivîsandinê kiriye û her wiha ji ber ku şarezayîyeke baş di zimanê Erebî de hebû û kariye bi rêya helbestên xwe peywendiyê xurt di navbera rewşenbîrên Kurd û Ereb de ava bike û her bi wê rêyê jî kariye wan mal wêranî û karesatên ku li ser gelê Kurd de hatine di helbestên xwe de destber bike da ku gelên din jî ji wan mal wêranî û karesatan têbigihin û haya wan jê hebe. Bi tevî nasandina wêjeya Kurdî bi gelên din û ji bo ku peywendiyê wêjeyî û rewşenbîrî di navbera gelê Kurd û gelên din de ava bike. Lewra piraniya helbestên wî çî ewên ku bi zimanê Erebî nivîsandî yan jî ewên ku bi zimanê Kurdî nivîsandî û ji aliyê Ebdûllah Tahir Berzincî ve ji bo zimanê Erebî hatine wergerandin. Li weşanxaneya Dar El-Xawun li Beyrûtê bi navê (Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez) hatine weşandin û bi yekem pirtûka helbestan a Kurdî tê danîn ku li wê weşanxaneyê hatî çapkirin. Ew jî bûye sedem ku hêjmareke mezin a nivîskar û rexnegirên Kurdî û Erebî li ser jiyana û helbestên wî lêkolîn û nivîsandinên xwe hebe û piştî helbestvan weke helbestvaneke hevçax di nava nivîskaran û helbestvanên Kurd û Ereb de hatiye naskirin û heta niha jî lêkolîn li ser berhemên wî têne kirin. Ji ber ku helbestvan şêwazeke taybet û serdemiyane di helbestên xwe de bikaraniye, çî ji aliyê şêwaz û dûrxistina zimanê honandinê yan jî ji aliyê wan hêma û dirûşman ve be ku helbestvan hewar ji bo biriye da ku di nava helbestên xwede amadebûn hebe û bandorê li xwendevan bike.

Tewera Dûyem: Bi navê serdema jiyana, wêje û rewşenbîriya helbestvan e. Di wê tewerê de behsa jiyana asayî ya helbestvan û tevîbûna wî ya jiyana asayî ya civaka Kurd, Ereb, naskirin û peywendîkirina bi wan rêxistin û partiyên siyasî

yên wê serdemê hatiye kirin. Her wiha wan aliyan çî bandorek li ser kesayetiya helbestvan çêkiriye çî weke kesayetiyek rêkxistî yan jî keseke asayî yê di nava civakê de. Piştîre nasandina helbestvan bi wêje û çanda Kurdî û Erebî bi rêya wan rojname û belavkiriyan ku di wê serdemê de hebûn. Her wiha mekanîzma destpêkirina xwendin û nivîsandinê û paşê derketina wî weke helbestvaneke nûxwaz û hevçax di destpêka salên heftê û heştêyan de heta niha.

Tewera Sêyem: Bi navê bandora wêjeya Erebî li ser jiyana helbestvan: Di wê tewerê de me hewl daye behsa wan bandoran bikîn ku di destpêka jiyana zarokatî û ciwaniyê de li ser helbestvan hebûye û karîne Teyyib Cebbar weke miroveke asayî yê nava civakê ji bo nivîskar, helbestvan, rexnegirekê biguherîne bi taybetî bandoriyan çand û wêjeya Erebî. Ji ber ku şarezayiyê baş di zimanê Erebî de hebû her ji destpêka jiyana xwe ya zarokatî û ciwaniyê ve guhdariya sitranên (Em Kelsûm, Necat El-Sexîre, Fayze Ehmed, Ferîd Etreş, Fehed Belan, Semîre Tewfîq, Feyruz, Nezhet Yûsif) kiriye û bandora xwe li ser helbestvan hebûye. Gelek hez ji stiran û dengên wan hunermendan dike ta digihe wê asta ku helbestvan xwe di nava helbestên wan sitranan de dibîne û bi berdewamî di hundirê helbestvan de bijî, piştîre nasandina wî bi sitranan re yan jî hevdem bi tevî guhdarkirina sitranan dest bi xwendina helbestên helbestvanên weke (Seyab, Beyatî, Bilind Heydrey, Nazik Melîke, Fazil Ezawî, Lemîe Ebbas Emare, Mehmûd Derwêş, Nizar Qebanî, Xelîl Hawî, Semîh Qasim, Mihemed El-Fîturî, Ehmed Hîcaz) kiriye. Çî bi rêya wan rojname, kovar û belavkiriyan be ku di wê serdemê de hebûn an jî bi rêya dîwan û berhemên honandî yên helbestvanan be. Piştî tevîbûna wî bi wêje, rewşenbîrî û nasandina wî bi helbestê re bû sedema wê yekê ku helbestvan her ji destpêka jiyana xwe ya ciwaniyê ve dest bi nivîsandina helbestan bike bi zimanê Erebî û hevdem tevî nivîsandina helbestên Erebî dest bi nivîsandina helbestên Kurdî jî kiriye. Ew jî dibin bandora helbestên helbestvanên dawîya salên şêstan, destpêka salên heftêyan û heta derketina wî weke helbestvaneke nûxwaz û hevçax.

Tewera Çarem: Bi navê Teyyib Cebbar û berhemên wî yê rexneyî ye. Di vê tewerê de me hewl daye behsa wan berhemên rexneyî yên helbestvan bikin ku tevî nivîsandina helbestên xwe destpê kiriye û kariye mil bi milê nivîsandina helbestan hêjmareke gotar û berhemên rexneyî jî li ser berhemên helbestvanan an jî li ser wan kêmasî û astengiyan binivîsîne ku li nava civaka Kurd hebûn. Çi di niha de yan jî di berê de, lewra helbestvan niha xwedî hinek gotar, lêkolîn û berhemên rexneyî ye ku ew jî bûye sedema naskirina helbestvan û dewlemendkirina wêjeya rexneya Kurdî. Naskirina helbestvan bi rexne û berhemên rexneyî bû sedema wê yekê ku helbestvan beriya her rexnegirekê nixandinê ji helbestên xwe re bike û bi çaveke teji rexne li helbestên xwe binêre. Ew jî sedemek bû ku di nivîsandina helbestên xwe de hûrtir û haydartir be. Ji ber ku beriya her kesekî bi xwe helbestên xwe dixist bin amajekariyên rexneyî, wê yekê jî ewqas bêtir berhemên wî dewlemendtir kir.

### **Beşa Dûyem**

Bi navê naverok û mijarên helbestên Teyyib Cebbar e. Ew beşa teorî û praktîkî behsa her curekî ji curên helbestê hatibe kirin. Me amaje bi mînakek ji helbestên Teyyib Cebbar kiriye û ta asteke berçav me hewl daye şîrove bikin. Di vê beşê de me mebest û armancên honandinê yên helbestvan ji bo çar mijaran dabeş kiriye :

#### **1-Helbestên Siyasî**

Ji wan corên helbestan pêkhatine ku piraniya helbestvanan behsa wan rewşên siyasî dikin ku helbestvan bi xwe û gelê wî di wê serdemê de têde dijîn. Lewra gelek caran bi sedema helbestên helbestvanan nasandinê bi wan rewşên siyasî re peyda dikin ku beriya helbestvan an jî di serdema helbestvan de hebûye. Diyar e, Teyyib Cebbar jî weke her helbestvaneke din hest bi wê rewşa siyasî ya ne aram kiriye ku bi xwe û gelê xwe têda dijîn. Lewra helbestvan xwestiye wêneyê wê rewşa siyasî ya Iraqê û Kurdistanê di helbestên xwe de ji me re behs bike da ku xelk bi rêya helbestên xwe wan guhertin û rewşên siyasî nas bike ku ew û gelê xwe têde jiyane. Lewra helbestvan gelek bi wêrekî di helbestên xwe de

li dijî sîstem û desthilata siyasî ya serdema xwe rawestiya ye û daxwaza mafê gelê xwe kiriye. Ew bi tevî ku cureyek bû ji haydarkirina desthilatê ji wan xirabkariyên ku encam dide. Di heman demê de jî peyamek bûye ji bo gelê wî ku haya xelkê ji sitemkariyên desthilata nedadperwerane ya desthilatdaran hebe û daxwaza mafê xwe yê rewa bikin. Lewra di vî warî de hinek curên helbestên bi bandor nivîsandiye ku ligel xwestek û hêviyên gelê wî hevkokin.

## 2- Helbestên Humanistî (Mirovatî)

Ew curê helbestên yek ji mebestên diyar ên helbestvane ku rûbereke mezin ji mebestên wî yên honandinê dagirtiye û helbestvan di vî curê helbestê de gelek bi hûrgilî bûye û karîneke diyar hebûye. Ji ber ku li cem helbestvan mirov ew candarê mezine ku Xwedayê mezin li ser rûyê erdê afirandî. Lewra rêz girtin û muhbeta di navbera mirovan de li cem helbestvan gelek pêwîst e û helbestvan jî weke takekesek ê civakê xwestiye bi helbestên xwe behsa muhbet û rêz girtina mirovan a ligel hev bike. Hewl daye wê birayetî û muhbetê weke peyamekê belav bike da ku takên civakê hest bi hebûna mirovayetiya xwe bikin. Di heman demê de jî peyamek bûye ku mirov ji tevayî candarên din cûda bike, karîn û bandoreke mezin heye. Lewra helbestên wî di vî warî de rengvedana muhbet û yekdengiya di navbera mirovan de bûye .

## 3-Helbestên Felsefîk

Helbestvan kêmtir xwe li vî curê helbestê daye. Ji ber ku armanca helbestvan ew bû ku gelek bi zelalî û sadeyî helbestan binivîsîne da ku her takekê/a civakê bihêsanî ji wate, raman û mebesta helbestên wî têbigihin û pêdiviya wan bi şîrovekirina bi hûrgilî û kûr nebe. Wate, helbest ji tevayiya xelkê re nivîsandiye ne bi tenê ji bo nifş û çîneke diyarkirî ya rewşenbîran. Lewra di helbestên xwe de hewarê (pena) ji bo hilbijartina peyvên sivik û hêsan ên Kurdî yên resen biriye. Ew bi tevî ku helbestên wî hêsan bûne lê naverokeke felsefîk li xwe girtibû. Wate, kariye bi rêya bikaranîna hinek peyvên behsa hinek mijarên felsefîk di helbestên xwe de bike.

#### **4- Helbestên Evîndariyê**

Di vî curê helbestê de me hewl daye behsa helbestên evîndarî yên helbestvan bikin. Her weke çawan li cem piraniya helbestvanên kevin, nû û hevçax girîngiyeke taybet a xwe heye û rûbereke fireh ji helbestên wan dagirkiriye. Gelek bi ciwanî behsa bejin, bala, naz, xal, xet, çav, birû û rûmeta yarên xwe kirine û bi tiştên xwezayî yên weke heyv, roj û hinek tiştên din ên ciwan şibandine. Gelek caran jî evîndarî bûye sedem ku bibin helbestvan lê Teyyib Cebbar kêmtir bi aliyê wê armanca honandinê ve çûye. Ji ber ku helbestvan di çî serdemeke jiyana xwe de weke pêdivî evîndar nebûye, coş û xûrûşa evîndariyê bandor li ser nekiriye. Lewra gelek bi kêmtir bi aliyê wê armancê ve çûye. Lewra helbestên wî di vî warî de gelek kêmtir in û hêjmara wan bi tiliyên destan tîndê hêjmartin bi tevî ku hinek helbestên wî yên kêmtir di vî warî de hene lê kariye şiyar û karîna xwe tîndê bikar bîne û weke helbestvanek aşiq evîndariyê di berhemên wî de rengvedaye û bi ciwantirîn şêwe helbestên xwe bixemilîne û bîne ziman her çî qas kêmtir jî bin .

#### **Beşa Sêyem**

Ev beş bi navê helbestvan û nûkirina rûxsar e. Ew beş teorî û praktîk li xwe digire û me li ser hinek teweran parve kiriye.

1- Awaza Honandinê: Di vî tewerê de me behsa awaz û mûzîka helbestên helbestvan kiriye ku gelek bi haydar girîngî bi vî mijarê daye û hewl daye awaz û mûzîkeke xweş û bibandor bide bi helbestên xwe da ku bala xwendevan bikişîne li ser helbestên xwe. Her wiha di vî beşê de me behsa dû curên awaz û mûzîkê kiriye.

A- Awaza Derveyî: Di vî curê de me hewl daye behsa awaz û mûzîka derveyî ya helbestên Teyyib Cebbar bikin, girîngî û armanca helbestvan zelal û xuya bikin. Me ew jî parve kirye ji bo:

-Pîvan û Qafiye: Eşkere ye ku pîvan û qafiye merceke girîng e ji bo awaz û mûzîka derveyî ya helbestê ku helbestvanan her di kevin de di helbestên xwe de

girîngî bi pîvan û qafiyeyê dane û bi girîngî berê xwe dayinê. Ji ber ku helbestên bê pîvan û bê qafiye tu ramanek a helbestê nabe û tenê weke axaftinên asayî yên rojane xuya dibin. Her di wê beşê de me hewl daye behsa wan pîvan û qafiyeyan bikin ku helbestvan di helbestên xwe de bikaraniye û bi tevî amajekirinê bi hinek mînakên helbestî yên helbestvan ku bi awayeke praktîkî me kar li ser kiriye. Ji ber ku pîvan û qafiye roleke sereke di pêkanîna awaz û mûzîka derveyî de dilîzin. Lewra helbestvan pena ji bo wan pîvanan biriye ku awaz û mûzîka ciwan bi helbestên wî didin.

2- Awaza Hundirîn: Eşkereye çawan awaza derveyî girîng e di helbestan de, ewqas jî awaza hundirîn jî girîngî û taybetmendiya xwe heye û mûzîkeke xweş bi helbestê dide. Diyare Teyyib Cebbar jî ew alî paşguh nekiriye û grîngî pê daye. Me awaza hundirîn jî bi vî rengî parve kiriye:

-Dûbarebûna Dengan: Dûbarebûna dengan dibe sedema pêkanîna awaz û mûzîka hundirîn a helbestê. Helbestvan jî hewl daye wan dengan hilbijêre û di helbestên xwe de dûbare bike ku awaz û mûzîkeke xweş pêktînin. Piştîre bi awayeke praktîkî me kar li ser hêjmareke mînakên helbestvan kiriye.

-Dûbarebûna Peyv, Destepeyv û Hevokan: Bi awayeke praktîkî di vê beşê de me kar li ser helbestên helbestvan kiriye da bizanin helbestvan çiqas girîngî bi peyv, destepeyv û hevokan daye da roleke girîng di pêkanîna awaz û mûzîka hundirîn ya helbestên wî de bilîzin. Eger bi hûrî li helbestên helbestvan binêrîn, dibînîn gelek bi zelalî di piraniya helbestên wî de dûbarebûna peyv, destepeyv û hevokan xuya dibe.

Dijwate: Di vê beşê de me hewl daye behsa diwjateyîyê bikin û piştîre bi awayeke praktîkî peyvên diwjate di nava helbestên wî helbestvanî de destnîşan bikin ku ji bo pêkanîna awaz û mûzîka helbestên xwe bikaraniye.

- Peyvên Dûçeng: Peyvên dûçeng aliyê girînge di pêkanîna awaz û mûzîka hundirîn a helbestê de. Me bi awayeke praktîkî hewl daye behs bikin û kar li ser hinek mînakên helbestên wî helbestvanî bikin.

2-Wêneyê Hunerî: Di vê tewerê de me hewl daye bi hejmareke pênaseyan behsa wêneyê hunerî bikîn ji bo zêdetir nasandina wêneyê hunerî. Piştî me behsa hinek curên wêneyên hunerî kiriye û me mînakên pêwîst bikaraniye .

A- Wêneyê Tak û Wêneyê Tevlîhev (Lihevxiştî): Di vê beşê de me bi awayeke teorî behsa wêneyên tak û wêneyên tevlîhev kiriye û piştî me hinek mînakên helbestên helbestvan anîne û bi awayeke praktîkî kar li ser kiriye û curên wêneyê jî diyar kiye.

B- Wêneyê Bitevger û Wêneyê Rawestayî: Bi heman awayî me di vê tewerê de jî bi awayeke giştî û teorî behsa wêneyên bitevger û wêneyên rawestayî kiriye û piştî bi awayeke praktîkî me hinek mînakên Teyyib Cebbar anîne û şîrove kirine.

C- Wêneyê Hestî: Di vê tewerê de me bi awayeke giştî behsa wan wêneyan kiriye ku li ber hestên mirovan dikevin. Piştî me her curekê wan wêneyan bi awayeke xweser pênase kiriye û hinek mînakên helbestên helbestvan di vî warî de bi awayeke praktîkî kar li ser kiriye. Bi awayeke giştî me wêneyên hestî li ser hinek beşan parve kiriye ew jî:

1- Wêneyê Dîtinê: Ji wan wêneyan pêkhatiye ku li ber hesta dîtinê dikevin.

2-Wêneyê Bihîstinê: Ew wêneyên ku li ber hesta dîtinê dikevin.

3-Wêneyê Bêhnkirinê: Ji wan wêneyan pêkhatiye ku li ber hesta bêhnkirinê dikevin.

4-Wêneyê Tamkirinê: Ew wêneyên ku li ber hesta tamkirinê dikevin.

5-Wêneyên Destlêdanê(lêxistin): Ji wan wêneyan pêkhatiye ku li ber hesta destlêdanê dikevin.

D- Hinek Curên Din Ên Wêneyan: Me piştî hewl daye di vê tewerê de ji bilî wan wêneyên ku me behs kirî, behsa hinek wêneyên din yê hunerî bikîn ku

helbestvan di helbestên xwe de bikaraniye û me bi awayeke praktîkî kar li ser kiriye.

3-Zimanê Şîrî: Me di vê tewerê de behsa zimanê honandinê bi giştî kiriye û piştî behsa zimanê honandinê li cem Teyyib Cebbar bi taybetî hatiye kirin. Her wiha me hinek mînakên helbestên wî di vî warî de anîne û me bi awayeke praktîkî kar li ser kiriye û piştî jî me zimanê honandinê li cem Teyyib Cebbar bi vî awayî parve kiriye.

Bikaranîna Peyvên Kurdî Yên Resen û Nû: Me di vê tewerê de helbestên wî helbestvanî şîrovekiriye da bizanin gelo Teyyib Cebbar peyvên Kurdî yên nû bikaraniye di helbestên xwe de yan jî na? Me ev peyv bi awayeke praktîkî diyar kirine ku helbestvan ji bo armancên ciwankirina helbestên xwe hîlbijartiye. Bi tevî ku me behsa wan peyvên nû kiriye ku ji afirandina helbestvan bi xwe ne.

Bikaranîna Peyvên Erebi: Me di vê tewerê de bi awayeke praktîkî kar li ser helbestên helbestvan kiriye û me hewl daye wan helbestan şîrove bikin ku helbestvan peyvên Erebi têde bikaraniye. Me ew peyv diyar kirine û behsa girîngiya wan peyvên Erebi berçav kiriye ku helbestvan bikaraniye.

Bikaranîna Xaze (mecazî): Me di vê tewerê de kar li ser şîrovekirin û ravekirina wan rêzên helbestan kiriye ku helbestvan mecaz têde bikaraniye bi taybetî ji aliyê rewanbêjiyê ve. Ji ber ku helbestvan ji bo mebesta xemilandina helbestên xwe bikaraniye. Ji ber ku mecaz roleke girîng di ciwankariya helbestê de dilîz e.

Bikaranîna Hêma: Me di vê tewerê de behsa wan helbestan kiriye ku helbestvan têde pena ji bo bikaranîna hêma û dirûşman biriyê da bi awayeke rasterast behsa wê peyamê neke ku li ba wî heye. Lê da ku bi awayeke nerasterast bi rêya bikaranîna hêmayan peyama xwe digehîne, ew jî aliyê ji aliyên ciwankariyê di helbesta Kurdî de. Lewra helbestvan di helbestên xwe de hewl daye pirtirîn hêmayan bikar bîne. Ew jî sedemeke ji bo ku nivîskar û rexnegir bi berdewamî kar li ser şîrovekirina helbestên wî helbestvanî bikin.



Me piştî beşan encamên giştî yên lêkolînê di hinek xalan de berçav kiriye. Me piştîre lîsteya jêder û çavkaniyan bi navên mijarên wan li gorî rêzbendiya pirtûk, kovar, rojname, nameyên master, doktora û hevdiîtinan berçav kirine. Hêvîdarim ew hewla me jî aliyekê girîng yê ezmûna helbestên helbestvan û berhemên wî yên rexneyî xuya û zelal bike û biçe kêleka hewlên wan nivîskar û rexnegirên rêzdar ku beriya me ji bo gihiştina armancên xwe ji xewên şevan jî bêpar bûne. Ezmûna helbest û berhemên rexneyî yên helbestvan kiriye û lêkolîna me jî bi navê "Ezmûna Teyyib Cebbar di Helbest û Rexneyê de" ye, bibe sedema zêdetir dewlemendkirina helbest û wêjeya Kurdî. Diyare ev teza me jî bêtêmasî nîne, hêvîdarim diîtin û nêrînên mamosteyên qedirgiran wan kêmasiyan kêmbikin.

## BEŞA YEKEM

### 1.1. LI SER TEYYİB CEBBAR ÇI HATINE NIVÎSANDIN?

Hêjmareke gotar, hevdîtin û lêkolîn li ser jiyana û berhemên helbestî yên Teyyib Cebbar di kovara û rojnameyan de hatine nivîsandin û weşandin. Li vir em hewl didin tevayî wan mijaran berçav bikin ku zêdetir rengvedana jiyana û helbestên Teyyib Cebbar têde xuya dikin.

Ebdûllah Tahir Berzincî nivîskar û rexnegir mijarek bi navê "Formalîzmî Rûsî, binemaw praktîk, şî'rî Teyyib Cebbar be nimune" (Ebdulle, 2016: 10). Bi şeş beşan "zincîreyan" li Rojnameya Kurdistanî Niwê hatiye belavkirin. Nivîskar di wê mijarê de gelek bi hûrî li ser Formalîzma Rûsî, pêşxistin, hêla sereke, bingeh û girîngiyên wê tevgerê axiviye. Piştî ji bo xuyakirina wê mijarê hewarê ji bo şîrovekirina hêjmareke mînakên helbestên Teyyib Cebbar biriye û şîrove kiriye. Formalîzma Rûsî yek ji wan kom û tevgerên wêjeyî û rexneyî bû ku di destpêka sedeya 20'an de hate pêxistin û bandorên mezin li ser wêje û rexneyê kir.

Ebdûllah Tahir Berzincî di destpêka yekem dîwana Teyyib Cebbar, *Lawandinewey Xolemêş* de dibêje: "Eger em bixwazin zemîna demê yan jî dehsalên wan helbestên Teyyib Cebbar diyar bikin, wê demê wê bêjîn çima û taybetmendiyên helbestên salên heftiyên ên sedeya 20'an li ser diyarin û tenê hinek ji wan helbestên wî ku di salên heştêyan de hatine nivîsandin piraniya hevok û feza helbestên salên heftêyan li ser bibandor e" (Teyyib, 2008: 5-15). Her di wê mijarê de xwendineke wêjeyî ji bo berhemên helbestvan kiriye, dîtin û nêrînên xwe diyarkiriye.

Ebdûllah Tahir Berzincî di nivîsandineke din de ku bi navê "Ladan .....pêwerêk bo şî'rîyet" (Ebdulle, 2016: 2). belavkiriye. Di vê mijarê de bi hûrgilî xwendineke ji bo helbesta (Sê çîwarîney pênc xiştek) ya Teyyib Cebbar kiriye û gelek bi hûrî li ser dûrxistina ji honandinên helbestvan radiweste û teqezê li ser peywendiyên di navbera Helbest û Endazeya helbestan de dike. Ebdûllah Tahir Berzincî di mijareke din de ku bi navê "şar wek û deqêk xwêndinewey Teyyib Cebbar Emîn"

belavkiriye behsa wê yekê dike ku helbestvan çawan di karê endazyariyê de zimanek endazyarî ya herî sade û zelal bikare wêjeyê re tevlihev kiriye û dibêje: "Di wê semînerê de min wiha hest kir ku soza kesayetiyek wêjeyî tevli hişmendiya reftar û karê endazyarekî hatiye kirin. Hinek caran ew soz di wan xeydînan de derdikeve û dikeve nava axaftin, amaje û rêjeya dilsoziya endazyarekê westiyayî yê wî welatî li hemberî cesteyê welatê xwe û pirsgerêka sivîlan nîşan dide" (Ebdulle, 2002: ???).

Ebdûlah Tahir Berzincî mijarek li ser qesîdeya pexşana helbesta "Cogeyek Aw Lay Daye Malî Ême...!" a Teyyib Cebbar belavkiriye û di wê mijarê de dîtî û nerînên xwe li ser wê tekstê nîşan daye û dibêje: "Li vir Teyyib Cebbar li şûna şîrî û girî, bi rêya wê şewaza îdarî û hevokên nav û wêneyê nameyê hewarê ji bo henekan dibe. Di wê helbestê de sûd ji ziman û cîhana pexşanê hatiye wergirtin. Lê ji çarçoveya pexşanê hatiye derxistin û teji ladana hunerî hatiye kirin" (Ebdulle, 2011: 8).

Rexnegir Sebah Şêxanî mijareke bi navê "Xwêndineweyekî Şîrî Lewaneyê ...!" ya Teyyib Cebbar belavkiriye û dibêje: "Mirov di hemu serdemên cûda de pêdivî bi wê yekê heye ku bi hest û nestên wî re bê axaftin. Hest û soza wî bê livandin, helbestvan bi wateyek ji wateyan bi xwe dinivîse. Teyyib Cebbarî bi rêya helbestan nava xwe nîşan daye, honandinên wî qûtikin (ayne) ku xwe têde dibînin. Bi awayeke din ku bêjî bi temamî ji wan re hatiye nivîsandin" (Sebah, 2015, s. 16).

Rexnegir Sedîq Seîd Rewandizîr di behsek a xwe de ku bi navê "Retkirdnewey Êstaw Gerranewe Bo Rabirdû Le Şîrî Serdemanêy -Teyyib Cebbar da" belavkiriye. Nivîskar di wê mijarê de dixwaze ji me re bêje ku yek ji taybetmendiyan civakî û derûnî yên mirovê wê serdema Kurd, vegere ji bo berê ku niha xewna mezin a mirovane. Ji berê ew biheşt ji dest daye û hertim vegera ji bo wê biheştê nabe. Piştî ji bo girîngî pêdana bi behsa xwe teksteke helbesta "Serdemanê" a Teyyib Cebbar hildibijêre û şîrove dike. Behsa wê yekê dike ku çawan helbestvan xweşiya jiyana teji hevî ya dûhî û bi beramberkirina tevî bêhevî û reşbîniya gelê

Kurd bi tevî wan hemû pêşveçûnên niha di vî warî de kiriye û dibêje: "Eger helbestvan di nîva yekem a honandina xwe de, sîmayên ciwan ên dûhî ji me re behs bike. Vê carê di nîva dûwem a helbesta xwe de, kirêtiyên jiyana me ya îro nîşan dide. Her ew wêneyên helbestvan ku di wê malika helbestê de amaje pêkiriye balê dikşîne li ser jiyaneke bêhêvî û reşbîn, heta asta nemana soz û muhbeta di navbera mirovan de jî" (Sedîq, 2014: 10).

Helbestvan û nivîskar Dilawer Nûrî Ehmed di mijareke bi navê "Direng Hatînî Şa'îrêk" belavkirî de behsa wê yekê dike ku helbestên Teyyib Cebbar yek ji wan helbestanin ku çavê mirovan dikeve ser û bala mirovan dikşîne li ser xwe. Dixwaze bixwîne û li ser rawestîna her wiha piştî nivîskar di berdewama behsa xwe de dibêje: "Tevî wan hemû pîrisgirêkên ku niha hene hinek caran helbesteke Teyyib Cebbar dermaneke baş e ji bo dûrketina ji wê qerebalixa cîhanê. Teyyib Cebbar gelek hewl daye ku rû bi rûyê tevayî herikînen jiyaneke bibe, di nava helbestên wî de mirov hest dike wî berûvajî tevayî helbestvanên din helbestên wî honandîne. Alavên wî ji wan alavan pêkhatine ku renge xwendevan di dema xwendinê de li rastî matmayîne bê" (Dilawer, 2015: 56-57). Piştî nivîskar ji bo dewlemendkirina behsa xwe hewarê ji bo kopleyeke helbesta "Ew Rojey Min Demirim" a helbestvan biriye û şîrove dike.

Helbestvan û rexnegir Mihemed Kurdo di mijareke bi navê "Teyyib Cebbar Le Nêwan Sê Dîwanda" de belavkiriye nivîskar di wê behsê de bi tevî nîrxandina ji bo her sê dîwanên wî, bi hûrî jî şîrove û lêkolînan li ser dike. Bi taybetî ji aliyê hunerî, zimanî û honandinê ve, piştî tê li ser behsa helbestvan û dibêje: "Teyyib Cebbar yek ji wan helbestvanên kêr û degmene ku di navbera her sê dîwanên wî yê yekem, dûwem û sêyem de hilkişaneke mezin û berçav heye" (Mihemed K. , 2015: 8).

Mihemed Kurdo di mijareke din de ku bi navê "Ziman û Şîriyet Lay Teyyib Cebbar" belavkiriye dibêje: "Ew peyvên Teyyib Cebbar bikartîne heman ew peyvîn ku em jî bikartînin lê erkê peyvîn li cem Teyyib Cebbar erkeke dine, dikarim zelaltir bêjim zimanê Teyyib Cebbar weke peyv taybetmendiyêke wiha nîne lê

weke erka peyvan ew ziman ta asteke bilind zimanek bêwêne û taybet e" (Mihemed K. , 2015: 8).

Mihemed Kurdo her di mijareke din a bi navê "Dirûstkirdinî Dinyay Taze Lay Teyyib Cebbar" de belavkiriye ku nivîskar di wê behsê de piştî ku lêkolînek kûr ji bo helbestên wî dike û bi hûrî li ser raman, wateya peyvên wî radiweste, şîrove dike û dibêje: "Teyyib Cebbar nişê cîhanekê ye, berûvajî caran ku digotin: Çiya bi çiya nakeve lê niha di vê cîhanê de çiya bi çiya dikeve lê lêv bi lêvan nakevin. Gelo ghiştina çiya bi çiya, neghiştina lêvan bi lêvan tê wateya çi? Yan jî ghiştina dû lêvan ji bo hev ghiştina dû çiyay girantire!" (Mihemed K. , 2015: 8).

Piştî nivîskar li ser behsa xwe berdewam dike û dibêje: "Lewra ew helbestvan weke miroveke efsanekar, bi rêya zimanekê honandina bibandor û komeke xeyalên helbestvanîyê mijûlî derbasbûna ji bo aliyê din ê vê cîhanê ye. Yan rastir mijûlî avakirina cîhanekê nû ye" (Mihemed K. , 2015: 8).

Mihemed Kurdo di hevdiîtineke a ligel Teyyib Cebbar a bi navê "Endazyarêk Ciyawaz Qise Le Şîr û Huner û Endaze Dekat" de belavkiriye û dibêje: "Teyyib Cebbar yek ji wam mirovên dostê pirtûkan û ji her tiştêkî zêdetir heskirina wî ji pirtûkan re heye û xwedî pirtûkxaneyekê mezin û pir ji pirtûkên balkêş e. Wî zîlamî di destpêka salên heftêyan de dest bi nivîsandinê kiriye lê ji derveyî yek dû helbestên wî tu helbestên xwe belav nekiriye. Ji salên notan ve jî hinek caran gotarên rexnebar li ser honandin û nîgarkêşanê dinivîsîne û belav dike. Tenê hêjmarek semîneran jî li ser endaze û wêjeyê pêşkêş kiriye" (Kurdo, 2008: 8).

Rexnegir Necmedîn Feqê Ebdûllah di mijarek bi navê "Ciwani Mehal Le Honrawey Serdemanê...Tarîkî Spî Bû" de ya Teyyib Cebbar di dû bergên 31 rûpelî de nivîsandiye û piştî bi çavê rexneyî şîroveyeke hûr a aliyên hizir, afirandin û kûratiya honandinê ya helbestvan dike û dibêje: "Helbestvanê hunarkar dikare her cure hizrekê werbigire û bê tu nehametiyek helbestê bihonîne. Piraniya helbestên pîrozbahiyay ji wan curên helbestan afirandiye lê helbestvanê resen ta hizir li cem wî nebe û bi rewşeke wîjdanî û amadeyî tevî nehametiyay nebe,

nikare bike helbest. Ji ber ku ji bo wî ne huner e” (Necmedîn, 2011: 9). Diyarê rexnegir Teyyib Cebbar xistiye rêza helbestvanên resen, ew jî bi sedema wan hizir û nehametiyên ku di helbestên wî de rengvedane û seranserî tekstên wî dagirkiriyê.

Nivîskar û helbestvan Dilawer Qeredaxî mijarek li ser her sê dîwanên helbestvan “Ew Rojey Min Demirim, Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden, Lawandinewey Xolemêş” nivîsandiye. Nivîskar piştî xwendineke bilez jêre dike û nivîskar di vî warî de dibêje: "Piştî lêgerîn û beramber kirneke bi lez ji wan nivîsandinên rexneyî ku li ser her dû komên helbestên wî hatine nivîsandin, ew koma helbestên ku bi zimanê Erebi hatine weşandin û beşek ji helbestên wî ye. Her dû çax li xwe girtine, gelek karên rexneyî li ser hatine kirin û li ser hatiye nivîsandin. Lê ew nivîsandinên ku li ser koma helbestên Kurdî hatine nivîsandin ta astekê kêmtir in û di xaneyê nebûnê de ne. Diyarê peywendiya vê yekê jî bi asta tama xwendevan jîngeha wêje û çanda Kurdî ve heye. Yan jî dikare bi sistî peywendiya livîna rexneyî bi navenda wêjeya Kurdî û bi wê bê minetiyê re hebe ku cîhana nivîsandina me ji bo vexwendina me û spartina wan bi paşguhxistinê şopandiye" (Dilawer, 2011: 18).

Nivîskar û rexnegir Mehmûd Necmedîn di mijarek a bi navê “Teyyib Cebbar Le Lubnane Şî'rekanî le dezgayekî nasraw be zimanê Erebi le çap dedrêt” de belavkiriye û nivîskar di wê mijarê de şîrove û nirxandinên ji bo tevayî helbestên dîwana “Serdemanêk Tarîkî Spî Bû” ya helbestvan dike ku yekem dîwana helbesta kurdî ye ku ji aliyê Dezgeha El-Xawnî ve di sala 2010'an de hatiye weşandin. Ji aliyê Ebdûllah Tahir Berzincî ve ji bo zimanê Erebi hatiye wergerandin. Nivîskar di wê mijarê de dibêje: "Teyyib Cebbar di wan helbestan de bi awayeke nîgarkêş kar dike û wêneyê hestên xwe dikêşîne. Hestan dike keval û peyvan dike nîgar. Nîgarê ciwanî, evîndarî, xweza û hestên xwe. Esmen weke kirasê ronahiya wêne dikêşîne. Hinek caran bi zimanek beredayî û di tariyê de bi spî wêneyan dikêşîne” (Mehmud , 2011: 8).

Necmedîn Feqê Ebdûllah di mijara bi navê “Derwazeyek Bo Nasandîni Niwêgerî Le Şîrî Teyyib Cebbar da” bi dû beşan belavkiriye. Nivîskar piştî ku bi çavê rexneyî şîrove û helsegandinê ji bo helbestên wî helbestvanî dike û bi berhemên honandina cîhanî yên weke Eliot, Rimbaud, Adonis, Baudelaire, Mallarmé, Paul Eluard, Paul Valery, Saint-Johns Perse û Hashem Saleh beramber dike. Piştî nivîskar li ser wê behsê berdewam dibe û behsa wan qonaxan dike ku helbestvan têde ji honandinê rawestiya ye û dibêje: "Ciwantirîn wêrekiya helbestvan ewe ku di wan deman de li ser helbest nivîsandinê raweste ku jêre xuya bûye ku êdî nikare afirandinê bike yan jî tiştê nû (ji aliyê îstatîkî ve) bêje. Ew wêrekî hem wan helbestnivîsên kal digire nava xwe û hem jî helbestvanek mezin ê weke Rimbaud ku dikeve piştî Baudelaire û ji beriya Mallarmé ku her sê bi afirînerên honandina modern têne naskirin" (Necmedîn, 2016: 8).

Piştî nivîskar di beşa dûyem a mijara xwe de dibêje: "Yek ji wan afirînerên honandinê û ciwankariyê Teyyib Cebbar ku rê bi xeyalkirina helbestên xwe daye. Weke ku rûbar biherike li ser cîhana honandinê, lihevexistina peyvên dijber, nakok, negûncaw, û nesazî ku bi vî awayî rêyeke tam cûda û stîlek herî ciwan û sihirbazî di nava honandina hevçax a Kurdî de ji xwe re tomarkiriye. Yan nîne yan jî gelek bi kêmanî heye" (Necmedîn 2016: 8).

Selah Rencder di mijara bi navê “Rengdan Be Wişe Le Komele Şîrî Serdemanê Tarîkî Spî Bûda” de belavkiriye. Nivîskar di wê behsê de behsa ziman û kevalan di honandinê helbestvan de dike û dibêje: "Teyyib Cebbar di pencereya honandinê de li xelkên derve dinêre. Kovan û êşên xwe ji bo cîhana derve dişîne. Wê yekê jî bi rêya ziman dike, yan jî ewa ku jêre dibêjîn ziman di nava ziman de, helbet ziman weke saziyek kevneşopî (urfî) rûberek ji karvedanên wekhev li cem xwendevanên helbestê digire. Ji ber ku hertim wekhevîyek piraniya xwendevan û rexnegiran ji aliyê zimanê hest û rêbazên derbirînê ve bi hev ve girêdide. Lê helbestên Teyyib Cebbar bandorên herî taybet û berçav li ser guhertina hestiyariyê û balkêşiya reng û wêneyan heye. Peyvan jî taybetmendiya ferhengnasîne, hestiyarî û nûbûna zîndî têde heye" (Selah, 2016: 8).

Helbestvan û nivîskar Hisên Befrîn di mijara bi navê “Xwêndinewey Şîrî Lew Rojey Min Demrim hi Teyyib Cebbar da” ku bi şeş beşan belavkiriye dibêje: "Helbestvan bi kameraya xeyalê di cîhana fireh a honandinê de wêne û peywendiyên xwezayî û jiyânî bi xwe berûvajî û ser û bin dike. Bi wê yekê jî mirinê weke bûyereke asayî lê nake lê weke karesateke nexwezayî lê dike. Wiha nîşan dide ku mirina wî (min) civakî ye û ewqas mezin û qebareya her çavekê bi dîtina wî difetise û li hemberî karesatek wiha matmayî dibe. Lewra ji destpêkê ve bi mezin û giran nîşan dide û tevayî candarên gerdûnê pêve girêdide” (Hisên, 2016: 9). Piştî nivîskar rêz Li pey rêzê helbestê şirove dike bi çaveke rexnegirana dinirxînê.

Ebdûlxefar El- Etuy di mijara bi navê “El- Te'emuq El- Înfialî Lîl Heyat Fî Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez” de belavkiriye. Nivîskar piştî hewsengandina helbestên helbestvan şirove dike û di vî warî de dibêje: "Ew zimanê ku helbestvan pê dinivîse kurte û ji aliyê peyv, deng û wateyan ve ji nivîsandina Erebi cûdaye ku helbestên wî helbestvanî ji bo ser wî zimanî hatine wergerandin û hest bi cûdahiya avakirina her dû zimanan dikin. Çanda tekstê rê bi eşkerekirina asta rewşenbîriya helbestvan dide ku çawan dihizire. Ji ber ku ziman amêra hizre û xalên hevbeş di navbera Teyyib Cebbar û xwendevanan de ava dike. Ew jî bi tevî ku hişyariyek hevbeş di navbera hizir û ziman de di rewşenbîriyê de me nêzîkî têgihîştina hev dû dike” (Ebdûlxefar, 2010: 8). Her wiha nivîskar di berdewamiya behsa xwe de dibêje: "Teyyib Cebbar muhebeteke mezin ji bo xwezatiya Silêmaniyê hebûye ku xwezayek gelek bedew û balkêş heye” (Ebdûlxefar, 2010: 8).

Fethûlla Hûsênî, di mijara bi navê “Fî Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez Mecmue Hafîle Bîqesad Lêhlam Muxtelîfe” de belavkiriye, nivîskar piştî ku xwendinekê ji bo koma helbestên wan "Rojên Tarî Spî Bû" ya helbestvan dike û dibêje: "Di wan helbestan de helbestvan piştgîriya temam a canê mirovatiyê dike. Ew canê ku bêhêzî û bêzariyê bala xwe kişandibû li ser û tu deman li cihekî bicih nedibû, tenê ji bo demeke kurt. Hertim li hember sernekeftinên hêviyên xwe di jiyana xwe de bêdeng bû, tevî cûdahiya xewnên wî bi jiyane re” (Fethulla, 2010: 8).



Zûhêr Behnam Berdî di mijara bi navê “El - Taqe El - Kamîne Lîlnes Tuheqîq El -Telefî El - Îcmalî Fî Mecmuet El-Şar Teyyib Cebbar “Fî Zate Zeman ... El - Zulam Kane Ebyez” de belavkiriye û dibêje:"Helbestvan xwestiye xweşî û şadiyê ji xwe re vegeirîne jiyane. Bi vî curî bi helbestan re gûftûgoyan dike, helbestvan bi berdewamî pirsyaran ji dayîkbûna xwe dikir ku di hizir, xewn û xeyalên wî de bicih bibûn. Bi taybetî wan demên ku vedigere cihên bîranînên xwe weke çawan Destana Gilgamiş hewla derbaskirina sînorên xwe dida” (Zuhêr, 2010: 8).

Ebdûlkerîm Yehya El-Zêbarî di mijara bi navê “Mîras El-Kirdye... Zate Zeman... El- Zulam Kane Ebyez” belavkiriye. Nivîskar di wê behsê de helbestên dîwana Serdemên...Tarî Spî Bû şîrove dike. Bi taybet helbesta Banga Hilbjartinan weke dibêje: "Teyyib Cebbar di helbesta Banga Hilbijartinan de bi henekî behsa hilbjartinan, namzet û aliyên siyasî dike ku ji heşt lîste û hêjmareke namzetan pêkhatiye û namzet tenê yek kese ku dibin sêwana hilbjartinê ye û berî serkeftinê û piştî serkeftinê tu tiştêk nîne ji bilî gûmanê nebe. Ji ber ku siyaseta hunereke gengazê li Iraqa nû û li cem welatîyên dengder ve hunereke negengaz e” (Ebdulkerîm, 2010: 9).

Farûq Mistefa di mijara bi navê “Fî Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez.. Qesaîd El-Henîn We Henîn El-Qesaîd” de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de helbestên wî helbestvanî şîrove dike, bi taybet behsa helbesta Silêmaniyê dike û dibêje: "Helbestvan pir ji honandinê hez kiriye û gihiştîye bilindtirîn asta canî û bi qîrandin, kovan, xem û xweşiyên re tevî hev bibû û evîndariya wî ji "Tobya"re ku yekem cihê serdema zarokatiya wî ye û bi sitranan wan tiştên xweş ku di hizra wî de mane bi dawî nabe. Bi vî corî, helbestvan paşmayîyeke honandina wiha ji nifş û nijadên xwe re li paş xwe hiştîye ku ji bo kesan û hewarçûna evîndaran ji şîrînahî û muhbetê tejiye. Lewra Teyyib Cebbar li Kerkûka bajarê agir û ronahiyê ji bo bajarê Silêmaniya pir ji bax û darên tuyan dest bi geryanê kir û li bilindahiyên Berzehewara bilind ku li wê derê helbestên kovandar û bi sozên xwe dixwendin ku evîndarî ji helbestên wî dibarîn. Lewra bi helbestên xwe yê evîndariyê xwest bîranînên xwe rawestîne û di hizra xwe de nû bike. Ew jî bi

hizirkirina wan tiştên ku hilgirên xwezaya romantîk, evîndariyê, cihê yekem û serdema zarokatiya wî bûn” (Faruq, 2010: 8).

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê “El-Şair Teyyib Cebbar... Îtlale Ela Beytîhî El- Şirî” de belavkiriye. Nivîskar di wê behsê de dibêje: "Dema li helbestên helbestvan dinêrin, dibînîn ku pêgire bi tevayî bingeh û yasayên sereke yên honandinê. Bedewî û xemilandina helbestên wî bala xwe kişandiye li ser tevayî dîwana wî. Ji ciwaniya afirandinê û teknîkê ku bi 'Di Serdemekê de Tarî Spî Bû' hatiye naskirin. Dibînîn helbestên wî weke gotaran in û tevayî mijarên lêkolînan li xwe digirin û di helbestên xwe de alîgiriya tu aliyekê nekiriye. Lê helbestên wî zêdetir aliyê mirovatî li xwe digirin” (Faruq, 2012: 7).

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê “El-Şair Teyyib Cebbar... El-Ewde Îla Uxinyat Beraetul Ma'” belavkiriye. Nivîskar di wê mijarê de helbestên helbestvan şîrove dike, bi taybet helbesta "Baştir Waye "(Ya Baş Ewe) di wî warî de dibêje: "Ew nav û nîşan ewqas ji bo helbesta wî bedewe ku wiha hest dikin xwendevan şanseke ji bo xwendinê dikişîne. Xwendevan wiha hest dike ku serwet û samaneke mezin di nava tekstê de heye. Piştî xwendevan xwe di nava tekstê de dibîne û wiha hest dike tişt di nava dilê wî de ne. Helbest tejiî tamedê taybet û balkêşe. Ji tiştên înkarkirî dûr e, ew jî şîyan û şarezayiya helbestvan nîşan dide ji bo pêdana xweşî û tamê bi mijarê re” (Faruq, 2011: 8).

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê “Zate Zeman.. El-Zulam Kane Ebyez.. Teyyib Cebbar, We Neqil El-Yewmî Şiryen” de belavkiriye. Nivîskar di wê mijarê de behsa koma dûwem a honandinên helbestvan dike. Di wî warî de dibêje: "Di wê koma helbestan de helbestvan jiyana rojane kiriye helebest. Wate, jiyana rojane veguheştiye nava honandinên xwe” (Faruq, 2011: 9).

Nivîskar wê dîwanê bi helbestên nifşên salên heştêyan ên helbestvanên Iraqî diafirîne.

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê “El-Sud Îla (Heware Berze) Behsen En Teyyib Cebbar” de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de dixwaze vê yekê ji me

re behs bike ku bi çi awayekî li cadeyan digere û li nûçeya helbestvan dipirse weke dibêje: "Bi tîrêjên destpêka rojê re li bajarê Silêmaniyê digerim û ber bi tuyên Melîk ve evraz diçim û çavên min bi darên tuwan ên bajêr dikevin ku ez pir jê hez dikim. Her dema ez wan daran dibînim dilê min teji xweşî dibe, dema ez destê xwe ji bo wan dirêj dikim hest bi xweşî û tama wan dikim. Ez ji wan daran dipirsim li ser wê rêya ez lê ez ber bi Hewara Bilind ve diçim, dibêjm niha hevalê xwe yê helbestvan Teyyib Cebbar dibînim ku li şaneşîna (balkon) xwe rûniştîye û li benda qesîdeya "El-Budlîrye" ku bi çi awayekî li kolanên Parîsê tê xwarê, di hizra min de jî, hêjmareke peyvan dilivîn û dibêjin em pir ji Teyyib Cebbar hez dikin" (Faruq, 2012: 8).

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê "Fî Terîq Îla El-Şar El-Muhendis Teyyib Cebbar" de belavkiriye û dibêje: "Beriya ku bigehim helbestvan û endazyar Teyyib Cebbar min bi rêya tekstên helbestên wî ew naskir ku li ser rûpelên kovara Tato ya Bexdadî dihatin belavkirin û xuya dibûn. Bi taybetî dema min ew teksta bi navê "Bangeşeyên Hilbijartinê" xwend, min dît tekstek balkêşe bi derketina ji rêzimana xwe ve ku ji wan zimanên honandinê cûda bû ku di berê de hebûn û xelk li ser hîn bibûn. Piştî ku ez zêdetir aşnayê tekstên helbestên wî bûm, min dest bi dilsoziyeke temam a wî helbestvanî ji bo helbestê kir û xwedî şiyaneke xûrt û fireh bû ji bo amraz û tuxmên hunerî. Dema bi helbestên wî re aşna dibin hest dikin ku helbestvan bi tîp û peyvan awazan li ser weteran dijene. Lewra qesîdeyek bi navê "Çima Ez Dilêrim" hat bîra min ku dibêje helbestvan li ser banên esmanan radiweste" (Faruq, 2013:7).

Farûq Mistefa di mijareke din a bi navê "Teyyib Cebbar... El-Hekîm We Xwayat Exanî El-Muereqe" de dibêje: "Kesayetiya helbestvan bi sedema dûbarebûna peyvan winda dibe bi xwe ji bo teqezkirinê dixwaze ji ber ku wê rastiye ew kar xwestiye, ew şêwaz ciwaniyekê dide honandinê û bi tiştêk pêdivî zaniye û afirandinê têde kiriye. Lewra di piraniya tekstên helbestan de wiha tê dît ku bi berdewamî pêre bûye" (Faruq, 2016: 11).

Mihemed Sabir Ubêd di mijareke de ya bi navê “El-Qesîde El-Banuramyê... Înfîtah El-Feza El-Teşkîlî El-Hur” de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de behsa şêwaza hunera teşkîlî di helbestên Teyyib Cebbar de dike, bi taybetî ew helbestên ku di dîwana “Di Serdemeke Tarî De Spî Bû” hatîne belavkirin. Lewra di vî warî de dibêje: "Teyyib Cebbar li ser vekirina fezayê şêwekariya serbest xwedî xwezatiyeke panoramiye, bi wateyeke giştîgîr û zîndî, xwezatiya xeyalê balê dikişîne li ser nav û nîşanan ku balê dikişîne li ser hîmê sereke yê helbestê, hesteke xeyalî ya bilinde ku dibe sedemek ji bo vegotina klasîk" (Mihemed, 2010: 8).

Mihemed Ebîd Ebîr di mijareke din a bi navê “Hereket El-Mefarîqe El-Şîrye... El-Ruya Wel Teşkîl” de belavkiriye û nivîskar di wê mijarê de behsa wê yekê dike ku helbestvan şêwaza honandina serdema xwe bi şêwazek firehtir, kûrtir û cûda nivîsandiye û bi hemû cûdahiyên wê raberî xwendevan kiriye. Lewra nivîskar di vî warî de dibêje: "Bandora honandina helbestvan di wê yekê de ye ku bihayê derbirîna gotina wî bi şêwaza nîşandana dramayeke tamam nêzîk dibe. Ew jî çavê bîner haydar dike ji bo karkirina bi ziman re. Ji ber ku hêjmareke wêneyên livandî yên zîndî li devera lê nêrînê bi şêwaza pêkanîna helbestê çêdike û livînên cûda jî li ser bingeha şanogeriya ku hêjayê dîtinê ye li xwe digirin" (Mihemed, 2012: 8).

Lûqman Mehmûd di mijarek din a bi navê “El-Şar Teyyib Cebbar We Îqa El-Ehasî Fî Zate Zeman Elzulam Kane Ebyez” de belavkiriye û nivîskar di wê mijarê de xwendineke bi hûrgilî ji bo helbestên helbestvan kiriye û di vî warî de dibêje: "Helbestvan di honandinên xwe de balê dikişîne li ser bajarê Silêmaniyê ji ber cihê bi rastî yê helbestvane û şûnwarê tevayî serkeftin û bîranînên wî ye. Her ji ber vê tenê, li aliyê din me ber bi nihêniyên giran û nexweş ên bajarê xwe ve dibe. Ew jî bi armanca vegotina bîranînên tehl (tal) ji bo bajarê Silêmaniyê di serdema rejîma Be'es a roxayî de, ji ber ku helbestvan di wê demê de gelek caran rastî tirs û nexweşiyên hatiye" (Luqman, 2010: 8).

Lûqman Mehmûd di mijareke din a bi nava “Ruqe Cuxrafya El-Îtîsal Fî Qesad Telteft Îla El-Emam Lî Teyyib Cebbar” de, nivîskar di vî warî de dibêje:

"Teyyib Cebbar xwedî şîyan û xewnek a honandina nû bû ku bi helbest û nakokiyên niha re digûnce. Wate, şêwaz û ezmûna helbestvanên nû wergirtibû û di nava xwe de xwedî hişyariyek rewşenbîrî ya ciwan û nû bû ku ew jî berjengek (sifet) zelale li cem helbestvan. Kariye peyv û derbirînan paqij bike û bi helbestan bihonîne" (Luqman, 2012: 8).

Lûqman Mehmûd di hevdîtinekê de balê dikişîne li ser wê yekê "helbestvan xwedî hêjmareke taybetmendî û berjengên taybet bi xwe ye ku ji helbestvanên din cûda dike. Ew jî ew hizir û hişên kur in ku kariye di helbestên dawiyê de "Ew Rojey Min Demrim" tomar bike, ew helbestên ku awiran didin beramberî" (Mehmud, 2012: 6).

Zûhêr El-Cibûrî di mijarek a bi navê "Bunyet El-Wîlade El-Şiriye" de belavkiriye nivîskar di wê behsê de piştî xwendin û hewsengandineke temam ji bo "Ew Roja Ez Dimirm" a Teyyib Cebbar dike û dibêje: "Helbestvan di yekem malikê de rewşa mirina xwe bi sîstemek gerdûnî ji me re vedibêje. Wate, sîstemek ku nayête şikandin û naqewime tenê bi hizra helbestvan nebe. Ji ber ku mirina helbestvan mirineke cîhanî ye û ji ber ku bi mirina cîhanê jî goka rojê dirêje li ser erdê, heyîv jî pûç dibe û stêrk jî dadikevin li ser rûyê erdê lê di beşên dawiyê de û di berdewama behsê de dibêje ew roja ez dimirim av diçe xwarê û agir dilerize û barove nikare henaseyê (nefes) bide. Ji aliyeke din ve ew helbest me digihîne qena'etekê ku bêjîn mirin helwesteke dawiyê nine. Lê di rastiye de rewşeke pêgîrbûnê ye di rastiya civaknasî, siyaset û derûniyê de jî" (Zuhêr E.-C. , 2010, s. 11).

Şakir Mecîd Seyfo di mijara bi navê "Bunyet El-Mîtafîzîqa Welrua El-TeXelye Fî El-Nes Yewme Emut Lîlşar Teyyib Cebbar" belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de helbesta "Ew Roja Ez Dimirim" ya helbestvan şîrove dike û dibêje: "Helbestvan li ser tiştên karesatbar gelek bi hûrî û kûrî rû çûye nava vegotinê û dûvçûna karên livîna dramî, helbestvan bi rêya dûbarebûna peyvên (Ew Roja Ez Dimirim) kariye wêneyê beşî ji wêneyê giştî nîşan bide. Her wiha berûvajî jî da ku zêdetir zelal bibe û bigihe beramberkirinên ecêb li ser jiyana bi giştî" (Şakir , 2010, s. 8).

Hekîm Nedîm El-Dawdî di mijareke bi navê “Hedase Ma Be'del Hedase” de belavkiriye, nivîskar piştî ku helbestên “Di Serdemekê De Tarî ... Spî Bû” yên helbestvan şîrove dike û dinirxîne û dibêje: "Helbestên helebestvan nivîsandinek sade, li ser piyan û zarvekirin nîne. Ji ber ku dema ku helbestên wî dixwînin wiha hest dikin sitrane, ewqas tiştên ciwan û bedew têde hene. Ew jî teqeziyê li ser şiyana hêza helbestvan dike li ser pêdana derbirîn, tam, muhebet û zanista ku li cem helbestvanên berê nebûn, nehatine gotin. Niha dîwana wî helbestvanî dixwîne bi hemu pîvanên honandinê pêşkêtiye û taybetmendiya xwe heye. Her wiha vekirina deriyê wêjeyî ji bo pêşerojê û hevrikiya folklorê dike. Zêde gaviya teklîfê û nîqaşnake, derbaskirineke mezine bi tevayî bingehan ve û ji navendekê ve ji bo navendekê din” (Hekîm , 2010, s. 8).

Hatem Mihemed El Sekir di mijarek a bi navê “Zulam ebyez” de belavkiriye û nivîskar di wê mijarê de behsa helbesta “Serdemanê... Tarîkî Spî Bû” ya helbestvan dike û dibêje: "Nivîskar û xwendevan bi awayeke wiha dîtin û nêrîn xwe ji bo helbestvan û honandinên wî hene ku ji bo ti helbestvaneke din nine. Ji ber ku helbestvan di honandinên xwe de bi çavekê dîtna ji bo tiştê destpê dike. Wiha xwendin ji bo tê kirin ku li pêşiya helbestên wî ye, ji ber ku li cem helbestvan tarî spîye her weke çawan tarî di helbestên Bekir Şakir Siyab de tê dîtin, gelek ji tariyê hez kiriye û di helbestên xwe de behsa wê yekê dike ku dibêje roj li wellatê min ji hemû tiştan ciwantire. Ewqas ciwane, ciwaniya wê digihe tariyê, her weke çawan "Mutenebî" di wesifdana ronahiyê de dibêje tîrêjên rojê reşin, lewra li cem helbestvan tarî spîye û ewqas li cem wî ciwan bûye û piştî bûye nav û nîşanê dîwanek a wî bi navê Di Serdemeke De Tarî ... Spî Bû" (Sefa, 2017, s. 18).

Hîsam El-Qeysî di mijara bi navê “Tetuy El-Tehewlat El- Şiriye” de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de behsa pêşveçûn û guhertinên di helbesta “Di Serdemeke De Tarî ... Spî Bû” ya Teyyib Cebbar dike û dibêje: "Helbestvan di destpêka helbestên xwe de biryarê li ser ti tiştê nade û ew guhertin û pêşveçûnên di helbesta wî de hatiye lêborîna helbestvan bi xwe digihîne. Di honandinên wî de hest bi xweşî û dûrketina ji dûdîlê û dilgiraniyê dike. Di

helbestên xwe de peyrewa awaz, stiran û mûzîkê bi hestên mirovan re dike. Wê yekê jî bandor li ser hest û nesta mirovan heye. Her wiha jêre wêneyê helbesta daxwazkirî heye ku bi xewn û stiranên mirovan re tevlihev dibe û dûre ji her diltengî û şikestinekê.

Hîsam Qeysî her di mijareke din de ku bi navê "Qesad Telteft Îla El-Emam... Yenabî Xeyr Mehçure Tetî Îla Haza El-Mekan" de belavkiriye, nivîskar piştî xwendin û nirxandina dîwana "Ew Helbestên Awir Didin Beramberî Xwe" dibêje: "Helbestvan hewl daye bi rêya zimanê honandinê, deng, peyv û hevokan ber bi naveroka helbestê ve biçe" (Hîsam E.-Q. , 2013, s. 8).

Eqîl Haşim Elzubêdî di mijarekê de ku bi navê "Mersyet El-Remad Fî Kîtab Zate Zeman... Elzulam Kane Ebyez Lîlşa'ri Teyyib Cebbar" belavkiriye, nivîskar piştî ku xwendineke hûr ji bo dîwana "Di Serdemeke De Tarî ... Spî Bû" ya wî helbestvanî dike û dibêje: "Girîngiya wê tekstê di wê yekê de ye ku li cem helbestvan weke serwetekê ye, helbestvan xwedî zanist û rewşenbîriyeke mezine di honandina nû de. Her wiha hewl dide di yekem gava xwe de bi awayeke wiha serederiyê bi nav û nîşanê helbestên xwe re bike ku helbestên wî bi temamî bi nav û nîşanên xwe re gûncaw bin û di nava tekstê de pirsyarê ji xwendevan dike û hewl dide rêyeke zanistî bibîne ji bo ku pirsyarên xwe pê arasteya xwendevan bike ku bi nav û nîşana wê re ti qûdkirinek têde nebe, ku balê dikişîne li ser simolojyayê. Di wê mijarê de helbestvan serkirde û pêşeng e ji aliyê zanista rêziman ve" (Eqîl, 2011, s. 11).

Tehanî Fecir di mijareke bi navê "Qesad Telteft Îla El-Dehşe" de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de piştî ku nirxandinê ji bo koma helbestên "Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden" yên helbestvan dike û dibêje: "Her helbestanekê komeke peyvên taybet bi xwe hene ku yên kesên din nîne ku ew jî bal dikişîne li ser zimanê honandinê li cem helbestvan. Helbestvanê Kurd Teyyib Cebbar jî zêdetirîn kar li ser wêne, peyv û hevokan kiriye û ewqas peyvên ciwan jî hene ta gihîştîye wê astê ku bibe xwedî ferhengek taybet a xwe. Ji ber ku ew

peyv ji afirandina helbestvanin, her weke di koma helbestên "Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden" de bi zelalî tê dîtîn" (Sefa, 2017, s. 199-201).

Ebdûlxfar El-Etuy di mijara bi navê "Teyyib Cebbar Fî Qêad Tiltift Alî El-Amam M'alim Xase" belavkiriye, nivîskar dibêje: "Di cîhana Erebi de wiha li helbestvan tê nêrîn ku afirînerêke û karê wî di navbera zimanên cûda û rewşênberiya cûda diafirîne. Helbestvan keseke xwedî karînek mezine di piştgîrîkirina sazîkirina zimanê Erebi de ji aliyê rêziman ve" (Ebdulxfar, 2012, s. 10).

Elwan Selman di mijara bi navê "El-Xîtab El-Ş'rî Fî Qesad Telteft Îla El-Emam Lewhat Fenye Muqtesîde Fî El-Fazîha Memlue Fî Meanîha" belavkiriye û dibêje: "Helbestvan zimanê xwe pêşve dibe, ji bo ceribandina karînen xwe û hilberîna wan karînen îlhamî ku ji bo çêkirina wêneyê honandinê heye" (Elwan, 2012, s. 6).

Bekir Derwêş di mijara bi navê "Teyyib Cebbar... El-Îltîfat Îla El-Emam Qesad Bîluxe El-Eqelye" belavkiriye, nivîskar di vî warî de dibêje: "Wergerandina helbestê weke tê gotin şerekî rû dabû ku diviya her rû daba eger na çîroka honandî rê nade bê wergerandin. Ji ber ku helbest weke balindeyeke kûviye ku bi hêsanî naçe nava qefesê. Wate, wergerandina wê weke wê yekê ye ku perên wê jê veke. Ji ber ku tekst beşeke parve nabe ji wî zimanê ku di destpêkê de pê hatiye nivîsandin. Lewra di wergerandina ji bo zimanêke din de astengî tê dîtîn. Ji ber ku ji aliyê pêkanîna rêzimanî, awaz û organîzekirina helbestî ve cûdaye ji zimanê dayîkê tevî wê yekê jî em dibêjn wergerandin pêwîste. Ji ber ku yekane rêye ji bo peywendîkirina bi çanda gelên din re û bê wergerandin ti gel û milletên cîhanê nikarin pêşveçûnan bikin û ber bi nûbûnê ve biçin" (Bekir, 2012, s. 8).

Emced Necim El-Zubêdî di mijara bi navê "Bunyet El-Daxil Bunyet El-Xarc: Qraet Fî Nisus Qesad Telteft Îla El-Emam Lîlşa'ri Teyyib Cebbar" belavkiriye, nivîskar piştî ku nirxandinê ji bo helbestên "Ew Helbestên Awiran Didin Beramberî Xwe" dike û dibêje: "Dema berhemeke wergerandî werdigirîn dikevin di navbera dû dîtîn û nêrînen tevîhev di navbera tekstên resen de ku bi zimanê dayîkê hatiye nivîsandin ligel teksta wergerandî ku em bixwazîn yan jî nexwazîn



kesayetiye wergêr û şêwaza wî/wê berûvajî dibe. Ji bo wê mebestê jî niha dîwaneke wergerandî ya Teyyib Cebbarli ber destê me ye, bi zimanê Erebi û hewl didin wan aliyan paşguh bixînin ku tê çaverêkirin bikevîne bin bandora wê di dema vexwendina wê de. Ji ber ku eger em werbigirîn weke teksteke wergerandî wê bikevin bin bandora bilind a tekstê” (Amced, 2012, s. 10).

Fayeq Mistefa di mijara bi Navê “Yotobya Teyyib Cebbar” De Belavkiriye balê dikişîne li ser wê yekê û dibêje: "Teyyib Cebbar yek ji helbestvanên nûjen yê nîva dûyem yê salên heftiyane û di wan helbestên xwe de ku di salên dawiyê de honandiye hesteke rexnegirane û dîtineke cûda ji bo helbestên wî dibînîn. Ji ber ku helbestvan karîn û fikarên (endîşe) xwe di çarçoveya helbestekê de li ser bingehê lihevkerinê avakiriye, ne li ser bingeha tevîbûnê” (Fayeq, 2012, s. 11).

Fayeq Mistefa di mijareke din a bi navê “Fî Tecrîbet El-Şi'rye Lî Teyyib Cebbar Hedsî Min Kurdistan Yelqî Şi'reh Min Murtefe'at El-Ruh” de, belavkiriye û dibêje: "Bi rastî helbestên Teyyib Cebbar ji dilê wî derketine û tevayî pîrsgirêkên serdema mirovantiyê kom kirine û di honandinên xwe de derbirîne weke janan, nehametiyan, ciwanyan û hwkd. Tevayî wan helbestên ku dihone ji bilindahiyên welatê xwe ji bo odeyên ji dayîkbûna bîranînên xwe weke zengeke haydarkirinê araste dîke” (Fayeq, Fî Tecrîbet El-Şi'rye Lî Teyyib Cebbar Hedsî Min Kurdistan Yelqî Şi'reh Min Murtefe'at El-Ruh, 2013, s. 11) .

Ebdûlsade El-Besrî di mijara bi navê “Lu'bet El-Mefarîqe El-Ş'rye We Înzayahatîha El-Luxewye” belavkiriye piştî ku helbestên wî helbestvanî şîrove dîke dibêje: "Dema mirov helbestên wî helbestvanî dixwîne diçe nava naveroka mijarên wî, hesteke kûr a temam li ser tiştan dide mirov ku asta wê ewqas bilinde digehe serê xeyalê. Her weke çawan helbestvanê mezşn ê Fransî Şaril Bodlêr li ser banê esmanan radiweste û li cîhanê dinêre. Ew jî ew tişt e û ez li ser helbestvanê Kurd Teyyib Cebbar dibêjm ku di her dû komên helbestên xwe de "Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez" û "Qesad Telteft Îla El-Emam" ku ew her dû komên helbestan li govara Dar El-Xawun di sala 2010 û 2012 de hatine belavkirin” (Sefa, Îwrişd El-Zulam Îla Terîq Fî Tecrîbe Teyyib Cebbar El-Şi'rye, 2017, s. 118).

Hazim Haşim di mijara bi navê “Seda Yelteft Wela Yemut, El-Tîkrar Fî El-Tecrîbetul Şa'ri Teyyib Cebbar” hatiye belavkiirin û dibêje: "Wî helbestvanî roleke girîng di rewşenbîriya Kurdî de heye, ew jî bi sedema helbest û peşanên xwe yê honandî. Lê ji ber hinek sedeman weke pêdivî di nava xwendevan û rewşenbîrên Iraqê de nehatiye naskirin û derneketiye renga zêdetir ji ber sedemên siyasî be. Her çiqas helebestvan û rexnegir dikeve çarçoveya helbestvanên nifşê salên heftêyan” ( Hazim, 2012, s. 8).

Ednan Ebû Endelos di mijara bi navê “Îxtîraq El-Etme Fî Zate Zeman... El-Zulam Kane Ebyez” de belavkiriye nivîskar di dîwana "Serdemanê... Tarîkî Spî Bû" behsa têkşikandina tariyê dike. Lewra nivîskar di dirêjahiya behsa xwe de dibêje: "Helbestvan di tariyê de spiye, rengê spî bi amajekarî û wateyên xwe ve bi sedema pêşveçûnên biyolojiya xwe ji qonaxên din cûdaye ku mirov tere derbas dibe. Ji ber ku carekê amajeye ji bo paqijiyê û careke din jî amajeye ji bo aştî û aramiyê. Ji ber ku rengê wî sare di dilê helbestvan de ji wê demê ve di jîngeheke paqij a civakî de mezin bûye wateyên cûda li xwe girtiye ku di hizra spî de kûr bûye. (Esmankê sahî, heyveke geş, aveke xame û asoyek ber bi hêvî bûnê ve.) Ewe ku helbestvan bi dîtinên xwe yê bi coş di koma helbestên xwe ya bi navê Di Serdemekê De Tarî Spî Bû daniye amaje pêkiriye” (Ednan, 2013, s. 8).

Ferîd Emezşo, di mijara bi navê “Şi'ri Teyyib Cebbar... Ezwa 'Ela Tecirbet Şa'ri Kurdî Me'asir” de belavkiriye, nivîskar hinek amaje bi ezmûnên helbestvanê Kurd ê hevçax Teyyib Cebbar kiriye û di vî warî de dibêje: "Hinek lêkolîner helbestvanê navhatî xistine rêzbendiya helbestvanên nifşê dûwem ê salên heftiyên di helbesta Kurdî ya nû de ku ew nifş piştî nifşa ji nû ve tî, renga diyartirîn tiştê ku helbestvan pê bête naskirin û hatibe taybetkirin bi xwezatiya taybetmendiya wî, hewldana wî be ji bo rizgarbûna ji qalibên klasîkî yê Kurdî. Ji ber ku helbestên neteweyên derdora wî gelek bandor li ser wî kiribûn û hewl ji bo derketina ji wan kevneşopiyên klasîk dida ku di naverok û sîmayê helbestê de diyar bû” (Ferîd, 2013, s. 163).

Wicdan Ebdûlezîz di mijara bi navê “Îsqat El-Ulfe We Î’adtha Bîeşya El-Muhît... Dîwan Qesaid Telteft Îla El-Emam Enmuzecen”, de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de behsa wê şêwaza zimanî dike ku helbestvan di honandina “Ew Helbestên Awiran Didin Pêşerojê” de bikaraniye û dibêje: "Ew şêwaza zimanî lihevexistina bi wê şêwaza ziman re çêdike ku li cîhana derdor hebû. Ew şêwaza xwezayî jî wiha dike ku arasteya nameyan di navbera şander û wergir de tevîfhev be. Pêdiviyêke bêtir bi sedem û egeran heye, awirdana ji bo paş lê helbestvan dev ji wê awirdana xwezayî berdaye û zêdetir tekezî li ser awirdana ji bo beramber kiriye di wêneya teksta honandina yekane de û ji curê rengvedana astên hestî û hişî ye" (Wicdan, 2012, s. 164).

Sewsen El-Beyatî di mijara bi navê “El-Teşkîlat El- Lewnyê Fî Şi'r Teyyib Cebbar” de belavkiriye, di wê mijarê de behsa pêkhatiya rengan di helbestên Teyyib Cebbar de dike û dibêje: "Hilbijartin û curê reng di nivîsandin û afirandinên wî helbestvanî de weke wê yekê ku amajeyêke sînemaya bêkarî, wate û amajeyêke cûda nîşan dide ku ligel rewşa wî bigûnce. Di tekstên helbestên wî de bi hinek şêwazên cûda kar dike, helbestvanê xurt ewe ku fezaya rengî bi wê yekê ku fezayek teşkîliye pileyan ji wan amajeyan werdigire ku li xwezatiyê hene" ( Sewsen, 2012, s. 165).

Selah Hesen di gotarek a navê “El-Întîfazet El-Kurdiye Fî Qesad Teyyib Cebbar” de belavkiriye, nivîskar di wê gotarê de behsa serhildanên gelê Kurd li Kurdistana Başûr dike û dibêje: "Kurdên îro wêjeya xwe bi ser dû qonaxan de parve dikin, beriya serhildanê û piştî serhildanê. Ew serhildana ku di bihara 1991’an de li dijî rejîma Seddam Hûsên çêbû ku xala cûdabûna wan bû. Wê yekê jî jiyana Kurdan guhert û ta astekê ew bûyer bû sedem ku bibe qonaxêke dîrokî ji wêjeyê re. Mijarên honandinan li cem helbestvanan hatine guhertin lê hunera wê weke xwe ma tenê mijarekê dinivîse û behsa çareseriya pirisgirêkan dike, aramiya zarokatiyê ji dest nade. Peyvan dadirêje her weke ku li cihê xwe yê bingehîn bilive” (Selah H. , 2013, s. 7).

Îbrahîm Mehmûd di mijarek bi navê “Qesaid telteft îla El-Emam Lî Teyyib Cebbar neqid yelteft îla el-xelf” de belavkiriye, nivîskar di wê mijarê de bi çavek rexneyî dîwana "Ew Şi'raney Awir Bo Pêşewe Deden" dinirxîne û dibêje: "Eger bi hûrî li wê dîwanê binêrîn, dibînîn afirandinek mezin têde heye. Ji bo mînak helbestvan komeke peyvên gelek dûbare dike ku nîşana serkeftina helbestvane di vî warî de weke peyvên (ev egerin, gula min, min here nehêle û hwkd û ew peyv jî bi taybet di honandinên dawiyê de gelek dûbare dibin, helbestvan ji bo mebestên taybet bikaraniye” (Îbrahîm, 2013, s. 9).

Suha Şamiye di hevdîtinekê de dibêje: "Endazyar û helbestvan Teyyib Cebbar gelek bi kûrî çûye nava helbestên xwe û siyaseteke xûrt ji bo balkişandina xwendevan ji bo nava helbestên xwe bikaraniye. Ji ber ku peywendiya di navbera helbest û wî endazyarî de peywendiyê xûrte û her dûk hunerî û alavên helbestê ji peyv, hevok û wêneyan pêkhatiye. Alavên endazyariyê jî ji ax, toz, kîsil, av û hwkd pêkhatiye” (Suha, 2010, s. 24).

Casim Asî di gotareka bi navê “Belaxet El-Îltîfat Îla El-Emam... El-Mewqif Wel Îhtîcac” de belavkiriye dibêje: "Helbestvan ew rêbaz ji bo cûdakariyê di bkaranîna ziman de weke amrazek rêzimanî girtiye dest, ew şêwaz bikaranîna ziman ji bo eşkerekirina wan diyardeyên ku ji wê şêwazê cûdane û hinek caran bi dijberê xwe re digihe asta lihevexistinê. Helbestvan bi wî corê serederîkirina bi ziman re rasterast nakokiyên eşkere nake, bi beramberkirina tevî wan têkiliyên ku di navbera wateyan de temam dibe” (Casim, 2014, s. 8).

Muhterem Mihemed di mijarekê de ku bi navê “El-Şa'ir Teyyib Cebbar We Qete' Şeterenc El-Luxewye” de belavkiriye dibêje: "Di yekem gava nixandina min de ji bo ew dîwana “Ew Helbestên Awiran Didin Beramberî Xwe” ew yek di hizra min de hat ku xweyîbûn xweyiyê gelek zalale li ser piraniya helbestên wî. Ew jî diyardeyê her çiqas di civakên azad de rê pê hatiye dayîn lê ew rêpêdan gelek şîrovekariyên honandinê ji dest dide û beşek ji stûnên ragirtina wê têkdîşkîne. Her wiha helbestvan dikare bi honandinên xwe hesta neşîurî ya xwendevan bi azirîne ji bo xwendina helbestên xwe” (Muhterem, 2014, s. 6).

Yûsif Yûsif di gotarek a bi navê “Sedmet El-Şi'r We Şi'r El-Cenet El-Mefqude....Teyyib Cebbar” de belavkiriye û dibêje: "Renge helbestvan zêdetir ji xelkê asayî xewnan bibîne û bi rêya xewnên xwe li pey otobyaya xwe bigere. Girîngtirîn armanca helbestvan weke ku hatiye zanîn ewe ku bi rastiyeke reha ji mebesta helbestê tê bigihe û armanca helbestvan girîngîdan nîne bi xwestekên ji nav Çûyî” (Yûsif, Sedmet El-Şi'r We Şi'r El-Cenet El- Mefqude....Teyyib Cebbar, 2014, s. 6).

Yûsif Yûsif di gotareke din de li ser dîwana ew “Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden” dibêje: "Dema helbestvan awirdanê bi helbestên xwe ve girê dide, ew cor, şêwaz û derbirînek afirandiye, bûye hêvênê hevok û çinîne di ziman de û guhertina helbestê ji bo candareke zindî di karê awirdanê de. Diyare karê wê awirdanê ji bo vî alî yan aliyê din an jî her aliyekî ku helbestvan diyar dike û diyare awirdan ji bo wan aliyan jî bi henek û ji xwe nehatiye ku helbesta wî lê dinêre” (Yûsif, El-'Tibar We Hidud El-Nes El-Ş'rî, 2014, s. 6).

## **1.2. SERDEM Û JIYANA REWŞENBÎRIYA HELBESTVAN**

Helbestvan, rexnegir û endazyar Teyyib Cebbar Emîn yek ji helbestvanên nava wêjeya Kurdî ya me ye. Di sala 1954'an de li gundê Tepelu yê ser bi parêzgeha Kerkûkê ji hembêza malbateke cotyar û hejar ji dayk bûye. Weke helbestvan dibêje: "Ez ji hembêza mabateke cotyar, gelek hezar û belengaz mezin bûme. Dayîk û bavê min nexwenda bûn ez û birayên min gelek han didan ku xwendina xwe tamam bikin. Bavê min her çiqas nexwanda jî bû, lê hertim li malê Qûran û hinek pirtûkên olî hebûn ku me û hin xelkê din jê re dixwendin” (Teyyib, Hevdîtin, 2008, s. 127).

Helbestvan heta pola pêncan a seretayî xwendina xwe li gundê xwe tamam kiriye. Di sala 1963'an de dibistana gundê wan bi sedema rewşa siyasî ji aliyê rejîma roxayî ya Iraq ve tê daxistin û naçar dibe ji bo domandina xwendina xwe ber bi bajarê Kerkûkê ve diçe û li mala birayê xwe yê mezin ê bi navê Zahîr Çaçî berdewamiyê bi xwendina xwe dide. Di heman demê de jî bi birayên xwe re li çayxanê dest bi karkirinê kiriye. Çayxana wan ketibû navenda bajêr û karkirina wî li wî cihê bû sedem ku zêdetir aşnayê helbestvan ên derdorê û civakê bibe.

Di navbera salên 1963-1972'an de qonaxa seretayî, navîn û amadeyî bi zimanê Erebi li bajarê Kerkûkê tamam kiriye. Di sala 1972'sn de li zanîngeha Silêmaniyê li beşa endazyariyê tê wergirtin û di navbera salên 1975-1976 de bawernameya bekaloryos di warê endazyariyê de werdigire. Di sala 1984'an de jiyana hevîniyê bi Firyal Mewlûd re pêktîne û xwediyê çar keça ye bi navên Tewel, Terze, Telar û Yema. Di sala 1987'an de ji ber rewşa siyasî hikûmeta roxayî ya Behsî nahêle Kurd li bajarê Kerkûkê erk werbigirin. Lewra diviyabû helbestvan li Başûr ango li Kurdistanê erk werbigire. Lewra helbestvan bi naçarî li bajarê Silêmaniyê li Rêveberiya Kar û Avakirîne tê erkdar kirin. Piştî serhildana mezin a Bihara 1991-1992'an bi hêjmareke hevalên xwe re Rêxistina Yekîtiya Endazyarên Kurdistanê dadimezirîn e. Di gera yekem de ji bo heyama 9 salan weke Cîgirê Serokê Yekîtiyaa Endazyarên Kurdistanê tê hilbijartin. Di wê heyamê de weke endameke çalak ê wê rêxistinê hêjmareke kar, çalakî û projeyên girîng encam dide. Lewra jî di gera dûwem a hilbijartina wê rêxistinê de ji bo heyama dû salan weke serokê wê rêxistinê hat hilbijartin. Di sala 1992 an de ji bo heyama çar salan dibe wekîlê Wezaretê Kar û Niştecihbûnê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê li bajarê Hewlêrê. Wate ta sala 1996 an û salekê jî li Silêmaniyê bi sedema rewşa dû îdareyîya Herêma Kurdistanê, di sala 1997 an de dest ji karê hikûmetê ber dide û xwe xanenişîn (teqawid) dike û di sala 1998 an de ofîsa endazyariyê li bajarê Silêmaniyê vedike û dest bi karê endazyariyê dike û tenê jî bi tevî mijûliya wî ya bi helbest û wêjeyê ve, hêj li ser karê xwe jî berdewam e.

### **1.2.1 HELBESTVAN Û JIYANA SIYASÎ**

Helbestvan her ji zarokiya xwe ve bi rêya birayên xwe tevî jiyana siyasî dibe. Ji ber ku birayên wî endamên Partiya Kominîst, çayxaneyê wan weke baregeheke hizbî lêhati bû. Ji ber ku poste û belavokên wê hizbê ji Bexdayê ve dihatin çayxaneyê wan û bi birayên xwe re dibirin malê û bi ser endam û alîgirên wê hizbê parve dikirin. Weke helbestvan balê dikişîne li ser "yek ji birayên min nexwendevan bû yê din jî li hucreya mela xwendî bû. Lewra ez di pîraniya civînên

wê hizbê de bi birayên xwe re amade dibûm ku li mala me bi rê ve diçû. Min jî têbinî û konivîsa civînê jêre dinivîsand, daxuyanî û ragehandin jêre dixwendin" (Teyyib, Cebbar, Hevdîtî, Silêmanî, 10.08.2016).

Ew jî bû sedema berdeewambûna helbestan di xwendina tekst û mijarên siyasî de bi taybetî di salên destpêka hefiyan de hander bû ku cihê xwe li nava rêkxistineke siyasî bibîne. Lewra di sala 1973'an de peywendî bi Heleqeya Rewşenbîriya Komelê ve kiriye û ta destpêka sala 1974'an beriya ku peywendiyê bi şoreşê ve bike bû endamê Komeleya Marks Lenîn a Kurdistanê. Di wê demê de Komele xwedî rêkxistineke xurt û çalak bû. Di wê serdemê de Komele bernameyek fireh ji bo rewşenbîrkerin û pêgihandina endamên xwe hebû. Teyyib Cebbar jî weke endamê çalak ê komeleyê pirtûkên (Marks, Englis, Lenîn, Stalîn, Maozedong û Kîm Îl Song) yên programê xwendine. Her weha ew pirtûkên ku li ser şoreş û şoreşgeran hatibûn nivîsandin bi taybet şoreşên Filistîn, Vîetnam, û Koba, welatên Amerîka Latîn, Efrîqa û pirtûkên Hişê mine, General Ciyab, Mûnîr Şefîq, Nacî Eluş, govara El-Hedef a Filistînî, Materyalîzma Diyalektîka Dîrokê û Wêjeya Din ya Marks xwendiyê û bandor li ser helbestvan kiriye. Lewra jî helbestvan şarezayiyek baş li ser zmanê Erebi hebûye. Di wê serdemê de hejmareke mezin a gotar û rêzikname (Mawtisîtong) wergerandine li ser zimanê Kurdî û bi ser rêxistinên komeleyê de parve kiriye. Her wiha hejmareke mezin a mijaran li ser (xebata çekdarî û displîna hizbî û exlaqê şoreşgeriyê) nivîsandiyê. Weke helbestvan dibêje: "Di wê serdemê de kadroyan gelek ji dema min digirtin û ez ji warê wêjeyî û hunerî dûr dixistim. Bi xwestek û îradeya cîhana min re nedigûnca ta di dawîya salên heftiyên de min dest ji komeleyê berda û carek din hatime nava cîhana taybet a xwe ku Cîhana Wêjeyî û hunerî yê" (Teyyib, Hevdîtî, 2008, s. 125-131).

### **1.2.2 TEYYİB CEBBAR Û JIYANA WÊJYÎ**

Teyyib Cebbar yeke ji navên diyar û geş ên nava wêjeyî û rewşenbîriya Kurdî ye. Ji ber ku zimanê xwendin û nivîsandina wî bi zimanê Erebiye, aşnayetiyê baş li ser wî zimanê peyda dike û helbestvan dibêje: "Tê hizra min ez

li refa sêyem a navendî bûm li dibistana navendî ya Îmam Qasim her car di waneya dariştinê de (înşa) min 30/30 werdigirt. Mamosteyê zimanê Erebiyê ji min re digot di siberojê de tû wê bibî wêjevaneke mezin" (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî 10. 8.2016).

Lewra helbestvan her ji zarokî xwe ve û di naverasta sallên şêstan de aşnayetî bi rojname û kovarên wê çaxê re peyda dke û pranya wan dxuyne weke kovarên "El-Seyad El-Mensur, Ruz El-Îwsif, Axir Sae, El-Şebeke, El-Mew'd, El-Eynul Musewere... Hitid" û rojnameya elteexî ku di sala 1967 de hatiye derxistin.

Di sala 1968'an de yekemîn pirtûka bi navê "El-Îbrat" a Mistefa Lûtî Menfelutî xwendiyê û gelek ketiyê bin bandora wê û tam jê wergirtiye. Piştê pirtûka (elnezrat fî sebîl elnacî) ya misteva lutfî û hejmareke romanên polîsê şarlok hollmiz û arsin lobînî xwandne, ew jî sedemek bû ku helbestvan ji xwendin û kirîna pirtûkan dûr nekeve û berdewam be. Helbestvan di dawiyên salên şêştan û destpêka salên heftiyên ên sedeya derbasbûyî de bi rêya kovara Beyan û Rojnameya Hawkarî dest bi xwendina mijarên Kurdî kiriye û xwe bi xwendevanê rojnameya Hawkarî dizane ku di salên 1970-1974'an de derketiyê û piştê dest bi xwendina dîwanên "sirûşt û derûn û beheşt û yadgarî" yê guhertin û pendên Pîremêrd, dîwana Awelî Dêwane û hejmareke helbestvanên din kiriye. Her di wan salan de kovarên rewşenbîriya nû, Roja Kurdistanê, nivîskarê Kurd û rojnameya Birayetî xwendiyê û bandor li ser helbestvan kiriye. Tenê bi xwendevaneke baş ê rojname û kovaran tê zanîn. Teyyib Cebbar ji wê serdema ku endamê Komeleyê bû, endamê "Grûpa Wicudiyekan" bû. Wicudiyekan komeleyeke rewşenbîrî bû, zêdetir girîngî bi mijarên hizrî, wêjeyî û hunerî dida. Dibin bandora wijdanê de hejmarek pirtûkên weke: Kolrrin Wlîsn, Sater û Kamo û romanên Zorbay Kazantzakî û hinek pirtûkên hizrî û felsefî xwendiyê. Her wiha nabe rol û bandora Tevgera Riwanê jî bêe ji bîrkin ku di destpêka yekem a qonaxa honandinê de bi awayeke rasterast yan jî nerasterast bandor li ser jiyana wêjeyî û rewşenbîrî ya helbestvan hebûye. Bi taybetî her dîwanên "Xiwaw Şare Biçkolekeman" yê Letîf Helîmet û "Proje Kudetayetî Nihênî " ya Ferhad Şakelî. Her wiha dîwanên "Min Tînwêtîm Be Gir Eşkê" ya Şêrko Bêkes û dîwana "Şernamey Şa'îrêkî Tînû" ya



Ebdûllha Peşêw, helbestên Celal Mîrza Kerîm, Selah Şiwan, Reûf Sabîr, Samî Şoreş, Hîşam Tahir Berzincî, Kenan Mîdhat, Selam Mihemed, Nebez Caf, hêjmareke helbestvanên din, çîrokên Hûsên Arif, Ehmed Şakelî, Kake Mem Botanî, Mihemed Ferîq Hesên û hinek kesên din bandoriyên xwe di wê qonaxê de li ser helbestvan hebûn.

Her di wê serdemê de aşnayê berhemên helbestvanên cîhanê dibe bi taybetî helbestvanên weke: Maykofsikî, Ergon, Nazim Hîkmet, Îlwar, Nîbroda, Rimbaud, Lorka, Baudelaire,, Eliot, Nîza Pawend, Langiston û Hîwz bû. Lewra helbestvan dibêje: "Ji helbestvanên biyanî dîwana (Alîza û Îwn Elîza) ya Ergon û dîwana (Uxinyatul Menfî) ya helbestvanê Tirk Nazim Hîkmet gelek bandorî li ser min çêkirine ku Dr. Ekmeledîn Îhsan gelek bi ciwanî wergerandiye bi zimanê Erebi. " (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî, 05.12.2016).

Di despêka destpêkirina nivîsandina helbest û karê wêjeyî de helbestvan dibin bandora berhemên helbestvanên Erebi de maye. Piştî helbestvan ber bi nivîsandina helbestên Kurdî ve diçe bi taybetî piştî salên 1970'an her di destpêkê de helbestvan bi nivîsandina helbesta "Taze" (Nû) hatiye nava cîhana honandinê û helbestên wî zêdetir li ser şêwaza stûnî bûn. Her ji destpêkê ve helbestvan bi kêmanî ketibû bin bandora helbestên wêjeya klasîkî. Di wê serdemê de, yekem honandina xwe bi zimanê Kurdî di Bihara sala 1969'an de nivîsandiye. Weke helbestvan dibêje: "Min ew helbest ji bo keçekê nivîsand, hezkirina wê ji bo min hebû, lê min hez ji wê nedikir, tenê yek rêz li hizra min maye ku dibêje:

"Min derrom herdê le şiwênim

Her çend hewl eda naydiwênim" (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî, 05.12.2016).

Rewşa çandî ya civaka Kurd li Başûrê Kurdistanê di navbera salên 1970-1974'an de gelek guhertin bi ser de hatin û ew guhertin jî ji encama hinek guhertinên siyasî, rewşenbîrî yên mezin bûn ku bi ser Başûrê Kurdistanê û deverê de hatibûn. Wan guhertinên siyasî bandorên mezin li ser warê rewşenbîriya Kurdî kir. Ji ber ku hêjmareke ya rojname û govaran di wê qonaxê de hatine derxistin.

"Beyana 11'ê Adara 1970'an ku ji beriya deh salan tevayî xebata gelê Kurd bû, ji encama qurbanîdaneke mezin a ser û malan hatibû rojevê. Bû sedema vejandina warên jiyana neteweya Kurd, bi taybetî warê çandî de. " (Îsma'îl Î. S., 2005, s. 61).

Derketina rojname û kovaran di wê çaxê de bi taybetî kovara Beyan û Rewşenbîra Nû Nivîskarê Kurd, Zanyarî, Xebatî Qutabîyan, Riwange, Roja Kurdistanê, Rojnameya Hawkarî, Birayetî û bi xwedina helbestan bi giştî karîne helbestvan ji bo helbestê zêdetir bibe û behreya wî ya honandinê xûrtir dike. Lewra helbestvan dibêje: "Bi awayeke giştî piştî sala 1971'an min dest bi honandin û nivîsandina helbestên hunerî kiriye ku mebesta min helbestên azad e. Ji wê demê ve şarezabûna min li ser şêwaza helbesta îqaî, pîvan û qafiyeya di zimanê Kurdî de baştir bû" (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî 5.12.2016).

Ew helbestên ku di salên 1971-1974 an de nivîsandi bûn bi sedema rewşa siyasî ya Başûrê Kurdistanê ji nav çûne û di dîwaneka bi navê (Bendikrawî Rojmêrêkî Bêtawan) de civandibûn tenê dû helbest ji tûnebûnê hatine rizgarkirin. Ew dû helbest di sala 2008 an de di yekem dîwanê de têne belavkrin. Yek jî ji wan ku di sala 1972 an de nivîsandibû, li hêjmara 32 ya rojnameya Birayetî di roja 04-01-1973 an de bi navê "Kirêwey Hewrêkî Tînû" de belavkiriye û dibêje:

" Xoşewîstim

Le baregay bê hestî şar

Firokekanî helbestim

Bombey yaxîbûnî hestim

Dehawêjin

Benaw derbendî tarîkî dillta... girî

Firîştey şoriş... derêjin

Keştî pestim

Le kendawî...

Bêdengî pîrmey giriyanta

Baranî hewrî turre bûn debarênê" (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 26-27).

Ji ber ku helbestvan endamê Komeleya Marksî Lenînî ya Kurdistanê bû, bi berdewamî mijûlî karûbarên siyasî bû. Lewra helbestên wê serdemê behsa neteweya Kurd, Pêşmerge, bexwedaan û şoreşgeriyê dikin. Lewra dikare bêjîn derketna Teyyib Cebbar di destpêka salên heftiyan ên sedeya derbasbûyî de weke helbestvanekê bandora nivîsandin û helbestên wî yên belavkirî li ser rûpelên govar, rojname û xwendina wan di semînar û çalakyên de bû sedema dewlemendkirina wêjeya Kurdî ya me. Lewra xwendin, têgihiştin û tam wergirtina ji honandinên wî helbestvanî ji aliyê nivîskar û rexnegiran ve bû sedema her yek li gorî dîtîna û nêrîna xwe nixxandinê ji bo helbest û karînen helbestvanê xwe bikin.

Her di vî warî de Dr. Elî Tahir Berzincî dibêje: "Teyyib Cebbar yeke ji dengên nû yên honandina Kurdî ye. Dema ku tekstên wî dxwînin di cih de ber bi cîhana lê nêrîn û rawestiyên ve diçe. Pêdiviya te bi hizirkirin û rawestanê ye lê di dawiyê de dikevî nava cîhana honandinê de. Ji ber ku bagrawinda çandî ya wî helbestvanî ji kesên din cûdaye, ezmûneke xwendina bêsinor heye. Hevrikiya wî bi çavkaniyên nû re, erkeke nû ya zimanê honandinê ye. Tekstên wî ketine nava qalibê honandinê, bandorên çavkaniyên nû yên rexne, wêjeya cîhanî û derdor li ser helbestên wî heye" (Elî, Hevdîtîna, Silêmanî, 20. 8.2016).

Weke eşkere ye di wêjeya Kurdî de, eger em bixwazîn li ser jiyana û berhemên her helbestvanekî bi xavî û lêkolînên taybet li ser encam bidîn dibînin cih yan jî bi pîroz ragirtina cih li cem piraniya helbestvanan bandoreke rasterast li ser cihê rewşenbîrî û pêgihandina honandina wî ve hebûye, gelek bi ciwanî di helbestên wan de reng vedaye.

Her ji helbestvanên mezin ên wêjeya klasîka Kurdî ve bigire heta helbestvanên vê qonaxê jî em wê hest û bandorê dibînîn. Lewra li cem helbestvan Nalî bi pîrozkirina bajarê Silêmaniyê, xak û gora wî digihe astekê ku ti kesekî ew maf nîne bê xwe pakijkirin û (Bismilahirin) û destnimêj girtin di nav de derbas bibe. Ew jî hesta kûr ya welatperweriyê nîşan dide. Her wek çawan di çîroka honandî ya Nalî û Salim de wê hestê seranserî helbestê şopandiye ku çawan Nalî nûçeya piraniya cihên Silêmaniyê, xak û gora wî dipirse. Lewra di wê behsê de eger em bixwazin behsa helbestvan bikin dibînîn cih gundê Tepelu bûye dînemoya hêvênê piraniya helbestên wî û muhbeta wî jêre weke volkanê di dilê wî de diheje û di qirika wî de qiçînê dike lewra ew hest gelek bi ciwanî di vê helbestê de desteber kiriye:

“Tepelû

Nîwero bû

Tepelûy mat û êsk suk

Tepelûy ciwan û şeng wek bûk

Bû be komelê xollemêş

Bû be nimuneyek ....bo karesat û êş

Nîwero bû

Tepelû... çolekeyek bû,

Deywîst berew asoy rizgarî helifrê

Balyan birî...

Afretê bû...

Betemabû... Bergî dîlêtî bidirê,

Lenapalim mareyan birî” (Cebbar, 2008: 35).

Lewra dibînîn nivîskar Fûad Ebdûlrehman di vegotinekê de behsa ezmûna honandina Teyyib Cebbardike bi vî awayî dibêje: "Tê hizra min, ciwantiyên rengê nest di helbestekê de ku ji min re dixwend dem nebû, cih bû, ew cih ew gund bû, ku têde ji dayîk bibû. Di zarokatî û ciwaniya xwe xwe de lê perwerde bibû, navê gundê wî ku gelek caran li ser zimanê wî bû Tepelu bû. Bi qasî destana Resûl Hemzatev jê hez dikir. Diyare cihê ku Teyyib Cebbar perwerde kiribû, kirbû helbestvan û endazyar jî û piştî kirina wî bi miroveke taybet bi xweyî ya Teyyib Cebbar bi xwe" (Cebbar, 2015: 7-10).

Lewra eger bi hûrî behsa jiyana wêjeyî ya helbestvan bikin û lêkolîneke taybet jê bikin dibînîn tevî hinek astengiyên ku li hemberî jiyana wêjeyî ya helbestvan hene lê her li ser nivîsandina helbestan berdewam dibe ta sala 1987'an ku dawî berhemê wî yê honandinê helbesteke bi navê "Silêmanî" ku yeke ji helbestên herî balkêş yê wî helbestvanî ku bû sedema zêdetir nasandina helbestvan bi cîhana honandinê û wêjeyî. Helbestvan di sala 1987'an de bi sedema rewşa siyasî ya wê çaxê ya Başûrê Kurdistanê û şerê heşt salî yê di navbera Iraq û Îranê helbestvan ji nivîsandina berhemên honandinê dûr dikeve û hinek evraz û nişivî dikevin jiyana wî. Weke koçkirina helbestvan ji bajêr ji bo gund û piştî veqerana wî ji bo bajêr û ji Kerkûkê ji bo Silêmaniyê. Ew jî bû sedema ku piranya berhemên wî yê honandinê rastî tûnebûnê bibin. Ta sala 1991'an carek din dest bi komkirina berhemên xwe yê honandî digere. Her weke ku helbestvan dibêje: "Min di wê qonaxê de nedixwest bibim helbestvan. "(Teyyib, Hevdîtin, Silêmanî, 20. 8.2016).

Wate, dikarî serdema jiyana helbestvan bi ser dû qonaxan de parve bikin:

-Qonaxa Yekem (1979-1987) lê mixabin piranya berhemên wê qonaxê bi sedema nebûna rewşa siyasî ya Başûrê Kurdistanê û şerê heşt salî yê di navbera Iraq û Îranê de ji nav çûn. Weke me got tenê hin berhemên kêr nebin ku li dîwana yekem di sala 2008'an de hatine belavkirin û piraniya berhemên wî yê wê qonaxê bêhna netewayetî, Kurdîyetî, Pêşmergeyî, berxwedan, şoreş û

şorişgerî jê dihatin. Her çiqas helbestvan piştî wê qonaxê bi heyamekê ji nivîsandinê dûr ket lê tevî wê yekê jî bi berdewamî mijûlî xwendina mijarên wêjeyî bû. Heta di naverasta salên 90'an de care din dest bi nivîsandina gotar û tekstên rexneyî dike û ta sala 2011'an wan gotaran belav dike. Temê jî mil bi milê nivîsandina berhemên nû li ser nivîsandina gotarên rexneyî jî berdewam e.

-Qonaxa dûyem ya honandinê ji sala 2008'an ve destpê dike. Di wê qonaxê de bi hest û hişekê carek din ji nû ve vegeriya nava cîhana xwe ya taybet ku cîhana wêje û honandinê ye. Helbestvan di wê qonaxê de dû dîwanên helbestan bi navê "Ew Rojey Min Demrim" û "Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden" diweşîne. Mebestên wî yên honandinê di wê qonaxê de zêdetir mirovantîne û hinek rehendên siyasî, civakî, evîndar û tecdîdî (nûbûnê) li xwe digirin. Tevî ku hinek berhemên honandî û gotarên rexneyî hene ku li rojname û kovaran hatine belavkirin, lê tenê di pirtûkan de nehatine weşandin.

Eger pîçek hûrtir li ser jiyana wêjeyî ya helbestvan rawestin, dibînîn tenê tu nasnaveke honandinê ji xwe re hilnebijartîye. Her weke çawan li cem piraniya helbestvanan hebûye, heta gelek caran bûye sedema nasandina helbestvan bi cîhana honandinê. Lewra em dibînîn helbestvan di wê yekê de jî, kesek nûger bûye û ew model şikandiye. Weke helbestvanên din li pey hilibijartina nasnanvan bigere lewra di vî warî de dibêje: "Hêza min ji nasnav re nebû, ew nasnav jî li cem min erê nebû ku di wê serdemê de hebûn weke, peşêw, damaw, bêkes, bêxew, helmet, hêrş û hwd. Diviya bû nasnavê min çayçî ba, ji min re gotiba Teyibê Çayeçî. Her weke çawan nha li Rojhilatê Kurdistanê jinek heye helbest û mijarên zarokan dinvîsîne, navê wê Semîn Çayçî ye. Êdî ez nizanim ew nasnav ji ku ve hatiye" (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî, 20. 8.2016).

### **1.2.3 BERHEMÊN HELBESTVAN**

#### **A- Di Warê Helbest û Wêjeyê de**

1- Komele yekem ya helbestan bi navê *Lawandinewey Xolemêş*, 2008.

2-Komele dûwem ya helbestan bi navê *Ew Rojey Demirim*, 2010.

3-Komele sêyem ya helbestan, bi navê *Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden*, 2011.

4-Tevayî berhemên honandî yên weşandî di sala 2015'an de di dîwanekê de bi navê *Serdemanê... Tarîkî Spî Bû* (Di Serdemekê De Tarî Spî Bû) de hatiye komkirin.

5-Dû komên helbestên wergerandî ji bo ser zimanê Erebî ji aliyê Ebdûllah Tahir Berzincî ve bi navên *Qesad Telteft Îla Al-Emam* li sala 2012 û *Zate Zeman... Al-Zulam Kane Ebyez* jî di sala 2010'an de li weşanxaneyê El-Xawunê li Beyrûtê hatîne weşandin.

6- Dûwem komeleya helbestên wergerandî ji bo ser zimanê Ingilîzî ji aliyê Mihemed Hûsên Resûl ve bi navê *The Day I'll be Dying* di sala 2011'an de û li dezgeha çap û weşana Serdem hatine weşandin.

7- Di salên 1992-1997'an de hêjmareke mijarên rexneya wêjeyî nivîsandiye.

8- Beşdare di civandin û zîndîkirina destnivîsên helbestvanên windabûyî yên Kerkûkê bi navê helbestvanên Kerkûkê ku tenê sê berg (pirtûk) jê hatine weşandin.

9- Hêjmareke mezin a berhemên honandinê hene ku li rojname û govaran de hatine belavkirin, tenê jî di pirtûkan de nehatîne weşandin ku helbestvan bi dixwaze bi navê dîwana çarem belav bike.

10- Hêjmareke zêde ya gotarên wêjeyî heye ku di pirtûkekê de bi navê *Geran Be Diway Îqa'î Wişeda* da (Geran Be Diway Îqa'î Wişeda...) di sala 2015'an de belavkiriye, tenê dû caran hatiye weşandin.

### **B- Di Warê Endazyariyê de**

1-Di salên 2000'an de hinek mijarên rexneya endazyariyê nivîsandiye.

2-Pirtûka Hinek Projeyên Ji Bo Têkdana Rewşa Avê di sala 2010'an de hatiye weşandin.

### **C- Di Warê Siyasî de**

1- Hêjmareke gotar li ser mijarên (Xebata Çekdarî, Disiplîna Partîti, Exlaqê Şoreşgerî) di destpêka salên heftêyan de nivîsandiye

#### **1.3. BANDORIYÊN WÊJEYA EREBÎ LI SER HELBESTVAN**

Eşkereye ku helbestvanên Kurd di dirêjahiya dîroka wêjeya Kurdî de bi awayeke rasterast an jî nerasterast bandoriyên wêjeya gelên din li ser hebûye. Bi taybetî wêjeya Erebî, Farisî û Tirkî her ji helbestvanên wêjeya klasîkî ya Kurdî heta digihe helbestvanên nû yên hevçax. Renge ew jî bi sedema desthilata zimanê wan gelan be bi taybetî zimanê Erebî ku zimanê Qûrana pîroz bûye, yan jî bi sedema wan dagîrkeran be ku her yek ji wan gelan ji bo heyamekê dest bi ser beşeke xaka Kurdistanê û gelê wê de girtiye. Çand û wêjeya xwe bi serde sepandiye, yan jî renga helbestvanan bi xwe jî hez kiribe hewl bidin ku li çand û wêjeya gelên din têbigihin ji bo aşnabûna wan bi wêje û çanda wan gelan. Vêca ew yek her çawa be niha beşek ji wan bandoran, bi awayeke eşkere li ser wêjeya me tê dîtin û rengvedaye. Ew jî tiştêk asayî ne bi tenê ji bo wêjeya Kurdî lê ji bo wêjeya piraniya gelên din jî ku sûd ji wêje û çanda hev dû werbigirin. Lewra Teyyib Cebbarê helbestvan jî her ji serdema lawîniya xwe ve li bajarê Kerkûkê aşnaya honandina stiranên (Um Kelsiyum, Necat El-Sefîre, Faîze EHmed, Ferîd, Etreş, Fehed Belan, Semîre Tofîk û Fîruz Neshet Yûnis) dibe û di bin bandora wan rojname û govarên ku di salên şêstan ên sedeya derbasbûyî de hatine derxistin, weke govarên (El-Seyad, Axir Sa'e, El-Şebeke, El-Mew'd, El-'Eynul Musewere) hwkd rojnamekanî (El-Teaxî) bi zimanê Erebî dest bi nivîsandina helbestan kiriye, bi tevî ku hinekên din bi zimanê cilfî (zimanî kolanî) bûn, lê tenê ti ji wan berhemên honandî yên wê serdemê nehatine belavkirin. Piştî aşnabûna bi



berhemên helbestvanên mezin yê Ereb ên weke: Seyab Beyatî, Bilind Heyderî, Nazik Alimlake, Fazil Alixzawî, Imî'e Ebas Emare, Mehmûd Derwîş, Xelîl Hawî, Samî Qasim, Mihemed Alfitûrî, Ahmed Hicazî, Ebdulletîf Al'bî û Nizar Qebanî. Her weke helbestvan di vî warî de dbêje: "Ez zêdetir bi helbestên Seyab, Bilind Ceyderî, Fazil Ezawî û helbestên wê serdemê yên Nizar Qebanî bi taybetî helbestên siyasî û qesîdeya (Hewamiş Ela Defter Al-Nekse) gelek matmayî bûm"(Teyib Hevdîtin, Silêmanî, 20. 8.2016). Bi awayeke rasterast di bin bandora wan helbestvanan de hate nava cîhana honandinê û dest bi nivîsandina helbestan bi zimanê Erebî kir.

#### **1.4. TEYÛB CEBBAR Û BERHEMÊN WÎ YÊN REXNEYÎ**

##### **Çemkê Rexne**

Dr. Kamil Beşîr bi vî awayî behsa rexneyê dike: "Peyva rexne ji peyva kritike ya Grîkiyan hatiye ku di bingehê xwe de wateya şîrovekirin û gûftûgoya tiştêkî digihîne. Bi wê yekê jî kar ji bo diyarkirina aliyên baş û xirab dike" ( Se'îd, 2014, s. 23).

Eşkereye mirov di destpêka peydabûna xwe de li şikeft û daristanan bi taybet jî ji wê dema ku zimanê xwe livandiye hestên xwe li hemberî kartêkirinên diyardeyên xwezayî û mirovî yên derdora xwe û jîngeha xwe derbiriye û rola rexneyî dîtiye. Wate, dikarî bêtîr piştî jî bi sedema peydabûna berhemên wêjeyî û rewşên bîrî rexne jî bo gava dîwem ji bo berçavkirina aliyên baş û xirab ên berheman. Ji ber ku "her yek ji teorên wêje û rexneya bingehîn bi hev re girêdayîne û ti yek ji wan nakare di şewazeke bi tenê û temam de derbikevin. Eger ê din pêre hevbeşiyê neke. " ( Mihemed S. M., 2011, s. 18).

Ewa ku em dixwazin di lêkolîna xwe de behs bikin û li ser rawestîna rexneya wêjeyî ye. Ji wê rexneyê re eger bi awayeke zanistî û akademîk rêzbendiyê jêre danîn ewe ku peydabûna nivîsandin û mijarên wêjeyî ji bo nixandina mijarên wêjeyî hatiye holê.

Wate, rexneya wêjeyî " ji hêlengandin, lêkolînên ji bo şîrovekirin û ravekirina berhemên wêjeyî yan hunera beramberkirina bi teksteke din a weke wê pêkhatiyê. Ji bo berçavkirina aliyên ciwanî, xûrtî û îstatîkî ya tekstê ku di encamê nirxê rastî yê tekstê ji aliyê form û naverokê ve xuya dibe" (Azad, 2013, s. 5).

Wate, rexneya wêjeyî rayên xwe bi kûrahiya dîroka wêjeyê alandiye. Ligel her qonaxek û pêşveçûneke wêjeyî, rexneya wêjeyî jî belav kir û berbelavtir bûye. Ji ber ku rexne "mekanîzma biryardanê ye li ser çarenivîsa teksta wêjeyî, yan jî nirxandina tekstê ye ji bo biryardanên li ser jiyana û mirina teksitê. " ( Se'îd, 2014, s. 23). Ji ber ku wêje bal kişandine li ser soz û hestên mirovan, bi baştirîn awayê bibandor. Lewra her dema mirov hest bi wê yekê kir ku di derûna wî de tiştêk pengaye û li gorî rêbazeke wêjeyî ya taybet derdibire û her demekê jî xwendevan hest bi wê yekê kir ku axaftineke din ciwantir û bi bandortire wê demê rexne dest bi karê xwe dke. Wate, dikarin bêjîn rexnesazî di dema serhildana wêjeyê de destpê dike. Yan bi wateyeke din rexneya wêjeyî piştî belavbûna teksteke wêjeyî li hemberî li rastî wê tê û şîrove dike daku ciwantir û eşkeretir bête dîtin û reng û şêwazeke din bi serde birijîne bi wî mercê ku rexnegir bi çavê reneyê li teksitê binêre. Ji ber ku "rexneya wêjeyî karek xwedî bernameye, hewla wê yekê dide, berhemeke wêjeyî bixwîne û lêkdanê jê re bike, şîrove bike û nirxandinê jê re bike" ( Çarliz , 2002, s. 22).

Wate, erkê rexneya wêjeyî li gorî girîngiya jiyana civakî ya wê demê, ewe ku bi pîvana mewdayê nûvekariya lêkolîna wê mijara wêjeyî bike û tevayî aliyên wê diyar bike. Nirxên xwe yên hunerî li ser hêla hatin û çûna wêjeyî jê re dane.

Ji ber ku divê rexnegir jî asteke bilind a rewşenbîrî û şarezayîyeke baş di dîroka wêje û rexneya wêjeyê de hebe û haya wî ji tevayî yan guhertin û pêşveçûnan be ku di qonaxên cûda de qewimîne daku di wan deman de her hûkmekî li ser tekstê bide li cem xwendevan bi girîng bê zanîn. Ew bi tevî ku peywendîya di navbera teksta wêjeyî û teksta rexneyî ya peywendîyeke bi he ve girêdaye û bêhev nabin. Vêca ji bo ku teksta rexneyî nebe teksteke tejiî wesf,

pêdagotin, şîrovekarî û redkirina tekstê. Ji ber ku emanetê wêjeyî rola xwe li ser diyarîkirin û hilbjartina tekstê dibîne. Lewra divê rexnegir ji soz û berjewendiyan dûr bikeve û nebe sedema wê yekê ku xwendevan xweziyê ji bo teksta bingehîn bixwaze. Ji ber ku xwendevan ji teksta nû tînagihe, teji zaraveyên dirêj û aloz in. Yanî gelek caran tekista binehîn (orginal) wê yekê naxwaze teksta nû li ser bête avakirin. Di wê demê de xwendevan bi şarezayî û kesayetiyek bi kar a xwe dikare biryarê li ser wergirtin an jî redkirina teksitê bide. Ji ber ku xwendevan di rexneya nû de beşdar e di vexwendin û şîrovekirina tekstê de. Ji ber ku her teksteke wêjeyî xwendineke cûda bi xwe heye. Ew jî tiştêk asayî û rewa ye. Ji ber ku renga vexwendin û şîrovekirina rexnegirekî yan her xwendevaneke asayî û vexwendina siyasî, dîrokî, wêjeyî yan jî derûnî be, tevî wê yekê jî her tekstekê wate û amajeyên gelek cûda li xwe digrin. Rexnegir jî bi şêwazê xwe weke afirînerê dûyem ê tekstê karên xwe di tekstê de encam dide ji hûrgilî û geryana di tekstê de ji wate û ramanên veşartî pêkhatiye û dîtin û nerînên xwe di vî warî de berçav dikin. Lewra rexnegiriya nû ya bi rastî ji tekstê çavkanî digire û zêdetir xwe rastî wan mijaran tîn ku giran û alozin. Ji ber ku eger tekest nivîsandinek teji mijarên veşartî be, teksta rexneyî jî ji eşkerekirin û rakirina perdeyan li ser mijarên veşartî ku xwe di navbera teksitê de veşartine, ewqas rola xwe di şîrovekirinê de dibîne. Ji ber ku rexnegrê xwedî ezmûn ji xwe gavên xwe ne avêje lê bi şarezayî rola xwe di şîrovekirina tekite de dilehîze. Ew jî alîkariya xwendevan dike ji bo zelalbûna tiştên nedîtî. Tevî wê yekê jî hinek ji rexnegiran piştî xwe bi hinek fakterên diyarkirîv ve girê didin; weke vegera ji bo jiyana nivîskar, rewşa tekstê û wan helwestên siyasî ku nîşan dide, tevî wê yekê jî dibînin "rexne haletêke ji haletên nivîsandinê û ser bi afirandin û geşkirina wêjeyî ye, hebûn û geşbûna wê girêdayî bi hebûna wêjeyê û geşbûna wê ve, ewa diqewime bi hevguhertina bandorê ye di navbera afirandina wêjeyî û rexneyê de. Li gorî nûkirina wêjeyî alav û serederiyên xwe pêşve dibe û wêje jî li gorî rexneya zansitî ya organîzekirî nixxandinê ji xwe re dike. Ji ber ku rexne roleke bi bandor dilîz e ku armanca wê dewlemendkirina afirandina wêjeyî ye " (Senger, 2012, s. 34-35).

Nivîskarê mezin yê Ereb Teha Hûsên têkildarî rexneyê dibêje: "Rexne rêbazeke felsefiye û divê rexnegir xwe ji her tiştekî dûr bigire û bi awayeke wisan pêşwaziyê li tekstê bike ku hizra wî/wê ji her tiştekî vale be ku di berê de li ser wê tekstê bihîstibe... Her wiha xwe ji hizra neteweyî, olî û mezhebî dûr bigire û parêzgariyê li bê alîbûna ziman bike" (Senger, 2012, s. 38).

Lewra bi dîtina Teha Hûsên rexne ji lêkolîn û şîrovekirina tekstê ji bo lêgerîna li pey aliyên hunerî, zansî, rêzimanî û hwkd pêkhatiyê. Eger em li destpêka rexneya wêjeya Kurdî binêrîn divê rol û bandora Ehmedê Xanî di warê rexneyê de li berçav bigirîn. Her wiha çawan behsa rexneya cîhanî tê kirin, divê behsa dû serdemên girîng û diyarîkirî yên wêjeya cîhanî bête kirin.

### **1-(Rexneya Yûnanî)Eflaton û Arîsto û Aristoan.**

### **2- (Rexneya Romanî)Horas û kantilyan.**

Ji ber ku Ehmedê Xanî li gorî wê serdema xwe bernameyek ji bo rexnegirtinê datîne û rexnegiran bi ser dû beşan de parve dike, tevî ku berhemên wêjeyî li cem tevayî gel û neteweyekî di destpêkê de bi hizreke sade destpê dike û piştê li gorî guhertina sîstma civakî û pileya aborî ya civak jî cihê xwe digire. Lewra di wê serdemê de Xanî li wan kesan dinêre ku rewşenbîr, berhemdarin û daxwazê jê dike rexneyên dilsarker lê negirin. Ji ber ku ket û westaneke mezin pêre kişandye. Her çiqas mebesta Xanî li vir ew nebû ku Mem û Zîna xwe bi berhemeke temam bêkêmbizane. Lewra gelek bi sadeyî berê xwe dide wan kesan û dibêje:

" Lê hêvî dikim ji muste'îdan

Dernan negirin li mustefîdan

Ev name eger xirap eger qenc

Kîşaye me ligel wan dû sed renc

Ev tîfle eger ne nazenîne

No bare qedî bewn şîrîne” ( Tehsîn, 2005, s. 68)..

Lewra dikarin destpêkirina hizra rexneya Kurdî li cem Ehmedê Xanî vegehrîn û di wê rojê de dijwar de destpêkiriye, bi tevî ku "ewên ku naxwînin û bihaneya wê yekê tînin ku wan zaniye Xanî çareserîya pîrisgirêka Kurdayetiyê û netewa Kurdî di bîrdoziya sûneta Îslamê de dibîne û ewên bi xirab jî me dixwînin wan jî ji bo wan zêdeye ku zanîne Xanî yekemîn netewperestê Kurd e. Lewra divê bêjîn di vî warî de ne nûkirina rexneyê hemû her xwendina şûnwarê klasîkiye, ne jî hemû curên xwendina şûnwarên klasîk jî dikevin nava çarçoveya nûkirina rexneyê” (Ebidûlqadir, 2005, s. 154).

Weke me bal kişandî li ser rexneya wêjeyî ya Kurdî jî weke gelên din destpêka wê ji hizreke sade destpêkiriye û li gorî guhertina sîstema civakî û aborî guhertin bi ser de hatye û qonax bi qonax pêşve çûye, cihê xwe vekiriye û geş bûye. Lewra erkê rexneya wêjeyî ji şîrovekrin û ravekirina li gorî şîyan û derxistina nîrxên mijarî pêkhatiye. Ji ber ku ewa ku wêje balê dikişîne li ser û dinivîse destpêka dûdilyeke wijdaniye, piştî wênekirin û derbirîna wê ye bi peyv û hevokên balkêş û bi bandor ku wate li vir erka nivîskar temam dibe û êdî ji vir pêve divê karakterê rexnegir bi şêwaza xwe bixebite ji bo rexnekirineke dûrbînî li ser karên wêjeyî û tekstê digihin asta herî bilind ya afirandinê.

Lewra nivîskarên Kurd jî ji mêj ve hest bi girîngî, nîrx û rexneya wêjeyê kiriye û girîngî pê daye û dibin siha rexneyan de mijarên xwe şîrove kirine. Eger li rûpelên govar û rojnameyên Kurdî binêrîn bi taybetî ewên piştî serhildanê, xuya dibe ku di wê qonaxê de hêjmareke hewlên rexneyan têne dîtin ku bi xwendineke nû cilek (berg) din li ber bejna rexneya wêjeya Kurdî dikin. Di hemû amrazên wêjeyî de ku ew jî cihê dilxweşiyê ye. Bi taybetî piştî serhildana hêjmareke ciwanên xwedî şîyan bi alav û dîtineke nû û bi rêya rexneyê hewl ji bo nûjenkirin û pêşvebirna wêjeyê dane. Yek ji wan xameyên diyar ên nava wêjeya Kurdî helbestvan û rexnegir Teyyib Cebbar e ku beşdariyeke çalاک di warê lêkolîn û xwendina teksta helbestî û rexneyê de kiriye.

Weke me bal kişandî li ser Teyyib Cebbar, piştî serhildana Bihara 1991'an dest bi nivîsandina gotarên rexneyî kiriye. Yekemîn gotara rexneyî di rojnameya Kurdistanê Niwê de bi navê "Şî'r û...Topî Pê" belavkiriye. Nivîskar di vê gotarê de behsa wan kesan dike ku di wê hizirê de ne (pîvan û qafye) ji bo helbestê pêwîst nîne. Nivîskar di vî warî de dîtina wan kesan reda dike û gelek bi hûrgilî behsa girîngiya pîvan, qafye, bingeh û amrazên din ên helbestê dike û dbêje: "Bi dîtina me paşguhxistina pîvan û qafyeyê corekî şaşitiyê çêdike. Weke wê ye ku hêjmareke peyvan dadirêje li ser kaxezê bê ku bi awayeke wiha rêk û pêk bikin û îq'a zimanê helbestê çêbibe. Her wiha paşguhxistina her bingehê cihî jî, heman şaşitiyê li cem xwendevan çêdike" (Teyyib, Şî'r û...Yarî Topî Pê, 1995, s. 8).

Nivîskar ji bo zêdetir ketina nava mijarê behsa wê yekê dike ku çawan di lîstoka topa pê de hinek yasayên giştî hene, bê hebûna wan yasayan lîstok nayête encamdan, weke hebûna qadeke diyarîkrî û dû tîmên werizşê, top, dû qelayên diyarîkrî, dadmend û hwd. Nebûna her yek ji wan dibê sedema wê yekê ku lîstok nayête encamdan an jî bi netemamî bête encamdan. Ti tam û xweşiyek di lîstoikê de nayête dîtin. Lê bê yasayî çêdibe û her yek ji bo xwe li pey topê dibez e. Lewra bi dîtina nivîskar di warê honandinê de jî heman bê yasayî çêdibe. Eger peyrewa bingehîn û yasayên honandinê nayête kirin, ti tam, xweşî û ciwanîyek di helbestê de nayête dîtin û wê demê jêre nayête gotin helbest. Ji ber ku "hunera honandinê hunereke beredayî nîne lê bingeh û amrazên taybet bi xwe hene ku divê bêne li berçav girtin, dakû bikare helbestê bi tam bête pêşêş kirin. Lê helbesvan û hebûna helbestvanê hunermend li ser şîyan û kontrolkirina amrazên bingehîn ên honandinê radiweste ne dariştina peyvan li ser kaxezê" (Teyyib, Şî'r û...Yarî Topî Pê, 1995, s. 8).

Teyyib Cebbar di mijarek a bi navê "Baznekanî Gul Bê Baziney Şî'r" de belavkiriye ku nivîskar di wê mijarê de teksta helbesta Bazinê Gulê ya Kejal Ehmed şîrove dike. Nivîskar di destpêka mijarê de beriya şîrovekirina tekstê behsa wê yekê dike ku cihê dilxweşiyê ye piştî serhildanê car caran hêjmareke gotarên rexneyî li ser rûpelên rojname û govaran tene dîtin ku nixandînan ji bo tekstên helbestên helbestvanên ciwan dkin ku piranya wan nixandînan bi kêleka

tekstê bi xwe ve naçin. Lê piraniya wan behsan dîtin û nêrînên helbestvanan dikin ku çawan li cîhanê dinêrin û jê tê digihin. Bi kurtî jî naveroka helbestan xuya dikin. Piştî Teyyib Cebbar tê li ser nixandîna û şîrovekirina mebesta sereke ku nixandîna tekstê ye, nivîskar bi awayeke bê alî behsa kêmasî û başiyên amrazên avakirina teksitê dike û li ser radiweste û ji aliyê pîvan, qafiye, awaz, wate, ziman, wêneyê honandinê û xeyalê ve nixandîna jêre dike. Nivîskar dîtin û nêrînên xwe li ser şîyanên tekstê derdibire li gorî erkên rexneyî dinixîne. Her di wê mijara rexneyî de behsa dîtin û nêrînên rexneyî yê rexnegir Dilşad Ebdûllah dike li ser heman teksta ku li hêjmara 1090 ya rojnameya Kurdistanî Niwê belavkiriye û dibêje: " Nixandîna Kekê Dilşad gelek kurt e û destpêka wê (1/3) ya gotara wî ye û behsa helbestê nake" (Teyib, Baznekanî Gul Bê bazney Şîr, 1995, s. 8).

Ji ber ku nivîskar di wê baweriyê de ye ku divê di teksteke wiha de nixandîna ji bo naveroka tekstê bê kirin ne nivîskar xwe mijûlî mijarên nesereke bike.

Di mijareke din a bi navê " Dilsoz Heme Şîrane Ture Debê " ( Teyib, Geran Be Diway Îqâî Wişeda, 2015, s. 42). belavkiriye. Di wê mijarê de helbestvan bêhneke kûr şarezayîyeke baş di hilbijartina tekstan de heye. Ji ber ku tenê tekst bi xwe kesayetiya nivîskarane, ti bandorek di hêlengandinan de nîne. Belge jî ji bo wê yekê ew nivîsandîna wî ye ku li ser teksta helbesta (Be Mirdinim) a Dilsoz Heme nivîsandiye, ew helbest ji (36) rêzan pêkhatîye û li ser pênc wêneyan hatiye parvekirin. Lê wêneyên ji hev neqetiyane û peywendîya wan bi hev re heye. Nivîskar gelek bi awayeke mijarî aliyê pozetîvî û negatîvî yê tekstê şîrove dike û tevayî derz û qûncikên helbestê ji aliyê ziman, wêne, wate, awaz, form û naverokê ve bi giştî xuya dike. Ew jî wê yekê digihîne ku bandora teksta helbestê xwe bi ser de sepandîye û bi hûrî kar li ser kiriye. Dîtin û nêrînên xwe li ser tekstê nîşan dane, ti derfetek ê gûftûgokirinê nehêlaye ku li ser tekstê bê kirin. Wîjdana xwe asûde kiriye bi wê yekê ku kariye tilya xwe ji bo tevayî aliyên baş û xirab ên tekstê diirêj bike. Eşkere ye Teyyib Cebbar bi wî karî kariye tiştê li ser avakirina rexneya wêjeya Kurdî zêde bike. Ji ber ku rexne û lêkolînên wêjeyî rûmeta wêjeya

me ciwantir dike. Ji ber ku rexne bi karê dilsozane bi pêş ve diçe. Ewa ku di wê mijarê de bûye cihê dîtî û nêrînê ewe ku nivîskar bi başî di şîrovekirin, wate, hêma, amaje û hûrgiliyên tekstê de têgihîştîye, xwe ji astengên tiştên kesayetî û taybetî dûrxistiye. Ew jî dibe aliyekê din ê serkeftina nirxandina nivîskar. Dibe faktorek ku nivîskarê teksta bingehîn bi singek fireh ve pêşwaziyê li rexneyên rexnegiran bike. Aliyeke din yê nirxandinê ewe ku Teyyib Cebbar bi her dû aliyên pozîtîv û negatîv ve nirxandinê ji bo tekstê kiriye û mebesta wî ew bû ku bi vî awayî teksteke rexneyî ya ciwantir li ser teksta bingehîn berhem bîne.

Di mijareke din a bi navê (Bonî Şî'r) bellavkiriye, Ku nivîskar di wê mijarê de teksta helbesta(Bonî Bxtewery) Mihemed Kurdo yê helbestvan şîrove kiriye û bi çavê rexneyî teksta helbesta wî nirxandiye, behsa tevayî amraz û bingehên helbesta wî ji aliyê awaza derveyî û awaza navxweyî ve bi giştî kiriye ku xwe di pîvan, qafiye, wêne, ziman û peyama tekstê dibîne. Nivîskar di wê mijarê de hewl daye bê alîbûna xwe biparêz e. Her çiqas helbestvan Mihemed Kurdo yeke ji hevalên wî yên nêzîk, ji ber ku bi dîtina nivîskar yek ji taybetmendiyan rexneyê xwe dûrkirina ji mijarên kesî ye. Eger em li wê mijarê binêrîn, ew taybetmendî bi zelalî diyar dibe, piştî nivîskar xwe berdaye nava mijarê û ji hemû aliyekê ve lêkolîn kirine. Wate, nivîskar tenê li ser aliyekê tekstê ne axiviye lê gelek bi kûrî çûye nav û li deriyê her amrazêke teksta helbestê xistiye daku bi kare helbestê bi zîndî bihêle. Di vî warî de dibêje: "Hebûna bexteweriyê nav û nîşana helbestê ye. Bêgûman em hemû dizanin bexteweriyê bêhnê nine. Ji ber ku bextewerî hest û haleteke derûnî ye ne maddeyek a bêhnvedanê ye. Her di nav û nîşanê de pêdana berjenga (sifet) "bêhin" bi "bexteweriyê re" honandina tekstê û şiyana honandina helbestvan diyar dike. Her ji ber wê nav û nîşanê jî, min nav û nîşana helbestê kir (Bonî Şî'r). Ji ber ku helbestê jî bêhn nîne" ( Teyyib, Geran Be Diway Îqaî Wîşeda, 2015, s. 27).

Her wiha di mijareke din a bi navê (Edebî Jin û Edebî Piyaw) de behsa wê yekê dike ku gelo ti wêjeyek heye bi navê wêjeya jin û wêjeya zêlam? Ji bo bersivdana wê pirsyarê nivîskar di wê baweriyê de ye tenê nivîskar û rewşenbîran



li ser wê yekê lihev nekirine. Ji bo wê yekê jî dû dîtîna û nêrînan destnîşan dikin. Yekem: Hinek nivîskar hene çî zêlam bin an jî jin bin di vê baweriyê de ne ku jin û zêlam mirov in û berhemê wêjeyî jî berhemek ê mirovantiyê ye û ti cûdahiyek di navbera wan de nîne ku jin binivîsîne yan jî zêlam. Dûwem: Hinek nivîskar û rewşenbîrên din jî hene di wê baweriyê de ne ku jin û zêlam dû candarên cûdane. Lewra dikare wêjeya wan jî cûda be lê di navbera wan her dû nêrînan de nivîskar dibêje: "Her teksteke wêjeyî ji şêwe û naverokê pêktê. Bi şêwe ez bawer nakim şêweyek hebe ji bo wêjeyê û bêje ev şêweyê jinane ye, yan jî ev şêweyê zêlamaye. Ji ber ku wêjeya jinê û wêjeya zêlam di şêwe de yek in. Ji bo mînak eger helbestek ji aliyê jinê ve hatibe nivîsandin şêweyê wê ti cûdahiyek bi wê helbestê re nîne ku zêlam nivîsandibe. Ji ber ku bîngê û amraza şêwe ji bo wêjeya jinê û wêjeya zêlam yek in lê wêjeya jinê û wêjeya zêlamî di naverokê de cûdane. Ji ber ku bi dîtina min dîtîna, nêrîna û cîhanbînya jin û zêlam ji hev cûdaye. " ( Teyib, Edebî Jin û Edebî Piyaw, 2009, s. 67).

## **BEŞA DÛWEM**

### **2. Naveroka Mijarên Honandinê yên Teyyib Cebbar**

Eger ruxsar (sîma) yê helbestê roleke girîng di helbestê de bilehîze û bi beşeke girîng a pêkanîna helbestê bê bi navkirin wê demê naveroka helbestê jî girîngiyeke taybet a xwe heye û bi temamkerê beşa din a helbestê ku ruxsariye tê danîn. Lewra helbestvanan her di kevin de girîngî bi mijar û mebestên honandinê daye û paşguhxistin. Ji ber ku bi rêya naverokê dikare peyam û armancên xwe rastî xelkê bike. Teyyib Cebbar jî weke helbestvanek xwedî karîn û jêhatî bi tevî girîngîdana bi ruxsarê helbestên xwe ewqas girîngî bi mijar û naveroka helbestên xwe jî daye. Ji bo wê yekê jî xwe di nava mebestên helbestên xwe de helandiye ew jî ji bo berhemanîna helbesteke balkêş, wate dikarin bêjin helbestvan bê armanc tu deman zorî li xwe nekiriye da helbestekê biafirîne.

#### **2.1. Helbestên siyasî**

Helwesta siyasî ya helbestvan li hember desthilat, fermanbaran û bûyerên siyasî, yan jî gelek caran behskirina aliyeke siyasî yê welat mebeseta neteweyî li xwe digire. Ji ber ku helbestên siyasî bi beşeke girîng di ezmûna helbestên nava wêjeya her neteweyekî de tînin danîn. Lewra di lêkolînên hevçax û nû de girîngiyeke gelek taybet jêre hatiye dayîn. Lêkolîn û nirxandinên cûda li ser hatîne kirin. Ji ber ku "helbestên siyasî zêdetir nêzîkî bangeşeyên siyasiye, ziman û dariştina zimanê ragihandinê ye, yan jî eger bi hûrtir behs wê bikin zimanê rojnamegeriyê ye, nêzîkî dirûşm û bîrdoziya siyasî ye." ( Mihemed D. E., 2004, p. 89) .

Lewra dikare bê gotin helbesta siyasî ya Kurdî zêdetir helwest û derbirîna xwesteka gele li hemberî desthilatê. Vêca ew helwest û derbirîn alîgirî, hezkirin û dilsoziya ji bo desthilatê be yan jî dijberî kirin û derbirîna narezayetiye be. Lewra dibînin mebesta honandinên siyasî li hemberî helbestvanên Kurd jî piştî salên 1914'an an zelaltir bêjin piştî şerê yekem yê cîhanê pêşketin bi xwe ve dîtîye û qonaxên baş derbaskirine. Bi sedema wan rewşên nû ku li cîhan û Kurdistanê

hatine rojevê ji aliyê siyasî ve derfeteke baş pêkaniye ji bo peydabûna mijarên honandina siyasî, da ku bi şêwaza nû û hevçax biçe nava taqîkirinên honandinê. Wate, rayên mijara helbesta siyasî bi kûratiya dîroka wêjeya Kurdî de çûye xwarê û piranya helbestvanan helbest ji bo wê mebestê honandine. Ew hest jî li cem piranya helbestvanên nû û hevçax bi zelalî tê dîtin û rengvedaye. Her yekê li gorî serdem û qonaxa pêşketina helbestê û bûyerên siyasî yên serdema xwe helbest ji bo desthilat, fermanîdar û bûyerên siyasî honandine. Weke di berê de me bal kişande ser vêca çî ji bo muhbet û pêda gotinê be yan jî ji bo mebesta dijberîkirin û derbirîna narazîbûnê.

Lewra eger em bixwazin behsa ezmûna honandina Teyyib Cebbar bikin di warê honandina siyasî de weke helbestvaneke siyasî di dîroka wêjeya Kurdî de cihek diyar heye: Piraniya helbestên wî ezmûna siyasî û nîştîmanî ya wî û gelê wî bûye. Ji ber ku Teyyib Cebbar çî weke helbestvan an jî weke kesekê asayî yê nava civakê, xebata bûyer û guhertinên siyasî yên başûrê Kurdistanê, bi awayeke rasterast bandora xwe li ser hebûye. Di wê qonaxê de muhbeta xak û neteweyî li cem helbestvan li pêşiya her tiştekî bûye. Lewra dibînîn piraniya wan lêkolînên ku di warê honandina wî de hatine kirin bi taybetî helbestên siyasî tevayî wan li ser wê yekê li hevin ku helbestvan dengê herî diyar yê helbesta siyasî û nîştîmanî bûye di serdema xwe de. Helbestên wî yên siyasî rûberekê fireh dagirtiye bi beramberkirina tevî mebestên din yê honandina wî. Ji ber ku helbestvan bi çavên xwe piraniya rejîmên yek li pey yek ên Iraqê dîtiye ku bi ti awayekî dijberiya neteweya Kurd, tevger û şorşên tevgerî ya Kurd kiriye û hewl ji bo nehêlana nasnameya Kurd û tûnekirina wan daye. Kurd jî weke neteweyeke zîndî bi berdewamî di berxwedan û canfedayiyê de bûye ji bo bi destxistina mafên xwe yên neteweyî. Lewra dikarî zelaltir bêjîn Başûrê Kurdistanê di serdema helbestvan de rastî hêjmareke rewşên bilind û nizim yên siyasî bûye û helbestvan jî bi çavên xwe piranya wan karesatên nexweş dîtiye. Her ji hatina rejîma Be'es a hilweşayî ji bo destihlatê di sala 1968'an de, şikestina şoreşa Îlonê û pêxistina şerê heşt salî yê di navbera Iraq û Îranê de, roxandina tevayî gund, piraniya bajar û bajarokên Kurdistanê, talankirina serwet û samanê neteweya Kurd, karesatên

kirêt yên Enfal û kîmyabarankirina bajarê Helebce û piraniya deverên din ên Kurdistanê, kuştin û girtina nifşên neteweya Kurd heta digihe serhildana gelê Kurdistanê di sala 1991'an de ku bû sedema şikandin, tûnekirin û derxistina desthilata rejîma Behs li deverên Kurdistanê û vekişandina îdareyên bajar û bajarokên Kurdistanê ji aliyê rejîma Be'esî ve ji bo çêkirina aloziyan li deverên Kurdistanê.

Tevayiya wan sedeman bandoriyên xwe li ser hişyariya siyasî ya helbestvan û neteweya wî hebûn û hewl daye di asta xwe de berdewamiyê bi xebat û şoreşa li dijî neyarên neteweya Kurd bide. Bi tevî ku helbestvan bi xwe û malbata xwe beşdarî di tevger û şoreşên Kurdistanê de kiriye û endameke çalak bû di Komeleya Marksî- Lenînî ya Kurdistanê de û endamekê çalak ê rêxistina xwendevanên wê serdemê bûy. Lewra gelek caran merc nîne xewn dîtin bi berê ve weke helbestvan dibêje "Serdemanê tarîkî spî bû" ramana şikestin û ser tewandinê be lê gelek caran vegeraye ji bo berê ji bo rengînkirin û Ciwankirina siberojê bûye.

Vêca ji bo ku bi awayeke zelaltir lêkolînê ji bo helwesta siyasî ya helbestvan bikîn, divê ji bo dû qonaxên honandina siyasî yên Teyyib Cebbar vegeirîn. Ji ber ku helbestên wî ji naveroka bûyerên siyasî yên serdema helbestvan û desteberiya hizir, dîtin û nêrînên siyasî û welatperweriya Teyyib Cebbar hatine wergirtin. Lewra dibînîn ku helbestvan gelek bi hişyarî û agahî serederî bi bûyer û karên wan çaxan re kiriye û helwesta xwe di vî warî de bi honandinê derbiriye. Bi taybetî ew helbestên ku di navbera salên (1970-1987) nivîsandî dikevîn çarçoveya helbestên siyasî. Ji ber ku xwedî sîma û taybetmendiyan taybet bi xwe heye. Weke mînak jî helbestvan di helbesta (Bestey Çawerwanî) de ku di sala 1976'an de nivîsandiye û dibêje:

Giyane.. Giyane.. dîsan cedirmekanî şa,

Leser to.. abluqeyan da

Deyanewê.. dem kutim ken.. dengim birin.

Tapoy xoşewîstît.. Le dilma bdirin.

Deyanewê. nemin.. ne to..

Carêkî tir.. neynego...

Bê nawu.. bê nawnîşan bîn

weku serxoş, xawen hestêkî bê giyan bîn” (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 53).

Ev yek ji wan berhemên wî yên balkêş ku behsa dijberîkirin û desthilata wê serdemê ya rejîmê Be’esî ya roxayî dike ku çawan bi awayeke hovane rastî Kurdistanê û gelê wê hatiye. Yek ji nîrxên bilind ên wê helbestê ewe ku li ser bingeha gûftûgokirinê hatiye damezirandin. Yanî di helbesta (Dastanêkî Şêtêkî Tir) de ku di sala 1975’an de nivîsandiye dibêje:

“Rûbar bo lay derya deçê,

Minîş bo lay to.. Toy bê naz.. Toy azîz dêm.

Şîrînekem.. Dilniyabe dêm.

Maçit dekem.

Ger hemû dîwarekanî.. em cîhane

Bikene şurey nêwanman.

Baweşt piyadekem.. ger beqed berzay..

Asman dûrit xenewe lêm.

Sînurekan dekeme pêplîkanew serdekewim,

Dêm.. delaqey zamekanit.. Dekeme maykirofonê..

Le ahengêkî tazedada,

benawî xot.. bangit dekem” (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 38-39) .

Teyyib Cebbar di wê helbestê de agirê şoreşê û canfedayiyê di hundirê wî de hatiye pêxistin, ewqas çûye di nava heskirina nîştîman de weke heskiriya xwe lê dinêre. Lewra li cem wî girîng nîne eger tevayî sînor û nirxan têbîşkîne ji bo ku pê bigihe, destê wê bigire ji bo serkeftinê ta wê dema ku gelek bi devê xwe bi navê xwe bang dike. Lewra helbestvan di wê helbestê de helwest, dîtîna û nêrînên xwe bi awayeke nezêl derbiriye, daku ji metirsî û gefên neyarên wê serdemê yê gelê Kurd dûr be. Yan jî di helbesta (.....) de dibêje:

"Ey nazanin,

Xor hellnaye.

Taku asoy şar, bergî sûr..

Le berneke.

Ey nazanin,

Behar naye,

Taku asman..

Firmîskî çawî daneke" (Teyyib, Lawandinewey Xolemê, 2008, s. 51).

Helbestvan di wê helbestê de xewn bi rizgarkirina Kurdistanê ve dibîne û bi berdewamî bi hêvî li wan karesat û malwêraniyan dinêre ku rastî xak û neteweya wî bûne. Ji ber ku helbestvan di wê baweriyê de ye werîsê stemkariyê bi stûrî diqete. Lewra helbestvan ji wê riwangehê ve li siberoja Kurdistanê û gelê xwe nêriye. Teyyib Cebbar di helbestên xwe de gelek bi kûrî behsa dîtîna û nêrînên siyasî û nîştîmanî yê neteweya Kurd kiriye û digihîne asta xebata neteweyên din ên cîhanê û bi xebata mezin a mirovatiyê ve girê dide. Ji ber ku Kurd bi dirêjahiya dîrokê ji xebat û canfedayiyê dûr neketiye ji bo serkeftin û rizgarbûna xak û neteweya xwe. Her weke di helbesta (Sîrûdî Diwaroj) de ku di sala 1984'an de nivîsandiye û dibêje:

"Rojê dadê,

Min debim be kolekey to,

To debî be kolgey min.

Dest le naw dest,

Bêtris le kes,

Hemîşe berew dilî xor

Dûr lexem.. Dûr le ajawe,

Dûr le firu fêl û diro

Tiwêşeman xoşyekî zor

Bebê nahez.. Bebê dujmin

Hemû pêkewe.. Wek bira

Wek yek xêzan

dejîn le sayey yek çira" (Teyib, Lawandinewey Xolemê, 2008, s. 64-65)..

Wate, dikarin bêjin tevayî helbestên yekem qonaxa helbestvan siyasî ne. Ji ber ku hemûyan bêhna azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistanê jê tîn. Lê helbestvan di dûwem qonaxa honandina xwe de bi taybetî helbestên dawiyê nerazîbûn û gazindên neteweya xwe li hemberî partiyên siyasî yên Kurdistanê derdibire. Ji ber ku li cem helbestvan di her serdemekê de û li her cihêkî ne yeksanî û ne dadperwerî heba rû bi rû dibû, netewe û desthilat ji egerên metirsiyan û encamên xirab haydar kiriye. Lewra di helbesta (Hilbjardin) de dibêje:

Ême pêman waye nakirê...

Xire berd,

Mitmaney bumelerze..

Bedest bânê.

Ger semay nearm,

Legel leŞu lary auda..

Nsazênê.

Bo xo dizînewe

Le gemey roçûn,

Debê le gel dewru berda..

Xwanî girewî nusraw..

Birazênê. " (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 68-69) .

Ew yek ji wan helbestên helbestvane, ku bi awayeke henekî behsa hîlbijartinan têde dike. Ji ber ku li cem helbestvan programa partiyên siyasî tenê tiştek xeyaliye û ti guhertinek jê berhem nayêt. Ji ber ku piraniya siyasîmedarên Kurd beşekin ji pêkhatiya hêza civakî ya siyasî ku mebest û armanca sereke ya wan zêdetir parastina cestayê xwe ye ne parastina cestayê neteweya xwe ye.

Yan jî di helbesta (Derdewan) de dibêje:

"Bese ewende siwên mexon.

kes taqetî nemawe.

Gwê bo milbadanî qise şil bikat.

Kes taqetî nemawe,

Hêzî bêzarî qut bidat.

Bese îtir, bo ewende hez le:

Şîlanî şanu milî dirow...



Jenînî mosîqay çewaşew...

Razandinewey xiyaretî sermor û...

Kudetay pêşwexte deken? " (Teyib, Derdewan, 2016, s. 7) .

Di vê helbestê de dibînîn helbestvan li hemberî wan xemsarên ku li hemberî xebat, şoreş û canfedayîyê hene ku neteweya Kurd bi dirêjahiya dîrokê ji bo rizgarbûn û serxwebûna xak û neteweya xwe xebat kiriye, ji desthilat û ji partiyên siyasî xeydî ye. Lewra helbestvan li vir bi (Derdewan) bi nav dike û weke nexweşiyek siyasî dibîne. Wate, Teyyib Cebbar di wê baweriyê de ye şêwazên xebatê ji qonaxekê ji bo qonaxeke din tîn guhertin. Lewra ew di wê baweriyê de ye ku di vê qonaxê de jî bi awayeke cûdatir ji qonaxa yekem divê helbestên wî biçe xizmeta berxwedanê û li hemberî nedadperwerî û bêdadiyê raweste daku bi awayeke din xizmeta xak û neteweya xwe bike. Ji ber ku eger helbestên qonaxa yekem ên helbestvan li dijî zordarî, stemkarî û neyarên neteweya wî bin, di helbestên qonaxa dûwem de bi taybetî helbestên wî yên dawiyê rû bi rûy desthilat û partiyên siyasî dibe li hemberî wan xemsariyên ku li hemberî şoreş, qurbanîdan û canfedayîya neteweya Kurd heye ku bi dirêjahiya dîrokê dane û ji bo wê armancê ji aliyê neyaran ve rastî azar, eşkence û tevayî tund û tîjîyan hatîne. Lewra Zimanê honandina wî di qonaxa dûyem ya helbestên wî de gelek ji zimanê qonaxa yekem cûdaye. Nirx û girîngiya wê helbestê di wê yekê de ye ku komeke raman û mebestên girîng xuya dike ku ew jî şiyar û ezmûna helbestvan diyar dike. Bi peyv û derbirînên xwe li dijî wan kesan radiweste ku dixwazin lîstikan bi nirx û girîngiyên neteweya wî bikin.

Yek ji taybetmendiyan wê helbestê ewe ku bi zimanek sade û hêsan hatiye derbirîn daku her kes jê têbigihe. Weke helbestên wî yên qonaxa yekem hewarê (pena) ji bo ti hêma û nîşanekê nebiriye ku dibin çeper dîtî û nêrînên xwe de derbibire. Ji ber ku Teyyib Cebbar hem bawerî bi xebata neteweyî hebûye û hem jî bawerî bi xebata mirov dostî û cîhanbîniyê hebûye. Belê raste helbestên qonaxa dûwem bi taybetî jî yên dawiyê bêhna nerazîbûn û gazindan jê tê li hemberî desthilat û partiên siyasî. Lê tevî wê yekê jî ew nayê wê wateyê ku

helbestvan canê netewayetî û hesta nîştîmanperweriyê lawaz bibe, lê berûvajî wê yekê tevayî wan gazindên ku ji desthilat û partiên siyasî dike, tenê ji bo handana wan bûye ji bo rû birû bûna gendeliyê û xizmetkirneke zêdetir bi neteweya xwe re, bi tevî wê yekê jî di piraniya helbestên wî de pêşberî bêhêvîbûn û reşbîniyê li neteweya xwe digire û hêzeke zêdetir pêre dide û morala wan ber bi asta çêbûna canê serxwebûna Kurd ve bilind dike.

Wate, Teyyib Cebbar hertim serederiya serfiraziya temam a xwe kiriye û ti tistek bi wê serbestiyê neguhertiye û bi rewşeke diyarkirî re najî û xapandinê red dike. Bi vî awayî ji aliyê teknîkî û zimanê nivîsandinê ve hertim di guhertinan de ye û peyrewa tu rêbaz û qalibeke siyasî û wêjeyî nekiriye û baweriyek temam bi serbestiya hunerî hebûye.

## **2.2. Helbestên Mirovatiyê (Humanîstî)**

Ew helbestin ku berjeng (sifet) û taybetmendiyan bi giştî girêdayî mirovane û her mirovekê asayî xwe têde dibîne û ti taybetmendiyeke neteweyî yan jî kesî têde nine. Lê ji bo her kesekî dikare eger li her cihekî be, di her serdemekê de be û ser bi her civakê be. Yan gelek caran mijareke giştîye û behsa jiyana dostaniyê, bi hev re jiyane, muhbet û cîhanbîniya mirovan dike bê cûdahiya nijad, ol û şêwe. Lewra ew helbest weke mijarek zîndî ya nava civaka mirovantiyê ji aliyê helbestvanên neteweyên cûda ve tînin û girîngî pê hatiye dayîn. Ji ber ku dîtina wan ji bo her mirovekê wekheve. Ew jî ji mirovatîbûnê pêkhatiye. Wate, ew corê helbestan hewl ji bo cûdakirina mirovan nade û bi yek çavî li her kesekî dinêre. Lewra Teyyib Cebbar di wê baweriyê de ye "Helbestên Mirovatî ew helbestin ku ji bo her mirov û gelekî dibe û ti taybetmendiyeke neteweyî yan jî kesî têde nine. Lewra ji bo wergerandinê jî gelek guncawe. Her kes û neteweyek tamê jê digire û xwe têde dibîne bi mercek helbestê asteke hunerî ya bilind hebe." (Teyyib, Hevdîtin, Silêmanî, 25. 2.2017).

Wate, helbesta mirovatî peywendiyê giyaniye û tevayî mirovan di xaleke hevbeş de bi hev ve girêdide. Lewra helbestvanê şareza û xwedî karîni li gorî şêwaza xwe hewl ji bo dîtina wan peywendiyên giyanî dide û di helbestên

xwe de desteber dike. Ji ber ku rol, bandor û soza helbestvan roleke girîng di bi hev ve girêdanê û tevlihevkirina soz û hizrên mirovan bi her ve de dilehîze. Wate, Em dikarin bêjin ku erka helbestê tenê dîtina wan tiştên sade û berçav nîne ku Mirovan bi hev ve girêdide. Lê divê hewla dîtina peywendiyên veşartî jî bide. Lewra helbestvanê xwedî karîn bi giştî di hewla dîtina wan peywendiyên de ye daku bikare bi rêya honandinê derbibire û pêşve bibe ji bo zêdetir aşnakirina mirovan bi hev dû. Lewra dibînîn helbestvanên Kurd jî ji mêj ve hest bi hebûna wan peywendiyên veşartî kiriye û di vî warî de jî, hêjmareke helbest, sîrod û berhemên ciwan berhem aniyê ku her kes hêvî û xwestekên xwe têde dibîne û di asta berhemên cîhanî de tene dîtin. Wate, helbestvan mil bi milê wan mebestên honandinê ku ji bo xak û neteweya xwe gotine helbestên Mirovatî jî weke Mebesteke zîndî paşguh nexistiye û tevî guhertin û pêşveçûna qonaxan pîte bi wan re jî hatiye dayîn. Ewa ku dive behsa wê bikîn ewe ku ew corê helbestê zêdetir ji bo wergerandinê digunce. Ji ber ku bi Zimaneke hevbeş di navbera Mirovan de dipeyve daku tevayî civaka Mirovantiyê tamê jê bigire û bi beşek ji hest û hizra xwe bizanin.

Lewra Teyyib Cebbar jî mil bi milê mebestên xwe yên din yên honandinê re girîngiyeke mezin bi helbestên mirovantiyê re jî daye û rûbereke fireh di nava dîwanên wî yên helbestan de girtiye. Bi taybetî dîwana dûwem û sêyem beşeke herî mezin a helbestên wan mirovîn e. û beşeke mezin ya helbestên wî ji bo ser zimanên Erebi, Îngîlîzî û Farsî hatine wergerandin û gelek lêkolîn û nixandin li ser hatîne kirin. Ji ber ku piraniya helbestên wî bêhna azar, nexweşî û hêvî û xwestekên tevayî mirovên asayî jê tê. Lewra dema ku helbestên wî yên mirovatî dixwînin wiha hest dikin ku ji tevayî mirovantiyê re nivîsandiye ne tenê ji bo netewe û gelek diyarkirî. Ji ber ku xeyala honandinê li cem helbestvan ewqas bihêze ku tevayî sînorên xwezayî û destçêkirî têk dişkîne. Ji bo gihandina peyama mirovantiyê, wate peyama helbestvan li sînorê civakek diyarkirî namîne, gelek bi lez bala xwe bi ser tevayî civakên din de dikişîne ji bo hevbeşî pêkîrin û bi hev re jiyane di civaka mirovayetiye de û hilgirtina hemû azar û nexweşiyên mirovan li her derekê be. Helbestvan di helbesta (Sîrudî Diwaroj) de dibêje:

“Rojê dadê,

Min debim be kolekey to,

To debî be koley min.

Dest le naw dest,

bêtirs le kes.

Hemîşe berew dilî xor

Dûr le xem.. Dûr le ajawe.

Dûr le firu fêll û diro

Tiwêşeman xoşyekî zor

Bebê nahez.. Bebê dujmin

Hemû pêkewe.. Wek bira.

Wek yek xêzan

Ejîn le sayey yek çira" (Teyib, 2008: 64-66).

Yan di helbesta (Her Wa Buwe) de dibêje:

“Her wa buwe,

Roj le şew..

Napirsêtewe: Bo hatî

Şewîş le roj..

Napirsêtewe: bo royîştî?

Her wa bûwe,

Hawyeymanêtî ...

Dirzî tê dekwê,

yekangîrî nayetedî. " ( Teiyb, 2011, s. 50).

Em helbest di sala 2010'an de hatiye nivîsandin û di sala 2012'an de ji bo zimanê Erebi hatiye wergerandin. Ew helbest di sînorekê diyarkirî de nemaye û behsa ti civakeke diyarkirî nake lê li ser bingeha gûftûgoyan hatiye dariştin. Yan di helbestan (Lewaneye) de dibêje:

"Ewetanê,

Baweşên..

Daway ba deka.

Agir bo germay..

Degerê.

Aw wêlî hajeye.

Dastan sêberî..

Dest nakewê.

Ewetanê,

Gerdelûl..

Le milbadan detirsê.

Ziryan sergerdane.

Nazanê bo kiwê deçê. " ( Teiyb, 2011, s. 50-51)

### 2.3. Helbestên Felsefî

Felsefe kevintirîn curê hişyariya civakiye lê nêrîn, lêkolîn û hizirkirneke kûre û têkşikandina cîhana xwezayî û derdorane di xeyal û hizra mirovan de ew rengvedan jî li gorî hemû çax û qonaxên jiyane tê guhertin. Ji ber ku "em di jiyana xwe de rastî hinek pirsgerêk û arîşeyan dibin.. Ew pirsgerêk jî daxwaza bersivan ji me dikin.. Bersiva wan jî derûniye di qonaxeke di de bê pirsyareke din û bi wê yekê pirsgerêk û bersiv dirêj dibin.. Wate, felsefe û dîroka felsefê pêkhatîne ji bersivên cûda û bi hev re girêdayî û li pey hev hatina hinek pirsgerêkan. " (Hemîd, 2005, s. 31) .

Wate, dîtin û nêrîna felsefê ji mêj ve di nava tevayî cîhana mirovatiyê de girîngiya xwe hebûye. Lewra di nava berhemên honandî yê helbestvan de jî rengvedaye. Weke eşkereye ew dîtin û nêrîna felsefîk di helbest û berhemên helbestvanên neteweya me de jî rayên xwe daxistine xwarê û her ji Babe Tahîrê Hemedanî ve ku berhemên wî bi şêwezarê Lorî hatine nivîsandin ta digihe cem helbestvanên weke Melayê Cizîrî û Ehmedî Xanî li şêwezarê Kurmanciya Serî, piştî helbestvanên weke Hemî, Mehî û helbestvanên din li şêwezarê Kurmanciya Jêrîn ew hest û hizra felsefîk bi zelalî tê dîtin, girîngî û ciheke diyar di berhemên wan de gitiye. Lewra li cem helbestvanên nû û hevçax jî ew hest û hizra felsefîk bi bûyeran û pêşveçûnên qonaxên civaka mirovatiyê re pêşveçûn bi xwe ve dîtiye û gavên baş avêtine. Ji ber ku felsefe pêkhatiye ji. "(wan çalakî û hewlên ku mirov dide ji bo têgihîştina xwezatiya gerdûnê û hundirî xwe û peywendiya di navbera wan dû aliyên bingehîn di taqîkirinên me de" (Hemîd, 2005, s. 33).

Bi vê dîtin û nêrînê em digihin wê encamê ku dîtin û nêrîna felsefîk ji wan çalakî û hewlan pêktê ku mirov ji bo bidestxistina zanyarî û bersivên pêwîst ji bo wan pirsyanan dide ku peywendiya wan bi çarenvîsa tevayî civaka mirovatiyê ve heye ku mirov bi dirêjahiya dîrokê lêdigere. Lewra helbestvan jî zêdetir çûne nava hundirê xwe û bîr li dîtin û nêrîna felsefîk û hestên derûnî yê mirovan kiriye û hewl dane li gorî karî û şarezayiya xwe di helbestên xwe yê felsefîk de

desteber bikin. Wiha, eger bi lez li helbestên helbestvan Teyyib Cebbar jî binêrin weke helbestvanek ê vê çaxa me ya niha dibînîn beşeke herî mezin a helbestên wî dîtî û nêrîna felsefîk li xwe girtiye û bi awayeke felsefîk behsa jiyana, mirin, xweza, gerdûn û derdoran ji me re dike. Bi vî awayî bi tenê ew bikare wan dîtî û nêrînan felsefîk derbibire. Her weke di helbesta (Ew Rojey Min Demrim) de dibêje:

"Ew rojey min demirim,

Goy zewî dewestê.

Nasurê.

Roj berdewam debê,

Beyanî, Nîwero, Êware,

Wek yek çeşin debê.

Şew.. Wurde wirde xoy depêçêtewe.

Detorê" (Teyyib, Ew Rojey Min Demrim, 2010, s. 14-15) .

Diyare mirina helbestvan mirineke asayî nîne lê mirina her tiştek xwezayî û gerdûne. Ew mirina ku ji mêj ve weke sihekê cem mirovane û bûye çarenivîsa tevayî mirovan û bûye behsek û mijareke germ di navbera filozofan de. Ji ber ku tenê nekarîne ji wateya mirinê û sedemên wê tê bigihin. Helbestvan Teyyib Cebbar jî bi awayeke felsefîk behsa tevayî aliyên jiyane û awayê mirina xwe ji me re dike. Ew helbest yek ji wan helbestên wî ye ku zêdetirîn lêkolîn, nirxandin û xwendin ji aliyê nivîskar û rexnegiran ve lê hatiye kirin. Zûhêr Cibûrî di vî warî de dibêje: "Helbestvan di malika yekem ya helbesta xwe de rewşa mirina xwe ji me re vedibêje bi sistemeke gerdûnî.

Wate sistemek ku nayête têkşikandin tenê bi xeyala helbestvan nebe, ji ber ku mirina helbestvan mirineke cîhaniye û goka rojê gêr dibe li ser erdê. Heyv jî pûç dibe û stêrk jî diweşin... û hwkd" (Zûhêr, 2010, s. 11). "Belê Teyyib Cebbar her ji

destpêka helbesta xwe ve me rû bi rûyê alozîkirin û dem bi serveçûna tiştan dike û balê dikişîne li ser têkçûna her tişteke ku heye û nîne û dibêje: Be mirdinî paşay êrişî ser zemîn ke (min) min goranêkî rîşeyî çî le jîyan û çî le tewawî dinya tenanet le gerdûnîş rûdedat we hemû şîtêk le regewe goranî be serda têt. " (Hisên, Xwêndnewey Şî'rî Ew Rojey Min Demrimî Teyib Cebbar, 2016, s. 9).

Yan jî di beşeke din a helbestê de dibêje:

"Ew rojey min demirim,

Xol û ba, agir û aw,

Seryan lê têk deçê.

Şepirze, diwacar ko debinewe,

Sebaret be şêwey naştinim,

Çend biryarêk deden:

1- Pêwîste.

Tabutekey le textey mang bê .

2- Pêwîste..

kifinî bo biçinin le pirçî kiçê.

3-Pêwîste..

Beşîley wişe bişonewe.

4-Pêwîste..

Berdî el-hedekey..

Parçeyek pelke zêrîne bê" (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 9-10)  
Helbestvan bi vî awayî li ser derbirîna hizra felsefîk berdewam dibe û behsa amrazên sereke yên jîyanê ji me re dike ku ji (ax, ba, agir û avê) pêkhatine û bi



awayeke wiha behsa wan amrazan dike ku di roja mirina helbestvan de wê amade bin. Ji bo mebestek berûvajî, amadekirin û spartine axê (şayê erşî) ku eger tenê di xeyal û hizra felsefîk a helbestvan de hebe. Ji ber ku li cem helbestvan bûyerek sade nîne bi awayeke asayî bi ser re derbas bibe. Lewra li cem helbestvan mirin ew karesateye ku bi ser cîhana mirovayetiye de tê û mirov ji rewşa hebûnê ber bi rewşa nebûnê ve dibe. Ew tevî ku dixwaze bi awayeke felsefîk behsa jiyana û xweşiyên jiyana ji me re bike daku mirov biha û nixên jiyana bizane, beriya ku ber bi cîhana dawiyê ve biçê. Lewra her ku diçe helbestvan rewşa mirina xwe ber bi mezinbûnê ve dibe daku hest bi tama jiyana û xweşiyên wê bike ta wê dema em dimirîna girêk û şeraba taliyê bi me vedixwe û ji wê demê ve ta jiyana bi dawî tê û tevayî karên temam nekirî yê helbestvan weke her kesekê asayî di cih de dimînin. Ji ber ku mirov bi dirêjahiya qonaxên jiyana mirovayetiye li pey sedemên nemirîna geryaye lê nekariye serkeftinê bidestbixê û di encamê de xwe jî ji dest daye.

We yan di helbesta (Min Pêma Witî) de dibêje:

Min pêma witî,

Ew şaxe..

Betarîkî birîndarbûwe.

Nawçeke,

Xwênî reşî leber derwa.

Baştir waye,

Betozî gizing û ..

Lîkî estêre,

Tîmarî bikey .

Min pêma witî,

Ew direxte nanwê,

Tay lêhatûwe,

Dû eyare,

Şine û şewnimî..

Bo bigirewe.

Lewe ziyatir,

Bîmarî nekey. ( Teiyb, 2011, s. 81-82).

Eşkereye, helbestvan di vê helbestê de peyv û derbirînan bi awayeke wiha rêkdixe ku peywendî bi bîrkin û asta rewşenbîriya felsefîk ya wî ve heye. Ji ber ku helbestvan hewl daye diyardeyên xwezayî weke çavkaniyeke girîng di mebestên xwe yê honandinê de bikarbîne. Ji ber ku xwezayî û diyardeyên wê bandorên mezin li ser hizir, hest, soz û jiyana helbestvan hebûye û wêneyên gelek balkêş jê çêkiye, bi corek wiha bi wê rêyê bikare peyama xwe bi bigihîne nifşên neteweya xwe bi awayeke felsefîk daku nifşên neteweya wî bi awayekeê korane gavên xwe navêjn lê agahiya wan ji xwe û derdora xwe hebe. Helbestvan bi tevî behskirina diyardeyên xwezayî, her weha bi awayekeê felsefîk hêjmareke mezin a peyv, gotin, behs û çandên neteweya xwe wergirtiye û di helbestên xwe de bikaraniye. Ew jî yeke ji hewlên din yê helbestvan û xwestiye şopên tiliyên xwe di vî warî de bi nexşîne. Ew jî wê wateyê digihîne ku helbestvan mil bi milê mebestên xwe yê honandinê ber bi şîrovekirina hizra felsefîk ve çûye û bi awayeke felsefîk bi rêya alav û keresteyên din ên xwezayî çareserî ji pirsgerêkên xwezayî re dîtiye.

Lewra dibînîn ew xeyala felsefîk ku li cem helbestvan tê dîtin, her bi tenê helbestvan bi xwe dikare bigûncîne, rêkbixe û can pê bide. Ji ber ku bi xeyal, bîrkin û felsefesa helbestvan çiya bi tariyê birîndar dibe û xwîn jê tê, eger na di xeyala ti miroveke asayî de nîne. Ew jî bi tevî ku helbestvan her bi qûtkirina çiya

ranaweste û nahêle bi vî rengî bibirîndarî bimîne lê çareseriyêke gûncaw jê re dibîne û bi toza tîrêj û gilîsa stêrkan derman dike.

Piştî helbestvan behsa xwe bi dawî nayîne, berdewam dibe, nerazan û nexweş ketina darê û germbûna pileyên germahiya laşê darê bi dû eyarên şiliya xûnava şevê çareser dike û bi vî curî dibînîn helbestvan zêdetir diçe nava hizra felsefîk ya xwe. Ji ber ku helbestvan bi tevî ku behsa nexweşî, jan û diyardeyên xwezayî dike, bi vî awayî dest jê bernade di nava jan û eşkenceyan de bimîne lê rasterast çareseriyê pêwîst jêre dibîne. Ji berku eger helbestvan li pey çareseriyên negeraba wê demê wê derd û karesat zêdetir bibana û helbest jî bi vî ciwanya niha nedihat dîtîn. Lewra helbestvan bi awayêke zîrekane şiyana xwe ya honandinê di vî warî de bikaraniye û çareseriyê pirsgirêkan ji kesên din re bicih nehêlaye. Lê bi xwe behsa pirsgirêk, diyarde û çareseriyên jî dike. Wate, helbestvan ji bo her janekê dermanê pêwîst daniye. Dibînî helbestvan li vir jî ranaweste lê berdewam dibe û dibêje:

Min pêm witî

Ew rêgaye kurtî hêna,

Be xelkî awayî bilê

Bedengiyewe biçin?

Natwanê,

Bigate naw Dê. ( Teiyb, 2011, s. 83).

Helbestvan di vî malikê de dixwaze wê yekê ji me re bêje ku em weke mirov dikarin bi hev re kontrola pirsgirêkan bikin û bigihîn bi hêvî û xwestekên xwe. Her çiqas asteng û kelem jî bêne pêşiya me û hinek caran jî rêya me kurtiyê bîne lê di dawiyê de wê her bigihîn encamê. Wate, dibînîn bîr û xeyala felsefîk li cem helbestvan tevayî sînoran derbas kiriye. Lewra dikare bê gotin wêne û hizrên felsefîk ên helbestvan weke birûsk û çirûskan di nava diyardeyan de çûye xwarê, wêne, peyv, komeke wateyên xurt û aloz li xwe digire. Lewra têgihîştin û

xwendina wate û mebestên felsefîk ên helbestvan pêwîstî bi lêkolîn û xwe westandineke mezin heye. Ji ber ku mebestên felsefîk ên helbestên wî wiha sade û hêsan nîne ku her kes jê tê bigihe lê mebesta felsefîk li cem helbestvan wate û mebesteke kûr li xwe digire û bi hêsanî xwe ji dest nadin. Ji ber ku helbestvan erk û kareke nû dide bi peyvan daku xwendevan û lêkolîner di dema xwendin û nirxandina helbestên wî yê felsefîk de ji hinel aliyan ve bigihin wate û bersivên pêwîst, raste ew peyvên ku helbestvan bikaraniyê ji aliyê şêwe û form ve heman ew peyvin ku civak di gûftûgoyên asayî de bikartîne lê helbestvan mebest û wateyeke nû pê daye. Ji ber ku li cem helbestvan raste hilibijartina peyv û wateyên ciwan ji bo helbestan girîng e û aliyek ê ciwankariya helbestê ye lê erkdana bi peyvan ewqas mebest, wate û şêweyê helbestê ciwantir dike. Ji ber ku helbestvan piraniya helbestên xwe tenê taybet nekirine bi tebeqe û çînen civakeke diyarkirî lê helbestvan helbest ji bo tevayiya xelkê honandiye. Lewra her yek li gorî têgihîştin û asta rewşenbîriya xwe ji wateyên felsefîk ên helbestên wî têdigihe. Ew jî aliyeke ji aliyên taybet û zîndî yê helbestên helbestvanî ku helbestvan ji helbestvanên qonaxa wî cûda dike.

Ji aliyeke din ve dibînîn di vê helbestê de helbestvan erk û karê diyardeyên xwezayî hildiweşîne û bi awayeke din dadirêje, erk, kar û wateyên din pê dide ku gelek ji wate, erk û karê ferhenga wan peyvan cûdaye ku çawan helbestvan weke her keresteyeke din yê asayî serederiyê ligel diyardeyên xwezayî dike ku çawan serederiyên cûda bi kereste û tiştên asayî yê di nava civakê de tê kirin. Bi heman şêweyî serederî û reftarê bi diyardeyên xwezayî re jî dike, erk û karên nû pê dide. Ew kar jî eger tenê di hizra felsefîk a helbestvan de hebin. Ji ber ku sîstem û pergala gerdûnê (xwezayî) sîstemeke Xûdayî rêkxistiye û bi ti fakterekî têk naçe. Lê xeyal û hizra felsefîk a helbestvan têk dişkîne û ji nû ve dadirêje. Yan jî di helbesta (Dîsan Şew Hat) de dibêje:

Dîsan şew hat, bo naley min.

Gir ber dira...

Le şare zerdewalley min.

Ne dîwar henase deda,

Ne dergaye dediwê.

Ne pencere rûm têdeka,

Ne sazê de dengê.

Ne tarmayî yarê..

Serim lêdeda,

Ne kesêk dê.

Oqire nagirê..

Em rûhe rût û recaley min!!

To bilêy lem dûnyaye..

Kesêk hatibê..

Ser derbika,

Le hegbey wîrdewaley min?! (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 95-96)

Eşkereye hatina şevê bi wateya bêhnvedan, vehewîn û derxistina westiyânê tê ji bo mirovan û tevayî candarên esmanî, bejayî û her wiha dûbare amadekarî û pîlan dariştine ji bo jiyana roja bê. Lê di felsefeya jiyana helbestvan de hatina şevê bi wateya hatina karesat û naxweşiyên tê jbo helbestvan. Ji ber ku tevayî jan û naxweşiyên di şevê de rastî helbestvan tên, xeyal, hizir, dîtîna û nêrînên helbestvan zêdetir aloz dibin û wî bêzar dikin û canê wî eşkençe didin. Nahêlin tenê ji bo demeke kêr jî canê helbestvan aram bibe. Lewra bi dîtîna helbestvan hatina şevê bitemamî qediyane ji jiyana derdor û dûrketîna ji xwezatiyê. Ji ber ku helbestvan di şevê de li jora xwe tenê dimîne û ti tiştêk nîne ku gûftûgoyan ligel bike û jana dilê xwe jêre bêje û bexteweriyê pê bide. Ji ber ku xeyal û hizirkirîna wî ewqas gelekîna ku her helbestvan bi xwe dikare li hemberî

wan li berxwe bide û ti kesek din ji xeyal û bîrkirina wî tê nagihe. Lewra helbestvan bi berdewamî xewn bi wan hêviyan ve dibîne ku di şevê a jiyê xwe de kesek bê, jê têbigêhe û serederiyê ligel dîtî û xeyalên wî yên aloz bike, weke dibêjê :

To bilî lem dunyaye..

Kesêk hebê..

Ser derbika,

le hegbe y wirde waley min?! (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 96).

Piştê helbestvan li ser gûftûgokirina ligel xwe berdewam dibe û dibêje:

Katê hezî xewtinim demirê ,

Demewê dest bikem..

Be nermkirdinî aw.

Lewlawe kelkeley..

Awsanî berd,

siwarî serim debê.

Ew satey..

Teteley tirîfe dekem,

Kitupir..

Hezî şorînewey ba,

yexem degirê.

Ew wextey xerîkî..

Pînekirdinî asmanim,

Cilewî espî girkan,

le destim berdebê.

Ew katey serqalî..

Dirûnî cilûbergî xewnim ,

Zewqî daw nanewe..

Bo gizing,

le dest û pencem dealê . (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 96-98).

Wate, helbestvan dixwaze behsa wê yekê ji me re bike ku xeyal û hizirkirina wî ewqas alozin ku bi temamî helbestvan şepirze û perîşan kiriye û rewşa derûnî ya wî aloz kiriye û nahêlin tenê ji bo demeke kêr jî aram be. Ji ber ku di wan deman de xwesteka helbestvan ji bo razanê dimire nikare razê û dixwaze karekî encam bide. Ji nişkan ve xeyal û hizirkirina encamdana kareke din stûyê wî digire û nahêle karê xwe yê berê temam bike. Ew rewş wiha li helbestvan dike bi temamî ji jiyane bêhêvî bibe û di dawiyê de vedigere Xûda û hewarê (pena) ji bo dibe û dûayan jê dike. Daxwazê jê dike bi ser nexweşî û nehametiyên xwe de serbikeve û ji wan hizir û nêrînên aloz yê bêzarker rizgar bibe daku ew jî weke her miroveke asayî hest bi xweşiyên şevê bike û bi asudeyî (aramî) û bextewerî şeva xwe derbas bike. Weke dibêje:

Xudaye..

Bezmî bêser û hewday min,

key tewaw debê?

Xudaye..

Dîsa şew hat bo halî min .

Firyam kewe..

Agirbarane le malî min..

Xudaye..

Çi şitê dadim deda?

To bilêy dasakê..

Ruhî herasan û lalî min? (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 101-102).

Diyare ew jî xwezatiya her mirovekê asayî ye ku piştî di karên xwe de serkeftî nabe û nikare rastî naxweşiyên jiyânê bê û nikare çareseriya pirsgerêkên xwe bike. Di encamê de vegeza cem xwedayê xwe û bi tenê jêder dizane. Ji ber ku taqîkirina rojeva jiyana wî digihîne wê baweriyê ku ji bilî piştevanî, bawerbûna bi xwedayê xwe ti çareseriyêke din li hemberî xwe nabîne. Lewra li cem wî tenê tiştê ku bi kare parêzgeriyê lê bike û serbixê ew xwedaye ku pêkînerê hemû gerdûn û diyardeyên xwezayîye û dikare bi hewara wî ve jî bê.

#### **2.4. Helbestên Evîndariyê**

Ew curê helbestan di wêjeya tevayî gelên cîhanê de rûbereke fireh ji mebestên helbestan dagir kiriye. Helbestvan li gorî serdem û qonaxa pêşveçûna wêje û çanda xwe girîngî pê daye û di berhemên wan de rengvedaye. Bi wê baweriyê ku jiyana bê evîndarî ti ramanek nîne, vêca evîndariya ol, xak û nîştîman be yan jî evîndariya mirovan a ji bo hev be. Lewra helbestvanên Kurd jî weke piraniya helbestvanên gelên cîhanê ew mebesta helbestê paşguh nexistin. Weke mebesteke sereke di helbestên xwe de girîngî pê dane. Lewra dibînin ew corên helbestan li cem piraniya helbestvanên klasîkî destpê dike ta digihe helbestvanên nû û hevçax. Ji ber ku "peywendî bi hundir, hest û derûna mirovan ve heye, me gelek kêr helbestvan hene ku peyrewa wê mijarê nekiribin" (Letîf, 2009, s. 83).

Lewra helbestvanên me yên mezin ên klasîk girîngî û behayên taybet pê dane, her çiqas bi xwe jî neketibin nava tora evîndariyê. Neçar bûne bi ciwantirîn



şêwe helbestan ji bo evîndariyê binivîsînî û bi xemilînin da ku nixên helbestvaniyê têde lawaz nebin. Ji ber ku di wê çaxê de merc bû ku divê helbestvan li deriyên tevayî mebestên honandinê bixîne daku karînen xwe yê honandinê nîşan bide. Lewra her çiqas helbestvan hilgirên bîr, bawerî û bîrdoziya olî bûn, wate heskiriyên bîr û baweriya evîndariya rast bûn. Lê karîne bi rêya xwaze, ciwankarî û rewanbêjîyê helbestên xwe di rûpelên evîndariya mecazî de binexêmin, an jî berûvajî di eşq û evîndariya mecazî de serkeftî nebûne û piştîre pena ji bo evîndariya bi rastî (Îlahî) biriye. Bi wê hêviya ku di cîhana dawiyê de bi evîndarên xwe re bigihin, lewra ew mebest li gorî rewşa siyasî û civakî guhertin bi serde hatine. Ji ber ku erka helbesta evîndariyê "ji livandin û derbirîna hest û soza xweyî û derunî ya helbestvan di helbestan de pêktê. Ji bo mebesta derbirîn û nîşandana wefa û muhbeta helbestvan li hemberî hinek kesan ku ezîz û nêzîkî helbestvan in (heval, xizim, kes, dost, yar û hwkd.) yan ji bo bîranîn û boneyekê. Vêca ew bîranîn û bone renga xweş an jî nexweş bin ku bandor û şopên xwe li ser dilê helbestvan cihekê taybet heye" (Nesrîn, 2010, s. 180-181).

Wate, em dikarin bêjin merc nîne helbestên evîndariyê tenê taybet bin bi jinan. Lewra helbestvanên Kurd hest bi cûdahiya helbesta evîndariyê kiriye û me hin mînakên zîndî di vî warî de di wêjeya Kurdî de hene ku rol û bandoriyên mezin di nava helbestên evîndariyê de lîstine. Yan jî gelek caran helbestvanan li gorî xwestek, daxwaz û şarezaiya xwe behsa jinê kiriye. Piraniya endamên wê bi tiştên derdoran şibandîye. Weke şibandina çav bi heyvê û bireh bi hîlalê, rûmet bi rojê, mîjelank bi tîr û hwkd. Piştîre ew rol û girîngîdana bi jinê û evîndariya ji bo cem helbestvanên nûxwaz weke Goran, Şêx Nûrî û helbestvanên din guhertin biserde hatine. Tê dîtin ku wesf û pêda gotineke ciwan û romantîk di helbestên evîndariyê de hene. Ji bo mînak Goran di helbesta (Bo Kîçêkî Bêgane) de dibêje:

“Zor qijî zerd serincî rakêşawim, Zor çawî şîn dawîye pirişnig le çawim,  
Şan û mil û gerdenî rûtî bêgerd, Singî nerm û memkî qutî tund wek berd,  
Bejin û balay kelleget û şox û şeng, Le şularî kemêk goştin, kemer tent,

Pêstî spî be xwênî geş meylew al, Kulmî qellew, çenagey nawerast çall," ( Bilawgey, 2005, s. 46) .

Em dibînin her helbestvanek li gorî têgihiştin û şarezayîya xwe hewl daye xwe nêzîkî helbestên evîndaryê bike û ciwantirîn helbestên evîndariyê ji evîndara xwe re binivîsîne. Helbestvan Teyyib Cebbar jî weke piraniya helbestvanên din ên nava wêjeya Kurdî ew alî paşguh nekirine. Di vî warî de hêjmareke helbestên evîndariyê nivîsandine tevî ku ew curê helbestê bi beramberkirina bi tevî mebestên din yên wî yên honandinê gelek kêmin. Lê tevî wê yekê jî kariye wê hest û soza evîndariya ku di hundirî wî de hebûye derbibire û hêjmareke helbestên evîndariyê li ser ava bike. Eger hindekî bi zelaltir behsa kêmiya wê mebesta honandinê li cem helbestvan bikîn renga ji ber wê yekê be ku helbestvan di ti qonaxên jiyê xwe de evîndarê ti jinek nebûye ku bibe îlhamek ji bo çavkaniyên helbestên wî ku çawan gelek caran ew îlham li cem piraniya helbestvanên din hatiye dîtin. Weke helbestvan dibêje: "Ez di ti qonaxên jiyana xwe de evîndar nebûme, mebesta min ji evîndariya jinê ye. Ji ber ku di wan serdeman de hizra min bi berdewamî li cem xem, kovan, azar û nehametiyên gel û nîştîmanê min bû. Bi berdewamî min bîr li rizgarkirin û serkeftina gelê xwe dikir. Renga ew jî sedemek be ku ewqas hizra evîndariya jinê nekim. Ji ber ku di wê çaxê de evîndariya xak û niştîman li cem min ji her tiştêkî din pîroztir bû"(Teyyib, Hevdîtin, Silêmanî, 10.12.2016).

Wate, helbestvan bi qasî ku evîndarê xak û neteweya xwe bûye ewqas evîndarê sozdariyê û evîndariya jinê nebûye. Lê tevî wê yekê jî dibînin ji destpêka hatina wî ji bo nava cîhana wêjeyê weke piraniya helbestvanên berî xwe û serdema xwe bi helbestên evîndariyê destpê kiriye û yekem helbesta xwe di sala 1969'an de nivîsandiye. Tevî ku helbestvan di wî corê helbestê de jî afirêner bûye û berûvajî helbestvanên din bi corekî cûdatir ji wan helbestên evîndariyê honandine. Ji ber ku piraniya helbestvanan di helbestên xwe de behsa bêwefayî û awir nedana yarên xwe dikin ku çawan ji dûriya yarên xwe dişewitin. Weke qanê helbestvan berê xwe dide yara xwe û dibêje:

Dîdem newnemam, Dîdem newnemam

Dîde rastekem, Bala newnemam.

Boçî napirsî, le halî xullam

Heta qiyamet, min her betemam" ( Birhan, 1974, s. 196).

Lê Teyyib Cebbar bi coreke din behsa wê jinê dike ku çawan evîndar û şeydayê wê bûye lê helbestvan amade nîne tu awirekê lê bide û girîngiyê pê bide. Weke dibêje:

"Min Erom ew herdê le şiwênim

Her çend hewl eda naydiwênim. " (Teyib, Hevdîtin, Silêmanî, 5.12.2016).

Wate helbestvan li vir behsa bê wefayiya xwe ji me re dike li hemberî wê jina ku evîndarê wê bûye tevî wê yekê jî dixwaze wê yekê jî ji me re bêje ku merc nîne hertim zilam evîndarê jinê be û daxwaza evîndariyê jê bike. Weke di piraniya civakan de heye lê berûvajî wê yekê jin evîndarê zalam dibe û daxwaza evîndariyê jê dike. Wate, helbestvan li vir jî afirêner bûye û berûvajî helbestvanên din kariye ciwantirîn helbestên evîndariyê binivîsîne û bi zelalî berisva wê afretê bide ku yekalî evîndarê wî bûye. Lê ewa ku cihê mixabiniyê ye ew helbest weke piraniya berhemên din bi sedema rewşa siyasî rastî ji navçûnê bûne û tenê ev rêz ji navçûnê rizgar bûye.

Teyyib Cebbar li sînore xeyala xwe peykerekê wesifkirî tîne berçavên xwe û can pê dibexşe daku hizra xwe ya fireh di wê evîndariyê de bike. Lewra Îbn Erebî

dibêje: "Jin wêneyê derûne û zilam jî desteberê canî ye" (Letîf, 2009, s. 96). Bi vî curî helbestvan kariye wêneyekê xeyalî bikişîne û li ber yara xwe bike, xwestek û xwesta xwe diyar bike weke di helbesta (Binu.. Ey Yar) de bi evîna xwe re dipeyve û dibêje:

"Binû.. Ey yar, yarî nazdar

Binû.. Bê xem,

Bê agale halim.. Ey yar,

Min demewê..

Cîhanêkit bo rayelkem

Le (espay)

Min nazanim..

To hez le çi xakêk dekey?!

Deştî berz?!

Herdey nizim?!

Ya Şaxî text?! " (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 79-80) .

Helbestvan dixwaze bi vî rengî behsa evîndariya xwe û yara xwe ji me re bike ku dixwaze cîhaneke evîndariya xeyalî ya wiha jêre çêbike ku ji cîhana asayî cûda be, da ku dilê yara xwe aram bike û bextewer be. Ya balkêş ewe ku helbestvan hêjmareke peyv û hevokan bikaraniye ku tenê ji aliyê tu helbestvaneke din ve nehatine bikaranîn û kêr wêne ne. Weke ku di helbesta (Mero.. Ey gul) de dibêje:

"Mero.. Ey gul.. Mero

Baxçe kiz,

Gelaw gull sîs debin

Liq û pop le ruxwar.

Le halî min deçin

kolan pêç dexwa.

Mal tarîk

Henasem berzu nizim deke" ( Teiyb, 2011, s. 117-118) .

Helbestvan di wê helbestê de hêvî û daxwazê ji yara xwe dike ku wî bicih nehêle. Ji ber ku bi dîtina wî her çi karesat û naxweşî hebe wê rastî wî bîn û wê rastî malwêraniyê bibe, heta ne bi xwe lê her çi gulên di nava baxê wî de jî hene wê qûrmiçin û melûl bibin û hest bi wê dûrketinê dikin piştire berdewam dibe û dibêje, bi çûyîna te her çi kolan û taxin wê werin ba hev û ji bilî tu rêyên derketinê ji bo tu kesekê din namînin ku pêde biçê.

Piştire helbestvan dixwaze wesfa wê jinê ji me re bike ku hes jê dike ku cûdaye û weke jinek asayî nine. Lewra dibînîn ew xeyal firehiya ku li cem helbestvan ji jinê re heye li cem ti helbestvaneke din nehatiye dîtin. Weke di helbesta (Min Dil Dedem) de dibêje:

"Min dil dedem,

Be afretê,

Bernamey hebêt..

Bo guş îni tirîfew..

Helxistinî goranî.

Îş bikat bo tiwanewey..

Aloşî tenyayî.

Sê jeme

Pêkewe gyan lêbinê.

Bizanê....

Awnig bişwatewew

Cirîwe bijarbika. " ( Teyib, 2015, s. 172).

Eşkereye ew xeyala li cem helbestvan heye eger ew bi xwe bi tenê karî can bi wî peykerî bide ku di şêweyê jinê de kişandiyê daku li hambêza wî ya germ aram bike, an jî di helbesta (Min Demewê) de dibêje:

" Min demewê,

Dûmemik hellxeletênim,

Şewan le gel xomda,

Biyay xewênim.

Bedem lay layewe..

Çîrokî xitukê pencew..

Tezuy lêwim,

Bo bigêrinewê" ( Teyib, 2015, s. 178-179) .

## BEŞA SÊYEM

### 3. Helbestvan û Nûvekirina Sîma

#### 3.1 Awaz û Mûzîka Honandinê

Diyare dîtina awaza derve yan jî hundirê helbestê qonax û karek gelek aloz û domdirêje û helbestvan di ezmûneke aloz û xûrt de, piştî ku karîn û şarezayê peyda dike dikare awaz û mûzîkek gûncaw ji bo derve û hundirê helbestên xwe bîne da ku bala xwendevanan bikişîne "eger helbest bê mûzîk be, bandora xwe li ser xwendevan nabe, ji ber ku mûzîk aliyeke girînge di helbestê de û nebûna wê helbestê lawaz dike" (Îbrahîm E. , 1973, s. 7)<sup>129</sup> Lewra ji mêj ve helbestvanan girîngî bi awaz û mûzîka helbestê dane û tekez li ser hebûna awaz û mûzîka di helbestê de kirine. Vêca çî awaz di asta derve de be yan jî di asta hundirîn de be girînge û hevenga xwarbûna bi aliyê her asteka (derve yan jî hundir) asta din a helbestê wê valetiya ku têde çêbe û ew soz û awaza ku divê di helbestê de hebe ji dest dide. Lewra hebûna awaza helbestê di asta derve û hundir de divê wekhev girîngî pê bê dayîn daku bala xwendevan bi aliyê xwe ve bikişîne û tamê jê bigire.

Dr. Şino Mihemed Mehmûd di vî warî de dibêje: " Gelek lêkoleran amaje bi rola pîvan û qafiyeyê li ser pêkanîna awaza derve ya helbestê dikin, awaza hundir a helbestê jî xwe di organîzekirin û li pey hev hatina peyv, zarave û hevokên di nava rêz û nîvrêzên helbestê de dibîne, yan di dûbarekirina peyv, zaravek û dengêkî yan jî hinek dangan de ku hinek caran dûbare dibin dibîne. Vêca ew deng bi tîpên dengdêr bin an jî tîpên bêdeng corek ji awaz û mûzîka xweş pêktînin ku şiyar, desthilat û şarezaiya helbestvan di wê afirandinê de nîşan dide. " (Şino, 2007, s. 164).

Lewra dibînin ku helbestvanên Kurd her ji rêbaza klasîkî ve heta rêbaza nû û hevçax girîngiyeke mezin bi pîvan û qafiyê dane ji bo pêkanîna awaz û mûzîka

derve ji bo helbestên xwe û di heman demê de jî hewarê ji bo dûbarebûna deng, peyv, zarave û hevokan biriye ji bo pêkanîna xweştirîn awaza hundir di helbestên xwe de da ku xwendevan an jî guhdar tamê jê werbigirin û ji çavê rexneyê dûr be. Her çiqas girîngêdan bi mûzîka hundir li cem helbestvanên hevçax û nû zêdetir hest pê tê kirin. Dema ku dest bi xwendina her parçeyek a helbestên wan dikin hest bi dûbarebûna deng, peyv û zaraveyan dikin ku tevî bûna xweştirîn awazê di hundirê helbestê de xwendevan zêdetir bi xwe ve girê dide bi xwendina helbestên xwe. Ew jî wê yekê nagihîne ku helbestvanên kevin giringî bi awaza hundirîn nedabe. " Her ew peywendiya bi hêz ya di navbera awaz û helbestê de ye ku tevayî rexnegiran hevbîrin. Ji ber ku dîtîna û nêrîna wan li ser helbest û taybetiyên wê her çî be, encamên hemûyan di wê yekê de hev digrin ku awaz û helbest diyardeyeke dilkêş a wihaye ku can dide peyvan û ewqas wate û mebestan desteber dike" ( Se'îd F. Y., 2011, s. 103).

Wate, hebûna awaz û mîzîkê merc û amraza sereke ye di helbestê de û bi bê awazê zimanê helbestê çênabe û bi xala cûdakar a helbestê tê zanîn ku helbestê ji pexşan û axiftina asayî ya rojane ya xelkê cûda dike. Lewra awaz di helbestê de " bi çemka xwe modern û hevçax girîmaneyekê (hîpotez) di tiyoriyekrin û praktîzekrinê de, ji wê fezaya ku pêkhatiyê û peywendiyên bi hev re gûncaw di teksta helbestê de li xwe digire. Vêca çî li ser pêkhatiya derve be yan jî hundirîn, bihîstî be yan jî dîtîbe, hestpê kirî be yan jî hizrî be, ritim di helbest û mûzîkê de peywendiyêke diyalektî heye û girêdana wan ritima xwezayî, ritîma wîjdanî û hestiyarî ya mirov e... " (Adil, 2010, s. 15).

Rengê wiha hest bê kirin ku awaza derveyî û hundirîn gelek hêsan be û her helbestvanek dikare bikarbîne lê di rastiyê de wiha nîne û qonaxek pir aloz û pirsgirêk e. Her helbestvanek li gorî karîna û tama xwe ya hunerî dikare awaza helbesta xwe derbibire. Lewra " peyvên helbestê bi rêya awazê desteber dibin bi tevî ku her yek ji soz û fikar jî dû amrazên din yên helbestê ne" ( Se'îd F. Y., 2011, s. 103) .



Lewra helbestvan bi xwestek û vîna xwe bi peyvan re dilehîzin û ji bo bi destxistina awazeke balkêş di helbestên xwe de digûncînin. Ji ber ku awaza helbestê tişteke ecêb nîne ji bo helbestê lê rengvedana hest û soza helbestvane ku di hundirê helbesta wî de ye.

-Awazên Honandinê Di Helbestên Teyyib Cebbar De:

Ji bo lêkolînkirina hîmê awazên tekstên Teyyib Cebbar di destpêkê de wê ber bi hîmê awazên derveyî yên tekstên wî ve biçin ku ji pîvan û qafiyeyê pêktên û piştre jî wê behsa awazên hundirîn ji bo tekstên wî bikin:

### 3.1.1 Awazên Derveyî Yên Tekstan

**Pîvan (meter):** Her ji kevin ve helbestvanan pîvan di helbestên xwe de bikaranîne û weke yek ji bingehên sereke yên helbestê danîne. Lewra di şîrovekirin û lêkolînên helbestan de di hemû qonaxan de girîngiyêke taybet bi xwe hebûye. Ji ber ku pîvan û qafiye beşdariyê di çêkirina awaza derve ya helbestan de dikin û bi amrazên sereke ji bo pêkanîna awaza derve ya helbestê tînan danîn. Wate, pîvan " ji tevayî wan pêyan pêktê ku rêze helbestekê çêdikin ku di Eruza Erebi de Tefîliye jî jêre tê gotin" ( Ebdûlrezaq, 1992, s. 10). Wate, pîvan taybet nîne bi neteweyekê yan jî hinek neteweyên diyarkirî lê bi serhildana helbestê re pîvan jî hebûye, her gelek li gorî zimanê xwe yê taybet ew pîvan bikaraniye ku ligel zimanê wan bi hev re gûncayê be. Her weke çawan her zimanekê bingeh û forma xwe ya taybet heye ku ji bingeh, distûr û forma zimanekê din cûdaye. Ewqas jî pîvana helbestê li gorî bingeh, form û şêwaza zimanê her gelekî jî diguher e. Wate, " pîvan çembera giştî ya helbestê ye, rê nade helbest qût bibe û birije. Pîvan tenê mûzîka diyar a derveye ku ew jî beşeke mekanîkiye di seranserî pîvan û awaza helbestê de. Erka sereke ya wê parastina qalibê giştî yê helbestê ye" (Ezîz Gerdî, 1999, s. 73).

Lewra helbestvanên Kurd jî her ji kevin ve ew pîvan bi karanîna ku bi zimanê Kurdî re lihev gûncayê. Lewra di helbestên xwe de peyewa (pîvana birge pence "tilî" û pîvana eruza Erebi) kiriye. Pîvana pence "tilî" li ser bingehê hêjmarê

bikarhatiyê ku tevayî helbestên gelêrî, pend, beyt, bûxçika folklorî û ew helbestên ku bi şêwaza Hewramî (Goran) hatine nivîsandin ew corê pîvanê bikaraniyê ku bi pîvana resen û nijad a Kurdî tê binavkirin. Goran jî di vî warî de dibêje: " Ew pîvan, pîvana taybet a neteweya me ye, zêdetir ligel taybetmendiyên zimanê me re lihev tê min bi pêdivî zanî di heyama hewlên xwe yên wêjeyî de roj li pey roj ber bi aliyê wê pîvanê ve biçim" (Kejal, 2010, s. 69).

Her çi helbestvanên wêjeya klasîka Kurdî ne jî ji bilî şêwezarê Goranî Eruza Erebi bikaraniyê ku ev cure pîvan ji Eruza Erebi wergirtiye û taybet bûye bi Ereban. Helbestvanên neteweyên Misilman dibin bandora wêje û çanda Erebi de ew curê pîvanê wergirtine. Vêca çi rasterast be yan jî nerasterast be, ew curê pîvanê di helbestên Kurdî de bi pîvana resen a Kurdî nayê danîn lê pîvana xwastî bi pîvana resen a Kurdî tê naskirin. Ji ber ku helbestvanên Kurd bi sedema nûbûna helbestên Kurdî carek din ji bo bikaranîna pîvana xwemalî vegeran ku bi pîvana pence "tilî" hatiye naskirin. Helbestvan Teyyib Cebbarê jî ji rêbaza klasîk ya Kurdî avêtiye û pîvana Eruza Erebi bikaraniyê û weke helbestvanên berî xwe û serdema xwe berê xwe daye pîvana birgeyî yan jî di piraniya helbestên xwe de peyrewa ti pîvanekê nekiriye. Wate, beşek ji helbestên wî bê pîvanin bi taybetî helbestên koma helbestên sêyem (Ew Şîraney Awir Bo Pêşewe Deden) helbestvan di wan helbestan de xwe bi ti pîvanekê ve girê nedaye. Di vî warî de helbestvan dibêje " tevayî helbestên koma yekem û dûwem ên min ku bi navê (Lawandinewey Xolemêş, Ew Rojey Min Demrim) hatine belavkrin, tevayiya wan helbestan pîvandarî tenê yek dû helbest nebin ligel helbestên koma sêyem ku hejmara wan 25 helbest in"(Teyyib,Havdîtn, Silêmanî, 24/11/2016). Wate, helbestvan di piraniya deman de xwe bi pîvanê ve girê nedaye û çawan ji wî re gûncaw be wiha helbesta xwe dariştiye û ewa di hundirê wî de bû derbiriye û ji ber pîvanê dest jê bernedaye. Wate, li gorî xwesteka xwe destkarî û lihev guhertina şûna birgeyan kiriye. Ew jî alîkar bûye ku ber bi helbestên bê pîvan ve biçê, bikarin û şêwaza xwe ya taybet hêjmareke helbestên balkêş di vî warî de afirandine. Ew pîvanên ku bikaraniyê zêdetir pîvanên penceyî "tiilya" yên (10, 8, 6-8) birgeyî bûne ku ew curên pîvanan awaz û mûzîkeke xweş têde heye.

### -Pîvana Deh Birgeyî

Ew yek ji wan pîvanaye ku ji hemû pîvanên din zêdetir di beyt û bûxçikên folklorê Kurdî de hatiye bikaranîn. Beşeke herî mezin a helbestên şêwezarê Hewramî (Goran) pê hatine honandin û her ji mêj ve helbestvanên weke Mewlewî û Pîremêrd, piştî jî Goran û Şêx Nûrî û helbestvanên din bikaraniye. Yeke ji pîvanên nijad û resen ên helbesta Kurdî. Ji ber ku bi taybetmendiyên zimanê Kurdî re digûnce. Ji bo mînak, helbestvan Pîremêrd di teksta (Ême Ke Kurdî..) de ku di navbera salên (1920-1930) de nivîsandiye pîvana deh birgeyî bikaraniye ku ji destpêya 5+5 pêkhatiye. Wate beriya Goran, Şêx Nûrî û helbestvanên din ber bi pîvana penceyî ve çûye. Ji bo mînak, di helbesta Kurmancî ya Xwarê de dibêje:

" Ê/ me /ke/Kur/dîn//le/la/man /wa/ye

Zi/ma/nî /Kur/dî// zor/ bê / haw/ta/ye " ( Fayeq H. H., 1990, s. 276).

Teyyib Cebbar di helbesta (Silêmanî) de ku di sala 1978'an de li ser pîvana 10 birgeyî 5+5 nivîsandiye û dibêje:

Le şarêkî pir le taw lezet da. 5 + 5

bêzarî ..... Wek kirim, 5

Wird wird deqşête dewarî dilim. 5 + 5

bêzarî wek tem, 5

dê û dadepoşê serapay cestem . 5 + 5

Xelkî be bê şerm , 5

kirnuş bo dirkî zelîlî deben 5+5

be qaqay pir req 5

be wişey nerm 5

destemo debin û 5

pişt le sengerî keramet deken 5 + 5

Debine kîsey geç , 5

debine ferdey lim . 5 (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 83-84).

Ev parçe ji (14) çarde nîvrêzan pêkhatiye, di nîvrêza yekem ya helbestê de bi destepê ya (5+5) birge û nîvrêza dûwem bi yek pê ya (5) birge û carek din di nîvrêza sêyem de bi destepê ya (5+5) birge û nîvrêza çarem bi yekpê ya (5) birge û di nîvrêza yazde û dazde ya helbestê de bi destepê ya (5+5) birge nîvrêzên sêzde û çarde yên helbestê bi yek pê ya (5) birgeyî pêk hatiye.

#### **-Pîvana Heşt Birgeyî**

Pîvaneke xwemalî ya herî berbelave û piştî pîvana (10) birgeyî tê, Teyyib Cebbar beşeke mezin ji helbestên xwe li ser wê pîvanê honandiye û awaza derve ya helbestan pê saz kiriye. Ji ber ku “pîvana heşt birgeyî ji pîvana deh birgeyî kevintire” (Me'ruf , 1962, s. 31). Lewra helbestvanên wêjeya Kurdî her ji kevin ve bi peyrewkirina pîvana pence (birge) re ew pîvan weke pîvanek xwemalî dîtiye û di helbestên xwe de bikaraniye û destepê yên wê pîvanê ji (4+4) birgeyan pêkhatiye, Teyyib Cebbar di helbesta (Sîrudî Diwaroj) de ku di sala 1984'an de li ser pîvana heşt birgeyî (4+4) darijtiye dibêje:

Rojê dadê . 4

Grrî behar 4

Berde bête şaruladê 4 + 4

hemû zemîn 4

debête yek xanûy bexşîn 4 + 4

Debête yek baxçey rengîn 4 + 4

mirov .... Sercem 4

debête xawen yek şarê 4 + 4

Dedwê beyek zman ... Yek dem 4 + 4 (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 63-64).

Ew helbest ji dû beşan pêktê, beşa yekem ji (10) nîvrêzan pêkhatiye û bi vî awayî nîvrêzên yekem, dûyem, çarem, şeşem û heştam yek pê yên (4) birgeyîne û nîvrêzên sêyem, pêncem, heftem, nehem û dehem dû pê yên (4+4) birgeyîne û bi vî awayî parvekirina pêyan awazeke xweş dide helbestê.

**-Pîvana Têkal:**

Ew pîvan yek ji pîvanên nijad ên xwemalî yên Kurdî ne, hêjmareke mezin a peste, lawik û helbestên folklorî yên Kurdî bi wê pîvanê hatine honandin û helbestvanên nû lê vegerane û di helbestên xwe de bikaranîne. Teyyib Cebbar jî peyrewa wê pîvanê kiriye û beşek ji helbestên xwe li ser pîvana Têkala şeş birgeyî ya (3+3) û Heşt birgeyî (4+4) honandiye. Ji bo mîna helbestvan di helbesta xwe ya (Diwa Bruskey Nalî) de dibêje:

Dexîlt bim qurban. 3 + 3

Ger detwanî serê bide. 4 + 4

Le hewargey wêran. 3 + 3

bizane... 3

Kilkey hewir mawe. 3 + 3

Be palî şaxewe? 3 + 3

Ya baran barîn, 3 + 3

Serçopî girtuwe, 3 + 3

Heldeperênê marumêro 4 + 4

Le naw cergey xakî şaxewe 4 +4

Bizane dexîlt bim , 3 + 3

Çi base ? 3

Kiwan û sard û sire? 3 + 3

Ya pêç û lûlî dûkell. 4 + 4

Heldestê ... 3

Le dîwexanî naw baxewe? 4 + 4

Yar nustuwe ? Ya torawe ? 4 +4

Ya her detlêtewe, 3 + 3

Bedem ax û daxewe ? 3 + 3

Bom binûse qurban 3 + 3

Çiye deng û basî eşret? 4 + 4

Kor germe? Ya miqomqoye? 4 + 4

Ya xelk.. 3

Her nale nallêtî 3 + 3

Bedest kurte biney 3 + 3

kiwêrewe caxewe? 3 + 3 (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 91-94).

Ev helbest ji bîst û şeş nîvrêzan pêkhatiye û tevayî wan li ser dû piyên(4+4)û (3+3) birgeyî ye tenê nîvrêzên (4,12,15,23) nebe ku li ser yek piyên (3) birgeyî ye. Yek ji taybetmendî û şêwazên helbestên Teyyib Cebbar ewe ku zêdetir bi aliyê lawk û heyranan ve dicing. Ji ber ku helbestvan ji bo derbirîna wê mebest û hêviya ku di hundirî wî de hebûye bi rêya pîvan û qafiyeya xwe jê bêpar nekiriye. Her weke dibêje " piştî helbesta (bangeşey helbijardinê) min dest ji

pîvanê berdaye û bi kêmanî pîvan û birgeyên wek hev di helbestên min de hene, pêgirî tu pîvanek nîne, tenê bi rêkeft hinek nîvrêz li ser yek pîvanê hatine”(Teyib, Havdîtn, Silêmanî 24.11.2016). Wate di beşeke helbestên wî de peyrewa ti pîvaneke dyarkirî nekiriye. Ji ber ku di wê qonaxê de ew di wê baweriyê de bû tenê pîvan û qafiye bes nîne ji bo pêkanîna helbestê.

Ji ber ku eger peyv, awaz, mûzîk, wêneyê hunerî û amrazên din ên helbestê li xwe negirin, wê demê nabe sedema çêbûna helbesteke balkêş. Wate, awaz û mûzîk jî bi amraza sereke ya helbestê datîne, di vê dîtin û nêrînê de helbestvan nêzîkî ya (Dr. Marûf Xeznedar) re nêzîk dibe ku " mûzîkê bi stûna piştê helbestê datîne lewra mercê sereke ya hîma helbestê bi pîvan û qafiyê ve girê nade lê ji bo zimanê mûzîka helbestê vedigerîne" ( Perêz, 2006, s. 364). Wate, di helbestên koma sêyem û helbestên xwe yê dawiyê de bi qasî ku girîngî bi awaz û xemilandina peyv, ziman û çêkirina wêneyê hunerî daye ewqas bi aliyê pîvanê ve neçûye weke di pexşane helbesta (Ta Êsta Hîç Şî'rêkim Têr Xew Nebûwe ..!!) de dibêje:

Biray berêz kak nasaz

Silawêkî germ

Nameketan le berwarî (tiwanewey şew) da

Dadiyare cenabtan le min ténagen, nazanin min çinind ser qillim.

Em hemû hewre be min konakirêtewe . Em hemû sêbere be

Min qed nakrêt. Em hemû xewne be min naçêndirêt.

Rojane be awî pîroz hewîrî deyan pirsyar degirmewe, natî wellamim

Be tenurî sardewe dedrêt. Şewane qijî rêzman şane

Dekem her yek dû wişe le yek dedem, yekser mana

Wêran debêt kesêk niye hawkarim bêt bo diyarkirdinî

Sinûrî tarîkî helle be ser helle da baz dedat û berd degirine

Yektirî be bêdengiyek Kasim Xilltanî hawar e.

Êsta be bonî rabridû serxoşim û hîç hewalêkim pênegat û bim xate ser

Girugal zor hawînim guşî û zor zistanim doşî , hîçyan dadî

Nedam. her çend dekem çawerwanîm wişk nabêtewe, sereta û

Kotay lafawekem bo nadozrête . Ger hatî bo serdanim, agat

Lexot bê , çunke rêgay malî ême hemû rojêk degorrêt. (Teyib, Ta Êsta Hîç Şî'rêkim Têr Xew Nebûwe..!!, 2014, s. 8).

Wate, helbestvan tenê bi yek curî ve nehatiye girêdan, çawan ji wî re gûncaw be wiha helbestên xwe dariştine û ewa ku di hundirê wî de hebe derbiriye û ji ber pîvanê dest jê bernedaye, bi xwesteka xwe destkarî û bi hev guhertina şûnpî û bendan kiriye. Ew jî alîkariyek bû da ku ber bi helbesta azad û pexşane helbestan ve biçe, helbestvan bi karîna û şêwazê/a xwe di her dû waran de çawan jêre hatibe û xwestibe helbest nivîsandine. Lewra dibînîn helbestvan di helbesta (Ew Namaney Le Der Şarewe Bo Hatî) de ku di sala 2017'an de nivîsandiye carek din vegera li ser pîvana pencey (tiliya) xwemalî ya Kurdî ku li ser pîvana heşt birgeyî ya 4+4 nivîsandiye û ji heftê û dû nîvrêzan pêkhatiye. Weke dibêje:

Ger hezit kird .. 4

Legel şî'ra sema bikey, 4+4

Lencewlarî wişe fêrbe . 4+4

Gerheztkird.. 4

Legell şî'ra mele bikey , 4+4

Le destbazîy xeyal têrbe. 4+4



...

Gerdetewê.. 4

Fêrî zimanî semabî, 4+4

Beytî agir bixwênewe. 4+4

Ger detewê.. 4

Aşnay rewîştî ger mabî , 4+4

Tozêk befir bitwênewe. 4+4 (Teyib, Ew Namaney Le Der Şarewe Bom Hatin, 2017, s. 7).

Yek ji taybetmendî û şêwaza helbestên Teyyib Cebbar ewe ku zêdetir bi aliyê lawik û heyranan de diçe. Wate, helbestvan bi şêwaza xwe nêzîkî pîvana lawik û heyranan bûye û girîngî pê daye. Ew corê pîvanê "tu diyardeyeke hevdozî nîşan nadin lê tevayî seng û giraniya xwe di asta rîtmê de derdikeve" (Ednan , 2009, s. 167-168). Ji bo nimûne di helbesta (Dîsan Şew Hat) de dibêje:

Dîsan şew hat, bo naley min.

gir ber dira...

le şare zerdewalley min.

ne dîwar henase deda,

Ne dergaye dediwê.

ne pencere rûm têdeka,

ne sazê de dengê.

ne tarmayî yarê..

Serim lêdeda,

ne kesêk dê..

Oqire nagirê..

em rûhe rût û recaley min!!

To bilêy lem dûnyaye..

Kesêk hatibê..

ser derbika,

le hegbey wîrdewaley min?? (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 95-96).

Yan jî di helbesteke din de ku ji bo hunermendê koçkirî Hûsên Misrî nivîsandiyê dibêje:

Mero hawrê, carê zûwe.

hêşta dûkell..

Her xoy derazênêtewe

kefî xinkan ..

Ne nîştuwe.

Pet û darî kîşanewe.

Gilolley xoy...

Gewre dekat.

Xewnî lîxin,

le gel şekanewey mêjû,

têkel debê,

pelamarman dedat.

Peşîmanî,

Wirdekarî xoy...

Aşkîra nekirdûwe.

mero hawrê..

muçirikî soz namannasê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 103-104)

### - Qafiye

Qafiye bi yek ji amrazên girîng ên hîmê helbestê tê danîn û bi hev re tevî pîvanê dibin sedema pêkanîna awaza derveyî ya helbestê. Ji ber ku " qafiye ji dûbarebûna dengê yan jî hinek deng û peyvan di dawiya nîvrêzan an jî rêzên helbestê de pêkhatiye. Ji ber ku qafiye bi piranî di dawiya nîvrêz an jî rêza helbestê de tê. Lê dikare di hundir de jî be (qafiya hundirîn) yan jî di destpêkê de dibe qafiya destpêkê" ( Ezîz, 2014, s. 269). Wate qafiye amrazê pêkanîna helbestê ye û li gorî bikaranîn û girîngî pêdana ziman û qonaxa jiyana helbestvan diguhere. Lewra qafiye ne bi tenê di zimanê Kurdî de lê li cem her neteweyekî li gorî berjeng (sifet) û taybetmendiya fonolojiya ziman û qonaxên pêşveçûna wêjeyî tê guhertin.

Ji ber ku qafiye " ji wan parçeyên dengê pêktê ku dikevin dawiya rêzan. Wate, ew parçeyên ku divê di dawiya her rêzekê de dûbare bibin" (Idrîs, 2013, s. 184). Wate, qafiye ew awaze ku ji encama dûbarebûna dengê çêdibe. Ji ber ku her zimanekî hêjmareke deng û distûrên taybet bi xwe hene. Lewra helbestvanên klasîk yê Kurd peyrewa zimanê xwe kirine û ji encama dûbarebûna dengê dawiya nîvrêzan awazeke helbestî çêbûye. Helbestvanên klasîkî yê Kurd qafiye ji helbestên Erebi wergirtin ji ber ku Ereban qafiye jî weke pîvanê bi amrazeke girîng ê pêkanîna helbestê danîne û li ser pîvana Eruza Erebi helbest nivîsandine û awaza derveyî ya helbestên xwe pê rêkxistine. Lewra Ezîz Gerdî di behsa qafiyê de dibêje: " Qafiye li ser bingeha yekbûna dengê yan jî hinek deng. Wate

dûbarebûna dengên wekhev di mewdayê dema taybet de çêbûye" ( Ezîz G. , 1999, s. 34).

Lewra dibînîn helbestvan ji kevin ve tenê hinek curên qafiyeyê bikaranîne weke (qafiya hevqirtî, cot qafiye, qafiyeya tevlihev) ku her helbestvanekî li gorî serdem û qonaxa xwe ew cur bikaraniye ku di wê çaxê de berbelav bû ku helbestên xwe têde nivîsandine. Ew jî bi tevî ku gelek caran helbestvanan li gorî xwestek û daxwaziya xwe ew cur bikardianî ku li cem wan ji bo helbestên wan gûncaw bûye. Lewra tevayî dîtin û nêrîn li ser wê yekê hevbirîn ku qafiye awaza derve ya helbestê pêktîne. Ji ber ku " qafiya helbestê dengê an zêdetir yên dûbarekirî yên nava hîmê helbestekê ye û bi giştî dikevin dawiya tîpa wan awazên ku helbest jê pêktê, weke rêz, beyt û hevokên helbestî, erka wan jî pêkanîna awazê dîkêşe û beşek ji aheng û awaza derve ya helbestê ava dike" ( Dilşad, 1998, s. 102). Wate, " qafiyê di dawiya her beşeke xezel (pêdagotin) û qesîdeyan de dûbare dibe, (yekîtiya qafiyê) weke davekê ye dawiya hemû rêzan bi hev ve girê dide û yekîtiya helbestê ji wê dervê ve garantî dike" ( Se'îd F. Y., 2011, s. 119). Her çiqas qafiye li cem helbestvanan helbestên klasîkî amrazêke taybet û gelek girîng ê helbestê bû lê helbestvanên nû ji bo afirandin û bi karanîna rêyeke nû xwestiye xwe ji pîvan û qafiyê dûr bixin û bi taqîkirneke nû guhertinan di honandinê de bikin, daku helbestvan dest ji wê rêbazê berdin ku heyama hinek salên dûr û dirêje li ser diçin. Ji ber ku helbestvanên Kurd " ji salên heftêyan ve hinek guhertin di qafiyeya helbestê de kirin, kevneşopiya berbelav a "qafiyeya klasîkî, cot qafiye û çarik" şikandin û kêmtir ji berê xwe bi qafiyê ve girê dida" (Erselan , 2003, s. 195).

Ji ber ku di wê qonaxê de hinek hewl û dîtin û nêrîn hebûn ku li ser wê yekê ciddî bûn ku divê guhertin û nûbûnek di helbesta Kurdî de bê kirin ku piştê ew hewl di çarçoveya hêjmareke komên çand û wêjeyî de derketin û karîn guhertinan li ser helbesta Kurdî binin cih û şûna xwe di wêjeya Kurdî de binexşînin. Helbestvan Teyyib Cebbar jî weke helbestvanekê wê qonaxa wêjeyî hewla guhertinan daye û guhertin di helbestan de kirîne û peyrewa ti qalib,

destûr û qafiyeyeke diyarkirî nekiriye. Çawan wî xwestibe bi vî awayî qafiye daniye, li gorî hesta/ê xwe qafiya helbestên xwe ava kirye û awaza derveyî pê rêkxistiye. Wate helbestvan xwe bi qafiyeyê ve girê nedaye lê qafiyeya azad bi karaniye û çawan ji wî re hatibe bi wî awayî hestên xwe derbiriye. Em jî hewl didîn di vê behsa xwe de hinek mînakên qafiyeya azad li cem wî helbestvanî berçav bikîn. Helbesta (Ew Rojey Min Demirim) yeke ji şakarên balkêş ên wî helbestvanî û yeke ji wan şakarên ku zêdetirîn nirxandin, xwendina ji aliyê rexnegiran û nivîskaran ve jêre hatiye kirin. Wê yekê jî helbestvan ji qonaxekê ve ber bi qonaxeke din ve bir, di nivîsandina helbestan de, ev helbest bi qafiyeya azad hatiye nivîsandin û ji dû beşan pêkhatiye. Beşa yekem ji (105) nîvrêzan pêkhatiye û beşa dûwem jî ji (189) nîvrêzan pêkhatiye. Di beşa yekem de wê yek malikê werbigrin ku ji (14) nîvrêzan pêkhatiye. Bi vî awayî şîrove dikin.

1-Ew rojey min demrim, A

2-Topî xor... B

3-Dexlête ser zewî, C

4-Mang ... Fiş debêtewe.. D

5-Estêre ... Dêne xwar, E

6-Çiwar dewrî şar degirin F

7- Amadeba Baş, G

8 - Çok dênne ser pê H

9- Ew roje ... I

10- Zewî.. henawî dête jan û J

11- Deawsê. k

12- Asman ... Nzim debêtewe. D

13-Darw berd.. L

14- henasey siwar debê. H (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 3-4).

Di wê malikê de 12 corên qafiyeyê hatine bikaranîn. Qafiyeyên her nîvrêzekê cûdane û peyrewa tu curek ê qafiyeyê diyar nekiriye. Ji bilî qafiyeya (D) di nîvrêza (4,12) de û qafiyeya (H) di nîvrêzên (8,14) de dûbare bûye û hevqafiyeye. Ew curên qafiyeyê bi hev re awazek rewşenbîrî û balkêş çêbike. Yan di helbesta (Dastanî Şêtêkî Tirda) ku ji (66) nîvrêzên pêkhatiye û peyrewa ti core qafiyeyekî diyarkirî nekiriye, çawan jêre hatibe weha qafiyeyên xwe danîne, di vê behsê de tenê malikekê ji wê helbestê werdigirin ku ji (11) nîvrêzan pêkhatiye û bi vî rengî şîrove dikin:

1-Şew nema honraweyekî natewawt bo danenîm. A

2-Şew nema besteyekî tirt bo nelêm . A

3-Dwa êstgey bîrekanim toy. B

4-Diwabenderî keştî teqelakanim toy. B

5-Şepol goranî deryaye, C

6-To frîştey xewnekanmî , D

7-To rayelley tewnekanmî. D

8-Firîştekem E

9-Lerruxsare kzeketa, F

10-Azare şardrawew neşardrawekanî mirov.. G

11-bedî dekem. E (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 37-38).

Di vê malikê de heft curên qafiyeyê hatine bikaranîn. Qafiyeya (A) di nîvrêzên (1,2), qafiyeya (B) di nîvrêzên (2,3), qafiyeya (D) di nîvrêzên (6,7) û qafiyeya (E) di nîvrêzên (8,11) de dûbare bûne û hevqafiyeyane. Qafiyeya (C) di

nîvrêzên (5) pêncem, qafiyeya (F) di nîvrêzên (9) nehem de, qafiyeya (G) di nîvrêzên (10) dehem de rehayê û bi ti nîvrêzeke din re qafiye çê nekiriye. Di çar nîvrêzên destpêka helbestê de (4,3,2,1) bi awayeke cot qafiye (mesnewî) bi sîstema (pp-bb) darijtiye û qafiyeya (D) di niv dêrên (6,7) de qafiyeya mesnewî çêkiriye û hevqafiye ne. Wate qafiyeya mesnewî " di destpêkê de hunereke Farisî ya kevna bû û Farisan ji bo honandin û çînîna helbestên dirêj girîngiyeke mezin di helbestên xwe de pê dane" (Mihemed N. E., 1976, s. 255). Li vir qafiye bi hev re awazeke rewşenbîrî, xweş û balkêş çêkiriye.

### **3.1.2 Awaza Nava Tekstê**

Hevdem bi tevî wê asta karîn û hunermendiya ku Teyyib Cebbar di pêkanîna awaza derve ya tekstên helbestan de hebû hewl daye bi şêwazên hunerî yên cûda, awazên cûda û ciwan bide tekstên nava helbestên xwe. Ew jî çî bi rêya awazên tak takiya deng, peyv û hevokan be yan jî bi rêya yekxistina deng, peyv û hevokan be di rêz û nîvrêzan tekstên helbestan de.

#### **-Dûbarebûna Deng:**

Teyyib Cebbar di helbesta (Bibore Qurban Min Le Derewey Bazinem) de dibêje:

Wazim lê bêne..

To le derdî min nagey !!

To nazanî çilkî mêjû...

Çon berî çawim tarîk dekat.

to nazanî dirzî cografya...

Çend azarim dedat.

Min çî le giju giyay qise bikem,

ger giranetay şaxim bo çare nekat?!

Çî le şîley yektir nasîn bikem.

Ger jane serî şarim bo la nebat?! ( Teyib, Bibore Qurban Min Le Derewey Bazinem, 2015, s. 8).

Helbestvan di van çend rêzan de hêjmareke peyvên Kurdî yên resen bikaraniye ku awaza hundirîn pê rêkxistiye ew jî ji bilî awaza derveyî ku xwe di pîvan û qafeyyê de dibîne. Dengê dengdêr (î) di peyvên (derdî, nagey, nazanî, çilkî, berî, nazanî, dirzî, çî, giyay, tay, şîley û serî) de hatiye dûbare kirin, awaz û mûzîkeke xweş û hêdî daye bi helbestê. Helbestvan her di helbesta (Em Şî're Wazim Lê Nahênê ...!!) de dibêje:

Zor car hez dekem serî xom kiz kem.

Waz bênim le çewir kirdinî wişe be ronî xeyall

Le çinîrî riste be dezûy gizing

Waz bênim le çîwarçêwe girtinî zayele

Le balkirdnî dengdanewe

Waz bênim le awdanî pirsyar

Le rinîrî wilam. (Teyib, Em Şî're Wazim Lê Nahênê, 2013, s. 8).

Di van hinek nîvrêzan de dengê (z) neh caran dûbare bûye û dengê (r) deh caran dûbare bûye û dengê dengdêr (î) deh caran dûbare bûye. Dûbarebûna wan dangan tevayî wan bi awayeke wiha bi hev re çûne ku ritîm û awazeke bilez daye helbestê . Tam û sozeke ciwan çêkiriye " ew jî tevî ku dûbarebûna dengên hêdî û nizim rewşeke aram çê dike û dûbarebûna dengê (r) rewşeke tevger di hesta xwendevan de çêdike" ( Mihemed E. E., 2012, s. 51).

Helbestvan di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de dibêje :

Ew rojey Min Demirim,



Bûmelerzeyek ,

Asman Şeq Şeq Dekat.

Dinya Hemûy Tarîk Dekat.

-Wek Çon Êsta Kareba Debirê

Herçî Awî Gerdûn Heye Derijê,

Ser Zewî Pir Debê.

Şar û Şax, Deşt û Der,

Hemûy Dadepoşê.

Herçî Belem û Papore Nûqim Debê.

Xelk Hemûy Dexinkê,

Çend kesê Nebê.

Be Pişte Mele Bo..

(Keştî Nuh) Degerên. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 16-17).

Dengê dengêr yê (ê) di peyvên (êsta, debirê, dejê, debê, depoşê, dexinkê, kesê, debê, nebê û degerê) de bikaraniye, awaz û mûzîkeke taybet wan peyvan kom dike, deh caran dengê (ê) dûbare bûye û dengê (ş) heşt caran di peyvên (şer, şeq, şar, şax, deşt, depoşê, piştemele û keştî) de dûbare bûye. Her wiha dûbarebûna dengê (ş) di her sê peyvên (şar, şax û deşt) de ku li kêleka hev dû hatine ewqas awazeke xweştir daye helbestê û helbest xemilandiye.

Her di heman helbestê de dengê (s) çar caran di peyvên (asman, êsta, ser û kes) de bi karhatiye. Her wiha dengê (q) sê caran dûbare bûye, tevayî wan dangan jî bi hev re ewqas awazeke aram û xweş daye bi hundirê helbestê. Helbestvan di helbesta (Kirêwey Hewrêkî Tînû) de dibêje:

Xoşewîstim

Le Baregay Bêhestî şar

Firokekanî Helbestim

Bombay Yaxîbûnî Hestim

Dehawêjin

Benaw Derbendî Tarîkî Dilta... Girî

Firîştey Şoriş... Derêjin ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 26).

Di van hinek nîvrêzan de dengê (e) çar caran di peyvên (hestî, helbestim, hestim û dehawêjêt) de dûbare bûye û ew deng jî bûye sedema pêkanîna awaza helbestî ya tekstê.

Ew jî bi tevî dûbarekirina dengan " ji bilî çêkirina mûzîkê, wateyekê jî bi xwe re bar dike ku renge wateya xeydîn an jî şer... hwd bigihîne" ( Ebdûselam , 2008, s. 117) .

Helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş)de dibêje:

To Ne le Zewît... Ne le Asman.

Ne le Binarî...

Ne le Lutkey.

Ne le Xwarewey... Nele Serbanî.

To Babetêkî kirjî Nêwanî.

To... Ne çemolley...

Ne Destî Sozî.

Ne Milî keçî...

Ne Destî Tolley.

Ne Gazgirtinî..

Ne Maçî Nermî ..

Ne Rakirdnî...

Ne Danîştinî.

Dû Dilfeykî sardû bê şermî.

Çon le Gelta Bim? ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 172-172).

Helbestvan di wan hinek nîvrêzan de gelek bi şarezayî dengê (ne) hilibijartiye, erk û fermana peyvên piştî xwe di hevokê de pê spartiyê û ev helbest li ser bingeha tekezkirinê hatiye danîn û çarde caran ew deng dûbare bûye û bi awayeke stûnî, asoyî û bi heman erk rola xwe di nava rêzan de lehîstiyê. Ew jî bûye sedema wê yekê ku awaz û mûzîka helbestê firehtir û kûrtir bike û paşnavê serbixwe yê (to) sê caran dûbare kiriye ku ew jî zêdetir tekezê li ser tekezkirinê dike. Di heman demê de dengê (ne) û paşnavê (to) bi hev re jî mûzîkeke aram û hêdî dide bi helbestê. Di heman demê de jî helbestvan peyama cûdabûn û ji hev dûrketinê bi sedema amadenebûna wî bi kesê/a beramberî xwe re dide.

#### **-Dûbare bûna Peyv, Zarave û Hevokan**

Dûbarebûna peyv, zarave û hevokan jî weke dûbarebûna deng rola xwe di çêkirina awaza hundirîn a helbestê de heye. Ew dûbarebûn jî seqayek gûncaw çêdike û ew seqa jî hest, raman û mebestê kûrtir dike û helbestvan di helbesta (Dastanî Şêtêkî Tir) de dibêje:

Şew nema honraweyekî natewawit bo danenê.

Şew nema besteyekî tirt bo nelê.

Diwa îstigeş bîrekanim toy.

Diwa benderî keştî teqelakanim toy.

Şepol goranî deryaye.

To firîştey xewnekanimî,

to rayeley tewnekanimî. (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 37).

Di van hinek rêzan de helbestvan peyva (şew) ê dûbare kiriye û çar caran jî paşnavê kesê serbixwe yê (to) dûbare kiriye ku dû caran di destpêka hevokê de bi kar hatiye û dû caran jî di dawiya hevokê de bi kar hatiye. Ew curê bikaranînê jî ji bo şêwaz û karîna helbestvan vedigere û dû caran jî peyva (diwa) di destpêka hevokê de hatiye. Dûbarekirina wan peyvan di helbestê de bûye sedema xûrtikirin û bilez xistina awaz û mûzîka helbestê û dibe sedema wê yekê ku xwendevan zêdetir ji xwendinê hez bike û tamê jê werbigre. Her di helbesteke din a bi navê (Silêmanî) dibêje:

Le Şarêkî Pir Bereket da

Hejarî... Wek Ba

Be Arezûy Xoy

Gerek be Gerek Desûrêtewe

Le Dergay Zorbey...

Malekan Deda...

Bestey Birsêtî...

Le Ser Îqa'î Merg Delêtewe.

Hejarî...Wek Zam

Wek Seretan

kolan be kolan,

Teşene Dekat. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 84) .

Helbestvan di van hinek nîvrêzan de dû caran peyvên (hejarî, gerek, kolan) bikaraniye û ew jî li ser hunera dûbarekirinê bikaraniye ku zêdetir mebesta helbestvan di wê helbestê de ewe ku dixwaze ji me re bêje ku nebûnî û hejarî roj li pey roj li vî bajarî zêdetir dibe û xelkê bajêr bi tûnebûn û bêkariyê dinalin. Her wiha di heman helbestê de helbestvan sê caran amraza (wek) bikaraniye. Ew jî zêdetir ji bo girêdana wateya nîvrêzan bi hev re û di heman demê de jî weke amrazeke, wek yekxistina di navbera peyvên de bikaraniye. Helbestvan di helbesta (Diwa Birûskey Nalî) de dibêje:

Çiye...Dengûbasî Eşîret?

Kor germe? Ya Miqo Miqoye?

Ya xelk...

Her Nale Nalêtî

Be Dest kurte Biney

Kiwêre we Caxewe? (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 94).

Her çiqas helbestvan ew helbest li ser şêwazê dû çameke yê Nalî û Salim daniye, tevî wê yekê jî dixwaze behsa nerazîbûna xelkê ji me re bike li hember asteng û naxweşiyên jiyânê. Di heman demê de peyvên (miqo miqo, nale nal) yê aso dûbare kiriye ku dû peyvên Kurdî yê resen in, awaz û mûzîkeke xweş û balkêş didin bi helbestê.

Teyyib Cebbar di helbesta (Werzî Xewn) de dibêje:

Detwanin.... Baldarekanim, Pê Bijmêrin.

Detwanin.... Masyekanim, Pê Bijmêrin.

Detwanin... Estêrekanim, Pê Bijmêrin.

Detwanin.... Rûberî Zewîm, Pê Bipêwin.

Detwanin..... Dinyam Pê Peyken.

Detwanin... bo Ser Asman Helim Biden.

Bellam Natwanin Xoşewîstî Willatekem Le Dill Derken.

Tîşkî Xoy Newrozm Lê Qedexeken. ( Teyib, 2015, s. 31).

Helbestvan di vê helbesta nîştîmanî de di hinek nîvrêzan de (6) caran destepeyva (detwanin) bi awayeke stûnî û (3) caran jî destepeyva (pê bijmêrin) dûbare kiriye. Helbestvan di destpêkê de dest bi bersivdana hemberî xwe bi erê dike ku dikare hinek ji daxwaziyên wî bicih bîne lê di nîvrêzên dawiyê de bi nexêr berisiva hemberî xwe dide. Ew jî karîn û şarezaiya helbestvan nîşan dide di hilbijartina peyvan de li ser bingehê teqezkirinê helbesta xwe daniye ku di destpêka nîvrêzên de destepeyva (detwanin) tekez li ser dûbarekirinê dike û dibe sedema dirêjkirina awaz û mûzîka helbestê. Ji ber ku "tevayiya dûbareyan li cihê xwe hatîne û nabine sedema kirêtkirinê lê xûrtir dibin" ( Ezîz G. , 1999, s. 308)170 Ezîz Gerdî, Serwa, çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 1999, la 308. Ji ber ku zaravên (detwanin û pê bijmêrin) bi heman wateyê hatine û rola xwe di mûzîka helbestê de dilîzin. Teyyib Cebbar di helbesta (.....) de dibêje:

Derom.... Derom û Çunke Şar:

Sal Diwanzey Mang... Giryanêtî.

Sal Diwanzey Mang... Qijrinîn,

Sing kutanêtî.

Sal Diwanzey mang...

Tamezroy Tawê Helperkê û Şan Badane

Firmêsk! Aw, Xefet : Nanêtî.

Şew: Dîwar, Şew: Serbanêtî

Zam: Gulew xwê: Gulldanêtî. ( Teyib, 2015, s. 32-33).

Di van hinek nîvrêzan de sê caran destepeyva (sal diwanzey mang) bikaraniye û wê yekê jî berdewamiyê bi awaz û mûzîka helbestê daye, awaz û mûzîka helbestê yekgirtî kiriye, ew jî bûye sedema xemilandina helbestê.

Helbestvan di helbesteke din a bi navê (Merro... Ey Gul) de dibêje:

Merro Ey Gul Mero

Baxçe kiz,

Gelaw Gul Sîs Debin.

Liq û Pop Lar û Xwar

Le Halî Min Deçin

Merro..... Ey Gul ..... Mero

Gerek Çol,

Kollan Pêç Dexwa

Mal Tarîk,

Henasem Berzu Nizim Deka. ( Teiyb, 2011, s. 117-118).

Ev helbest ji (7) malikan pêkhatiye û di destpêka her malkekê de peyva (merro.... ey gul ... mero) dûbare kiriye ku zêdetir mebesta wî tekez kirine di vê helbestê de, dûbare bûna wê nîvrêzê jî bûye sedema çêbûna mûzîkeke aram û hêdî ji bo helbestê. Ew jî tevî ku helbestvan bêhêvî û bê hedariya xwe nîşan dide bi sedema çûna evîndara xwe weke peyamekê rastî yara xwe dike.

### **-Dijwate**

"Peyvên dijwate di nava rêzên helbestan de yekîtiyekê li dijî hemberî xwe çêdikin û dibin sedema avakirna ritmeke amajekar ya kûr û awazeke dilkêş"

(Şino, 2007, s. 157). Wate, diwate ewe ku dû peyvên dij û berûvajî hev bin di wateyan de ji ber ku "qiseker di derbirîna xwe de dû wateyên hemberî hev kom dike, vêca ew hemberîye, diwate be yan jî berûvajî, yan erênî û nerênî be" ( Se'îd F. Y., 2011, s. 139). Wate, peyvên derbirî yan jî komkirî dikare ji aliyê amrazê çêbûna wan ve li dijî hev bin weke (sar û germ, bilind û nizim) yan jî bi sedema amraza nexêr kirinê diwateyî çêdibe. Her çiqas ew peyv ji yek tuxmî jî hatibin weke (xweş, nexweş, pakij û nepakijî). Lewra Mûhsin Ehmed Mistefa Gerdî dibêje "yeke din ji wan hunerên ku di hunera ciwankariyê de tê bikaranîn diwate, weke dibînîn vê hunerê rûberek mezin di helbestên helbestvanan de girtiye" (Mûhsîn, 2013, s. 224).

Lewra ji mêj ve helbestvanan tenê di helbestên xwe de girîngiyê mezin bi hunera rewanbêjîyê daye û piraniya helbestvanên gelên din jî bi awayê reha bikaraniye. Ji ber ku " diwate, yeke ji hunerên ciwankariya wateyê, li cem Ereban bi zaravên (El-tîbaq, El-mutabeqe, El-tetbîq, El-tezad Wel tekafu) tê bi nav kirin" (İdrîs, Ciwankarî Şîrî Klasîkî Kurdî, 2011, s. 85).

Helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş) de dibêje:

Çunke Min Fêr Nîm..

Wek to.... Le Tenkawe Mele Bikem

Çûnke Min Fêrnîm..

Wek To.... bo Zemawendî Rast û Çepim

Çeple Lêdem. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 81)

Bi sedema peyvên (rast û çep) diwate erê çêbûye. Ji ber ku her dû peyv her yek ji wan ji amrazek cûda û serbixwe pêkhatine û wê diwayetiyê jî mûzîkeke xweş û balkêş daye helbestê.

Yan jî di helbesta (Roj Jimêrî Mame Xeme) de dibêje:

Nazanim Çî Bikem?



Her Çende Ême

Xerîkî Çandinî..

Zerde xene Debyn,

Giriyân Lew Lawe,

Dest Dekat Be Helbestinî....

Dirêrawî Firmêsk. ( Teiyb, 2011, s. 25).

Peyvên (Giriyân û Zerdexene) dijwateiyek di nava rêzên helbestê de çêkiriye û bi hev re awazeke dilkêş daye helbestê.

Helbestvan di helbesta (Roj Jimêrî Mame Xeme) de dibêje :

Hezim Dekird Qaqa Tow kem,

Kêlge kewte Henisikdan.

Zewî kewte Lerzew..

Asman Le Xew Helnesa,

Şiney Çawerwanîm Helpirukaw

Negeramewe Zêdî Xoman. ( Teiyb, 2011, s. 18).

Peyvên (Qaqa û Hensik), (Asman û Zewî) dijwateî çêkiriye û tevayî wan jî bi hev re awaza helbestê xweş kiriye.

Helbestvan di helbesta (Binû..... Ey Yar) de dibêje:

Min Nazanim ..

To Hez le Çi Xakêk Dekey?!

Deştî Berz?!

Biyabanî Sext?!

Herdey Nizim?!

Ya Şaxî Text?! (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 80).

Peyvên (Berz û Nzim) û (Sext û Text) di jwateiya erê çêkiriye "Ew peyvên di jwate di nava dêrên helbestê de bi hev re yekîtiyekê li dijî hev pêktînin, ritim û awazeke xweş ava dikin" (Şino, 2007, s. 157).

Helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş) de dibêje :

Çon Le Gelta Bim

To Sengerî Bîr Be Cê Dehêlî.

Nerûnî Rojim bo Diyarî Dekey...

Ne Tarîkî Şew. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 66) .

Peyvên (Rûn û Tarîkî) û (Roj û Şew) di jwateya erênî di helbestê de çêkiriye, awaz û mûzîkeke xweş daye helbestê.

Helbestvan di helbesta (Goranî Ewaney Xewiyan Deziirê) de dibêje :

To Bilêy, Rojêk Bêt!

Tiwêkilî Tarîkî Pak Bikeyn,

Henawîy Guman Be Tîşk Siwax Bideyn!

Wilatî Tebaw Nateba Derbaz Bikeyn

Le dest Terayî Dile Rawkê û

Tawtiwêy Peta! (Teyib, Goranî Ewaney Xewiyan Dezirê, 2013, s. 8).

Peyvên (Teba û Nateba) di jwateya nerênî çêkiriye. Ji ber ku her dû peyv ser bi yek tuxmîne lê bi sedema amrazê (ne) hatine nerênîkirin, di jwateyî çêbûye, awaz û mûzîka nava teksta helbestê xweş kiriye.

**-Regezdozî (El-Cînas)**

"wate lihev nêzîkatiya dû peyv an di derbirînê de cûda bin di wateyê de" (Ebdûllah , 2004, s. 156). Wate, divê derbirîn di şêwe de nêzîkî hev bin an jî weke hev bin lê di wateyê de cûda bin. Mûhsin Ehmed Mistefa Gerdî vî curê hunerê li cihê (peyvên dûçeng) bi (hevbêjî) bi nav dike û dibêje "Hevbêjî ji dû peyv an jî hinek peyv pêktê û divê ew peyv nêzîkî hev bin lê dive her yek ji wan wateyeke taybet bi xwe hebe, di pênaserkirina hevbêjiyê de eger ji ber zêdetir zelalkirinê nebe pêwîst nake bêtî di wateyê de cûda bin. Ji ber ku eger di wateyê de weke hev bin wê demê dibin yek peyv" (Mûhsîn, 2013, s. 249).

Ewa ku divê amaje pê bikî ewe ku mirov di demekê de guhdariya wan peyv an dike ku bûne sedema pêkanîna awaz, mûzîkeke balkêş ji helbestê re û mirov hest bi tam û aramiyeke mezin dike bi sedema awaza nava teksta helbestê " Ew peyvên ku peyvên dûçeng di navbera wan de çêdibe her çiqas di wateyan de cûda bin, di şêweyê rêzbûn û hêjmara tîpan de wekehev bin dibine sedema çêkirina awaza navxweyî di helbestê de û mûzîkek xweş didin bi helbestê" (Şino, 2007, s. 158). Lewra dîtî û nêrînên piraniya lêkolîner û nivîskaran li ser pênaserkirina Peyvên dûçeng hev digirin û li ser wê yekê hevbîrin ku divê peyv di şêwe de wekehev bin yan jî li hev nêzîk bin û di wateyê de cûda bin. Idrîs Ebdûla dibêje: " Peyvên dûçeng, pêkhatiye ji hebûna dû peyv an di derbirînê de wekhev bin û di wateyê de cûda bin... Yan jî bi wateyeke din: Rastiya peyvên dûçeng ewe ku dû peyvên ji hev cûda yek bin an jî wekhev û nêzîkî hev bin. Wateya wan jî cûda be" (Idrîs, Ciwankarî Şîrî Klasîkî Kurdî, 2011, s. 13). Ji ber ku peyvên dûçeng yeke ji beşên girîng ên ciwankariyê "bi awayeke giştî behsa wan amraz, tuxm û distûran dike ku aliyê hunerî û ciwaniya wêjeyê zelal dikin" (Letîf, 2009, s. 114).

Teyyib Cebbar di helbesta (Bestey Çawerwanî) de dibêje:

Ey çî dekey.. lew kilîley....

Gişt Dergayek Dekatewe

Lew Helbestey ...

Wellamî Hemû Pirsyarêk

Dedatewe. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 54-55) .

Li vir peyvên dûçeng (Dekatewe, Dedatewe) ji curê (cûda) pêkhatine. Ji ber ku cûdahiya di navbera peyvande di curê tîpan de ye ku di peyva yekem de (K) û di ya dûyem de (D) ye.

Helbestvan Ev curê peyvên dûçeng bi beramberkirina ligel curên din zêdetir bikaraniye. Helbestvan di helbesta (Tepelû) de dibêje:

Nîwro Bû...

Tepelûy Matû Êsik Sûk

Tepelûy Ciwan û Şeng Wek Bûk

Bû be komelê Xolemêş. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 35).

Li vir peyvên (sûk, bûk) regezdoziya netemam a ji curê cûda çêkiriye. Ji ber ku cûdahiya di navbera peyvên de di curê tîpan de ye ku di peyva yekem de (S) û di peyva dûwem de (B) ye.

Helbestvan di helbesta (Min Dezanîm) de hêjmareke peyvên bikartîne ku di şêwe de bi temamî wekhevî û di naverokê de cûdane. Weke helbestvanekê xurt kariye bi ciwanî bi peyvên re bilîze û di helbestan de reng vebide. Ji bo mînak dibêje:

Min Dezanîm,

Şew Nixunî

kilîlî Dergay Nustinî...

Şardotewe

Pal be Paldanewewe Denê

Bo Pal Dîwarî....

Dest Neroyiştin. ( Teyib, 2015, s. 164)

Li vir helbestvan kariye peyva (pal) ji bo komê wateyên cûda bikarbîne, (pal) a yekem bi wateya pal pêvedan tê, (pal) a dûwem bi wateya mirov tê. Ji ber ku taybetmendiya (paldanevê) pêre hatiye dayîn, (pal) ya sêyem bi wateya kêlek an jî tenişt tê. Ji ber ku pal dîwar ramana kêleka dîwar digihîne, lewra helbestvan di bikaranîna wan peyvan de peyva dûçeng temam çêkiriye.

### **3.2 Wêneyê Hunerî**

#### **3.2.1 Çemk û Pênaseya Wêneyê Hunerî**

Wêneyê hunerî ji ziman çêdibe bi wê yekê ku bingehê teksta hunerî ya helbestê beriya her tiştekî ziman e û yeke jî ji diyartirîn behsên rexneyî di rexneya Ewropî de ku bala rexnegiran bi aliyê xwe ve kişandiye. " Wêne di rexneya ewrupî de (imag) jêre tê gotin ku peyveke Ingilîziye. Peyva (imag) di Îngilîziyê de amaje bi wan amraz û tuxmên hevbeş dike ku bi peyva xeyalê re (imag ation) hene ku bûne sedema hevbeşiya wan di yek warê me'rîfî de û ew peywendiya xurt ku di navbera xeyal û wêne de heye bi wê yekê ku wêne girîngtirîn berdesteya xeyalê ye di helbestê de" (Serdar , 2004, s. 25). Ew jî ji bo kûratiya hest û hizrên nazik, ciwan, firehî û berbelaviya cîhana xeyala helbestvanan vedigere. Ji ber ku çavkaniya wêne fikar û xeyal e.

Wêne, bi xwe "pêkhateya rêzimana xeyala hunermend ji hin çavkaniyan çê dike ku cîhana hestpêkirî li pêşiya wane. Piraniya wêneyan ji hestan hatine wergirtin, hevdem bi tevî wan wêneyên derûnî û hişmendiye ku nikare bêne paşguh xistin her çiqas wêneyên hest nayên, yan jî gelek caran di wêneyên hest de pêşkêş dike" (Mihemed F. M., 2011, s. 65). Lewra Eger helbestvan bi xwazin helbesteke ciwan û balkêş binivîsînin divê biçin kûratiya teksta helbestê daku ew mebesta wan heye bi karin bi wêne pêşkêş bikin. Ji ber ku " wêneyê serkeftî ew wêneyeye ku bi temamî di hesta helbestvan de ava dibe bê ku hiş rola xwe têde bilehîze" ( Ebdûlqadir, 2004, s. 4)4. Ji ber ku wêne ji encama wan peyv û destepeyvan çêdibe ku helbestvan bi rêya wêne ji bo desteberkirina tekstê derdibire ku ew

wêne jî di xizmeta wêneyê sereke de dibin ku mebesta helbestvane. Lewra di wî warî de Ebdûlqadir Mihemed Emîn dibêje: " Wêne pêkhatiye ji gotina peyvên, çî peyvên hestî bin an jî wateyên zelal, di her dû waran de hinek wêne ji encama peyv û destepeyvên pêktên, dikarin bêjin tekst ji hêmareke wêneyan pêktê ku tevayî wan di xizmeta wêneyê sereke de dibin" ( Ebdûlqadir, 2004, s. 15).

Lewra wêneyê helbestê ji xwezatiya wan tiştan çêdibe ku çavkaniyên pêkanîne tenê helbestvan bi xwe ye. Helbestvan hest û xeyala xwe kûr û fireh dike û diçe kûratiya tiştan. Ji ber ku " wêneyê hunerî pêkhatye ji ciwankarî ku bi hiş, zîrekî û xeyal frehiya helbestvan çêdibe û chê xwe di hizir de digire"68 (Arî , 2002, s. 246).

Helbestvan hest bi wan tiştan dike ku di xwezayê de hene, dike helbest û bi rêya xeyalê wêneyeke ciwan jêre dikişîne. Ji bilî xeyala helbestvan amrazên din jî beşdariyê di pêkanîna wê de dikin. Tevayiya wan helbesteke ciwan û balkêş pêktînin. Ji ber ku "wêne amrazeke girîng ê helbestê ye û dibe sedema çêbûn û afirandineke nû di helbestê de. Wêne tenê ji bo xemilandina aliyê îstatîkaya helbestê nehatiye pêkanîna lê helbestvan bi rêya fikara xûrt û afirêneraneya xwe wêneyê desteberkirî yê hest û rewşa derûnî pêktîne ku mebestê zelal dike û dibe sedema têgihîştin û kilîla vekirina deriyên nerasterast û xwe veşartî yên di nava hîmê tekstê de" (Şino, 2007, s. 160). Lewra dibînin wêneyê hunerî dîrokeke dûr û dirêj heye. Wate, wêneyê helbestê tiştek nû nîne lê bi tevî serhildana helbestê wêneyê helbestê jî çêbûye û qonax bi qonax geş bûye û pêşketin bi xwe ve dîtîye.

Her helbestvanekî li gorî hest û xeyala xwe di nava tekstên xwe yên helbestî de wêne ji bo xemilandinê helbestên xwe çêkiriye. Wate, gûman têde nîne " her helbestek bi xwe ji hêmareke wêneyên tevlihev pêkhatîye. Ew jî piştî ku di stûdyoya dilê helbestvan de liviya û derbasî ser rûpelan bûye û piştî guhertinê din yên hunera ciwankariyê li ser derbas bûye" ( Mûhsin, 1979, s. 91).

Tevî çêbûna wêne jî bala rexnegiran jî ji xwe re kişandîye û bûye aliyê girîng di pîvana rexneyê de. Li vir digihin wê dîtîne ku rexneyê peywendîyeke xûrt bi wêneyê re heye û helbest jî weke hunereke sereke ya wêneyê ji wê peywendiyê

bêpar nebûye. Ji ber ku " wêne ciheke bingehîn di hîmê avakirina helbestê de girtiye û amrazeke ji amrazên helbesta nû ku helbestvanên nû di hîmê qesîdeyên xwe de aso, cûdahî, dîtî û nêrînên xwe têde desteber dike. Bi sedema wêne helbestvan hest, bîr û bîranînê xwe bi şêweyêke hunerî pêktine û bi rêya wêne dîtî û nêrînên xwe yê taybet berçav dike" (Kemal, 2003, s. 160). Lewra wêne û mûzîk dî amrazên girîng in ji bo çêbûna helbesteke ciwan. Bi vî rengî, wiha li teksta helbestê dike ku şêlo û nezela be, bibe sedema ku wêneyê helbestê dî wate yan jî zêdetir bide bi teksta helbestê. Bi taybetî jî di mijara rewanbêjîyê de, lewra Bowil Vêrlêt (1844-1896) di wê baweriyê de bû " divê girîngî bi wêne û mûzîka helbestê bê dayîn. Ji ber ku ew mûzîk helbesteke ciwan pêktînin. Lewra jî di helbestên xwe de hunereke aso fireh dixwest ku şêlo û nezela be û ji wateya çarçoveya berteng ve ber bi asoyêke bê mewda ve biçe" (Ferhad P. , 2002, s. 159).

Lewra dibînîn helbestvanên xwedî karîn û jêhatî ji ber ku bi başî li nirx û girîngiya wêne têgihîştine lewra her ji serdema rêbaza klasîkî ve hewl daye ciwantirîn wêneyê helbestê bi rêya peyv û hevokan çêbikin daku bibe sedema xemilandina helbestên wan. Her wiha ji bo ku hem tiştê nû çêbikin ku rengvedana wê çaxê be û zarvekirina helbestvanên beriya xwe nebe daku tiştê jî bo ser wê bêdera wêjeyî zêde bikin ku bûye sedema nasandina neteweya me bi gelên din re daku di karwanê helbest û wêjeyê de mil bi mlê neteweyên din gavan bavêjin û paş nekevin. Lewra wiha dîtîye ku wêne sedemeke girîng e ji bo çêbûna helbestê. Ji ber ku bi rêya wêne bandorên zêdetir li ser xwendevan çêdibe, biha û girîngiya helbestê jî zêdetir xuya dibe. Ji ber ku " wêne bi xwe heybet û jiyana helbestê ye. Wate, wêneyê helbestê cewhera hunera helbestê ye û wateya sereke ji wê yekê çêdibe. Ew peyvên beşdariyê di pêkanîna wêneyekê helbestê de dikin tevayî wan peyvên asayî ne lê di encamê de pêkhatîyê ne asayî çê dikin" (Cebar Ehmed Hûsên, 2008, s. 94).

Lewra behsa helbestê tê kirin, wêne weke amrazeke girîng ê helbestê tê dîtî. Nivîskar û rexnegir nikarin paşguh bavêjin. Lewra her yek dîtî û nêrînên xwe hebûye û bi girîng zaniye. Dr. Subhî Bêstanî di gutara bi navê (Meselet El-La

We'î Fî El-Suret El-Şî'riye) de dibêje: "Di mekanîzma wêneyê helbestê de ku ji rastiye bi xwe hatiye wergirtin, tevayî hêzên haydar ji kar dikevin û rê ji bo hêza nestê xweş dikin. Wate, zimanê nest wêneyê helbestê ye ku nabe lêkolîn li ser wêneyê helbestê bê kirin û nest bê paşguhxistin û xwe rastî wê neyînin. Bi vî awayî lêkolîn kurte tîne" (Bnkeî Edebyu Runakbîrîy Gelawêj, 1999, s. 302).

Wate, wêne ew hest, xeyal û soza helbestvane ku bi rêya peyvan dikişîne û dixwaze di helbesta xwe de desteber bike. Ji ber ku ciwanya hunerî di wêne de ye û bi nebûna wêne di helbestê de dibe sedemê ji dest dana beşek ji ciwanî û tama helbestê. Lewra behsa wêneyê hunerî tê kirin, dikarîn behsa hinek corên wêneyan bikîn, yan bi wateyeke din dikare bê gotin ku gelek corên wêneyên hunerî hene. Li vir hewl didin corên girîng ên wêne li cem helbestvan Teyyib Cebbar xuya bikîn ku di helbestên xwe de girîngiyê herî zêde bi wêneyan daye û hewl daye bi xeyal firehî ya xwe ciwantirîn wêne di helbestên xwe de desteber bike. "Wênesazî li cem Teyyib Cebbar girîngî pê tê daye û hertim di helbestên xwe de wêne ji me re dikişîne; wêneyên xwezayê û ciwaniya jinê, agir û avê" (Mihmûd , 2011, s. 8).

### **3.2.2 Wêneyê Tak û Wêneyê Lihevxiştî (Tevlîhev)**

#### **- Wêneyê Tak: (Singularliy Image)**

Wêneyê tak an jî sade biçûktirîn wêneye ku helbestvan dixwaze bi rêya wê mijarê yan jî rewşek taybet û diyarkirî ji me re nîşan bide. Ji ber ku bi rêya wêne zêdetir hest bi hebûna wan rewşan tê kirin ku mebesta helbestvan in. Wate, "wêneyê tak biçûktirîn wêneye ku xwe di tenê wêneyekî de dibîne ku bi şêwazekî ji şêwazan yekîneyeke mezintir çê dibe" (Hawjîn , 2008, s. 59)207 Hawjîn Silêwe Îsa, Binyatî Wêne Hunerî Le Şî'rî Şêrko Bêkes Da, Namey Macistêr, Zankoy Koye, salî 2008, la 59. Wate, gelek caran hêjmareke wêneyên tak di teksteke helbestê de kom dibin û wêneyeke giştî yê tevlihev çêdikin. Her çiqas ev wêneyên tak biçûk jî bin lê rol û bandorên xwe di nava teksta helbestê de dilehîzin. Wêneyê tak di



helbestên Teyyib Cebbar de bi tamamî reng vedaye, gelek caran jî wiha diqewime " ku di çarçoveya rêzekê yan jî nîvrêzekê de wêneyekê tak an jî zêdetir hebin" 208 (Ferhad , 2009, s. 161). Ji bo mînak Teyyib Cebbar di helbesta (Min Hezdekem) de dibêje::

Min Hezdekem

Katê Le Dastan da...

Piyase Dekem.

Tamî Dengî Derga Bikem

Wextê Dekrêtwew Pêwededirê. ( Teiyb, 2011, s. 63).

Li vir helbestvan hest bi bihîstin û tamkirina bihîstinê dike û tamkirin guhertiye û dengê derî dibihîse û tamê pê dide, bi vî rengî helbestvan bi guhertina hestan wêneyekê tak çêkiriye. Wate, guhertina erkê hestekê bi hesteke din a weke hesta bihîstin û tamkirinê, wate tiştê ku tû bi guhan dibihîst erkê wê bi guhan dide. Helbestvan di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de wêneyeke ciwan ji me re dikêşe û dibêje:

Ew Rojey Min Demirim,

Berd... Le Xew Heldestê

Xewnî Seyr Seyr Degêrêtewe

Bo Lîmî kenarî Zê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 10).

Li vir helbestvan bi sedema şêwaza bi kesayetîkirinê ev wêne kêşaye (kevir û lîm) dû tiştên bê canin ji xew rabûn û vegotina xewnê taybete bi mirovan, helbestvan ew taybetmendî (kevir û lîmê) re daye. Bi vî curî helbestvan ev wêne li ser bingehê bi kesatîkirinê kişandiye. Bêgûman helbestvan dizane ku kevir û lîm ew taybetmendî nîne lê ezmûna honandinê û hesta derûnî ya helbestvan bûye

sedem ku fikar û şêwaza bi kesayetîkirinê kiriye amraz ji bo kêşana vê rewşê ku hest pêkiriye. Helbestvan di helbesta (Dîsa Şew Hat) de dibêje :

Oqre Nagirê..

Em Ruhe rut û Recalî Min!!

To Bilêy lem Dûnyaye..

Kesêk Hebê

Ser Derbika.

Le Hegbey Wirdewaley Min?! (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 96).

Giyan (can) tişteke hişmendiye û helbestvan hatiye ji bo ku weke tişteki bixe berçavên kesên hemberî xwe, peyvên rût ligel bikaraniye û berjengên (sifet) desteberiyê pê dide. Wate qebare (kapasite) û madde daye bi can " hinek kes jêre dibêjin wesfa madî. Ji ber ku me'newî weke madî nîşan dide" (Şukiriye, 1989, s. 58). Bi vî corî helbestvan qebare (kapasite) û can bi madde û wêneyek ciwan û balkêş li ser avakiriye. Yan jî di helbesta (Sê Çarîneyên Pênc Xişteki) de dibêje:

Min şayetim!

Be Çawî xom dîm.

Le Rojhelatî Şar.

Koçanî Tebayî û

Defî Nakokiyan,

Dabeş Dekrid. ( Teiyb, 2011, s. 13).

(Tebayî) tişteke hişmendiya wateyiye û ti maddeyî nîne lê Teyyib Cebbar bi rêya hinek desteberkirinê hatiye da ku bike bi tişteke ku xwedî qebare be û peyva (Goçan) xistiye ser da ku taybetmendiya desteberiyê bi (Tîbayê) re bide û wêneyekê ciwan û dilkêş li ser avakiriye, eşkereye ku (Tebayê) ti sengek wê nine.

Lê bi vî corê derbirînê helbestvan seng û qebare pê daye û wêneyek jêre çêkiriye daku di hizra xwendevan de qebareyekê jêre çêbike "bi vî corê helbestvan tiştên wateyî (me'newî) di nava qebareyekê de dibîne û bi şêwazên cûda destebiriyê jêre çêdike" ( Se'îd F. Y., 2011, s. 182).

### **-Wêneyê Lhev Xistî (Tevlî Hev) (Compovnid Image)**

Ji dû wêneyên tak an jî zêdetir pêkhatiye û bi hev re tevlîhev dibin û yekîneyeke mezintir pêktînin. Wêne bi awaye wiha tevlîhev dibin, wate û mebesteke kûr û firehtir nîşan didin. Wate, " wêneyê lihevxiştî coreke ji corên binyata wêne, helbestvan têde bal dikişîne li ser dîtin û nêrîneke aloz, vêca renga dû wêne ji hev bigirin û wêneyekê nû pêkbînin. Lê wêneyê sêyem ku çêdibe tiştêk nûye, yan jî hêjmareke wêneyan li ser hev kom diibin û wêneyekê tevlîhev pêktînin" (Hawjîn , 2008, s. 74). Wate, ev wêneyê tevlî hev ku bi sedema li ser yek kom bûna wêneyên nû çêdibe hizir û mebesteke firehtir desteber dike ku cûdaye ji hizra wêneyên tak ew jî bi sedema wê peywendiya ku ji encama hevgirtina wateyî ya wêneyên tak çêdibe. Helbestvan Teyyib Cebbarê jî bi sedema wêneyên tevlîhevkirî kariye hizrên xwe berçav bike. Ji ber ku wêneyê lihevxiştî wêneyeke aloze, xeyal û fikarek kûr berhem tine. Ji bo mînak di helbesta (Silêmanî) de hêjmareke wêneyên tevlîhevkirî çêkiriye, di wan wêneyan de helbestvan tiştêkî bi hinek tiştên din dişibîne. Wate, şiphêner tiştêke û pê şipandî jî hinek tiştin da ku bi başî mebesta xwe bigihîne. Helbestvan dibêje:

Hejarî.. Wek zam

Wek Seretan

Kolan Be kolan,

Teşene Dekan.

Hejarî Takey..?

Wek Gerdelûl.. Legel Balata..

Lulim Dekeyt û...

Demhênî û Dembey. (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 85).

Helbestvan wêneyeke tevlihevkirî li ser bingeha şibandina tevlihevkirî çêkiriye. Ji ber ku şibhêner yek tişte û pê şipandî jî sê tişte û bi tenê ewzarekî (amrazeke şibandinê ye) her sê şibandin çêkiriye û rûyê şibandinê jî derneketiye.

Şibhêner : Hejarî.

Pêre şibhandî : zam- sereta- gerdelûl.

Ewzar (amrazê şibandinê) : wek

B- Wêneyê Rawestayî û Wêneyê Bitevger

### **3.2.3 Wêneyê Rawestayî – El-Sure El-Sabîte - Fixed Image**

Ew wêneye ku dîmenên wî bi awayeke tabloyek rawestayîye, ti tevger, livînek têde nine, geşbûn û çalakî yên wê rawestiye, berdewamî û livînan bi wêneyan re nade. Wate, " wêneyê rawestayî rengvenade û ti livînek têde nîne û zêdetir nêzîkî raporê ye. Ji ber ku wesfekî rûte û tişteke wiha jêre nehatiye zêdekirin. Lewra ji wateya xwe zêdetir ti xwezatiyeke din nagihîne. Diyare helbestvan vî corê derbirînê ji bo berdewambûna bi cîhana mijarî re bikartîne" (Serdar , 2004, s. 213). Wate, hest û soza helbestvan bi awake reha (mutlaq)bi wêne re tevlihev nabin. Lê bi awayek rêjeyî rola xwe di çêkirina wêne de dilehîzin. Lewra wêneyê rawestayî geşbûn û berdewamiya helbestê têde nine. Lê zêdetir " nêzîkî wêneyek fotografî dibe" (Hitler , 2001, s. 109). Lewra helbestvan wêneyên tiştan bi vî awayî dikişîne ku bi xwe di nava xwezatî, bûyer û karesatan de hest pê dike. Di şeweyê wêneyekê wesfî yê rawestayî de amade dike. Helbestvan di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de dibêje:

Ew rojey min demirim,

Goy Zewî.... Dewestê

Nasurê.

Roj berdewam Debê,

Beyanî, Nîwero, Êware

Wek Yek Çeşin Debê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 21).

Mewdayê tîrêjên vî wêneyî diyarkirîne, ji geşbûnê rawestayê û wêne sînorê xwe derbas nake û ji vê zêdetir firehtir nabe.

### **-Wêneyê Bitevger**

Wan wêneyan li xwe digire ku çalakî û berdewamiya xwe di bizavtin û geşkirina tişt û diyardeyan de heye û tevgera wan nîşan dide. Ji ber ku bizav "curek ji nûgerî û zîndîbûnekê ji bo ser wêne zêde dike û ciwanîyekê jî bi tablo re dide" (Se'îd F. Y., 2011, s. 194). Diyare livîna her tiştêkî di jiyana asayî ya mirovan de li nava xweza û derdorê ji ber sedemekê çêdibe ku bi arasteya wan kiryanan ve girêdayîye ku têdeye û ji geşbûnê nakeve, bi berdewamî di tevgerê de ye û bi sedema wan fakterên ku wêne pêktînin mewdayê wê bi berdewamî tîrêjan dide. Eşkereye " wêneyê livyayî di helbestên kevin de xwe di dû perçeyên malîkek a helbestê de dibîne lê wêneyê livyayî di helbesta nû de hatiye guhertin, ew sînor derbaskiriye, zêdetir ji rêzekê û heya perçe helbestekê yan seranserî helbestê li xwe digire" (Şino, 2007, s. 166). Ji ber ku di helbesta kevin de ku renge ji ber wan asteng û kelem be ku ji bo nivîsandina helbestê hatbûn danîn ku pêwîst bû di her rêzekê yan jî nivîrêzan de hebin.

Teyyib Cebbar jî weke her helbestvanekê din yê nûger û hevçax destek bilind di avakirina wêneyan de hebûye, bi taybet jî wêneyên livyayî ku di geşbûn û tevgerê de ye ji bo mînak di helbesta (Ewe Tanê) de dibêje:

Ewetanê,

Baweşên..

Daway Ba deka

Agir bo Germayî..

Degerê

Aw wêllî Hajeye

Daristan Sêberî.

Dest Nakewê.. ( Teiyb, 2011, s. 48-49)

Li vir helbestvan bi sedema hinek zimanan tevger û berdewamiyê dide bi wêne (daway badeka, degerê, dest nakewê) tevger û berdewamiyê dide bi wêne da ku wêne bi nemirî bi mîne: Helbestvan di helbesta (Ew Şî'raney Wazim Lênahênê...!!) de dibêje:

Em Şî're Wazim Lênahênêt,

Nahêlê Ser Xom kizkem,

Hemîşe Yexem Degirê

Demka Begij Bale Firêda

Demka Begij Cêgîrî û Leqbûnda

Demka Begij Seretatkê da

Nahêlê Larê Bigirim

Şerm Pê Defiroşê. (Teyib, Em Şî're Wazim Lê Nahênê, 2013, s. 8) .

Helbestvan bi rêya hejmarakê karan tevger û berdewamiyê bi wêne dide bi taybetî bi rêya karên (wazim lê nahênê, yexem degirê, pê defiroşê) germî û çoşekê bi wêne dide ku cihgir nabe û li ser tevgera tîrêjdayînê berdewam dibin da

ku rûberê wêne firehtir be û berdewamiyeke zêdetir hebe. Ji ber ku wêneyê livyayî ranaweste û bi berdewamî di geşbûn û weşandina tîrêjan de ye û tîşkên nû dixine li ser helbestê, an jî di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de dibêje:

Şew Wirde Wirde Xoy Depêçêtewe

Detorê

Radeka... Deçête Mizgewtê

Le tirs

Be Dengî Berz Hawar Deka. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 15)

Bi heman awayî li vir jî ciwantirîn wêneyê livyayî ji me re çêkiriye, yan di helbesta (Goranî Ewaney Xewiyan Dezirê) de dibêje:

Wadiyare Newroz Ayînde ye,

Kêş û Serway Agir Têk Deçê.

Bûmelerzeyekî Sengela

Em Devere Degrêtewe. (Teyib, Goranî Ewaney Xewiyan Dezirê, 2013, s. 8).

Dîsa bi rêya karên nava hevokan tevger û berdewamiyê bi wêneyê dide û wêneyek livandî ji me re pêktîne.

### **3.2.4 Wêneyê Hestî**

Ev cîhane tejiye ji tiştên cûda ku derdora mirovan dagirtiye, tiştên madî ber hestên mirovan dikevin, hest û sozan diazîrînin, helbestvan jî di kiryareke hunerî de beşek ji wan tiştên madî bikartînin û wêneyên cûda jê çêdikin. Wate, "wêneyê hest desteberkirina wan wêneyane ku qebare (kapasite), madde heye û cihekî diyarkirî di valetiyê de heye û ber yek an jî zêdetir ji pênc hestan dikeve. Diyare helbestvan wan tiştên ku di xwezayê de hest pê dike bi temamî weke xwe venaguhêze lê hest û soza xwe jêre zêde dike û hewl dide bi awayeke nû berçav

bike” (Serdar , 2004, s. 201). Ji ber ku hest bi sedemeke girîng tê danîn ji bo çêkirin û pêkanîna wêneyê helbesta tejî wate û mebest. Lewra dibînîn helbestvanên nû û hevçax bi karîn û şarezayîya xwe, bi rêya bihev guhertina hestên xwe roleke berçav lîstiyê di pêkanîna wêneyê hest de. Hesbestvan Teyyib Cebbar jî bi hûrî û şêwaza fikara xwe ku lêkolîn li ser alav û keresteyên xwezayê kiriye ciwantirîn û bi bandortirîn wêneyê hest ji mere çêkiriye ku balê dikişîne li ser berdewamya jiyanê. Wekî dibêje:

Min dêmewe bo lat,

Dêmew bo sayeqey gumezey cirîwe.

Dedem le şeqey bal

Defirim bo asîman.

Pêş xwa hafîzî bacî (hetaw)

Gîrfanim pir dekem

Le pîtî narnicî birjaw

Le deştî(xerman)

Serdanî mang dekem. ( Teyyib, 2015, s. 82).

D- Hesta Dîtinê:

Dîtin ji hestên din bilinditire, wate di warê hestpê kirinê de li pêşiya teviya hestên dine. Beşeke mezin a wêneyê hunerî ber vê hestê dikeve. Ji ber ku "Ev hest bi dayîka hestan tê danîn. Reng, hêl û her tişteke dîtî li xwe digire” (Hitler , 2001, s. 126).

Diyare Teyyib Cebbar jî ew hest bi girîng wergirtiye û girîngî pê daye. Vî corî di helbestên wî de rûbereke fireh dagirtiye û eger ligel corên din yê hestan beramber bikîn, dikarîn bêjîn pileya yekem wergirtiye. Wekî di helbesta (Defêrbe) de dibêje:



Ew Asmaney

Salehayê Gîrodey Destî...

Peley Çilkin û Rengî Şîne...

Çon ray Dekêşêt û

Le Serban ray Dexeyt

Çak Xoşey Dekey

Rengêkî Morî kalî Dedeytê û...

Le Şiwênî Xoy Helî Dewasî.. ( Teiyb, 2011, s. 72).

Helbestvan bi sedema anîna hêjmareke rengên (şîn, mor, kal) ji bo nava helbestê, hebûneke desteberiyê li cem xwendevan çêdike û ber hesta dîtîne dikeve, dibe sedema wê yekê ku hesta xwendevan biazirîne. Wate, " hatina reng di wêne de bikarek ji tariyê ve nayê danîn lê bi xwe hilgirê wateyekê ye ku mebesta helbestvan e" (Ferhad , 2009, s. 182). Ji ber ku reng mewdayê dîtîne xûrt û bihêz dike. Merc nîne her helbestvanek bi yek wateyê bi karbînîna lê dikare li cem her helbestvanekê wateyê xwe ya taybet hebe. Helbestvan di helbesta (Roj Jimêrî Mame Xeme) de dibêj:

Şepolekanî Naxim..

Willatêk Wêran Dekat

Natwanim Satêk Lenger Bigirim !

Xemxorêk Niye

Dalxeyekim Dalde Bidat. ( Teiyb, 2011, s. 29).

Helbestvan li vir kovan û azarên hundirê xwe bi pêla deryayê şibandiye. Di bilindbûn û nizimbûnê de ye û nikare bi rawest, eger zêde bike hinek deveran

wêran dike. Bi heman awayî helbestvan xwe bi deryayê şibandiye û azarên xwe jî bi pêla deryayê ku berdewam hundirê wî dihejîne.

### **B- Hesta Bihîstinê**

Wan wêneyan li xwe digire ku ber hesta bihîstinê dikevin û ji bo hizra mirovan têne veguhestin û hest pê tê kirin. Wate, deng ber wê hestê dikevin ku guhan roleke baş di komkirina wan de heye, lewra "baştirîn wesfa helbestê ewe ku hesta bihîstine bike yan jî (werbigire) û bike bi dîtî an wiha bike ku guhdar wiha bizane ku bi xwe aktor e û tiştan jî dibîne û serederiyê pêre dike" (Ebdûllah , 2004, s. 139).

Helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş) de dibêje:

Hezdekem Serçopî Legel Hajey Çemêkda Bigrim

Nek Le Gomêkî Meng Wird Bibimewe

Hezdekem Sazim..

Legell Givey Reşebada Sazbê

Nek be Şineyek...

Blerêmwewe.

Hezdekem Xirme Şeste Baranê, Be Agam Bêne

Nek Le Ber Nimeda Bitwêmwewe. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 74).

Helbestvan bi peyvên (haje, givey reşeba, beşneyek xirme, şeste baran) ciwantirîn wêneyê hesta bihnê bi kameraya hizrî ji me re kişandiye. Lewra " her wêneyek ê helbestê li ser bingehê deng, awaz û mûzîkê hatibe avakirin bi rêya hesta bihîstinê baştir tê wergirtin, hest bi xweşî û ciwaniya wêneyê tê kirin" ( Kerîm, 1997, s. 7). Helbestvan dibêje:

Çon Legel Tabim?

To Pêşwazî Le Hîç Hewrê Nakey

Şîrîxey Samnakî Bruske, Datina Çilekênê. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 67-68).

Helbestvan bi rêya peyva (şîrîxe) ku denge û ber hesta bihîstinê dikeve ciwantirîn wêne ji me re kişandiye, tevî wê yekê jî tevayî peyvên din ku bikaranîne di vê malikê de di xizmeta peyva (şîrîxe) de ne. Ji ber ku helbestvan xwestiye erk bi vê peyvê bibîne .

### **C- Hesta Bêhnikirinê**

Hesteke din ji hestên mirovan ku bi sedema pozê (dîfin) mirov hest bi bêhna tiştên xwezayî û derdorê dike ku " tevayî curên bêhnikirinê li xwe digire" (Hîtler , 2001, s. 126)235 Hîtler Ehmed Hime, Wêney Şîrî Lay Nalî la 126. Ku piraniya nivîskaran bi wêneyê bêhnê bal kişandiye ser Teyyib Cebbar di helbestên xwe de hêjmareke wêneyê bêhndar ên nazik û dilkêş ji me re kişandine. Wekî dibêje:

Min Şayetim:

Be Lutî Xom Bonim kird

Le Bakurî Şar Etrî Hewanewew..

Gullawî Ajaweyan

Defroşt. 236 Teyyib Cebbar, ( Teiyb, 2011, s. 14) .

Helbestvan bi rêya peyvên (er û gullaw) ciwantirîn wêneyê bêhnê ji me re kişandye, bikaranîna peyvên (hewanewe, ajawe) bi peyvên (etir û gullavê) ewqas sînûrê wêneyan diyarkiriye ku xwendevan hest pê dike û li cem wî desteber dibe: Yan jî di helbesta (Min Pêw Wutî) de dibêje:

Min Pêw Witî

Bonî Demî Mang Meke

Toş Wek Ew Xir Debî

Kajî Trîfe Firê Deday. ( Teiyb, 2011, s. 83) .

Helbestvan li ser bingeha şibandînê wêneyê bêhnê çêkiriye, li vir helbestvan daxwazê ji yara xwe dike ku bêhna devê heyvê neke daku heyvê gir û vir nebe. Ji ber ku helbestvan yara xwe ji Heyvê ciwantir dbîne, Lewra jêre dibêje eger maç bikî wê kaja tirîfeyê (ronahiya heyvê) biavêjî, eşkereye tirîfeya (ronahî) heyvê di şevên sahî de gelek bi ciwanî geş dibe lê helbestvan li vir tirîfeya heyvê ji hêjayî yara xwe nizane. Ji ber ku rûmeta yara xwe gelek ji tirîfeya heyvê ciwantir dibîne, yan ji aliyeke din ve amajeyekê ji bo wê yekê ku heyv ji kirête ronahiyê diavêje daku paqij bibe. Lewra li vir daxwazê ji yara xwe dike bêhna devê heyvê neke bila weke wê pîs nebe û gûrza pîs navêje.

Yan di helbesteke din de dibêje:

Wazim Lê Bêne Mal Awedan

Min Le Derewey Bazinem

Hez le jiyânêk dekem..

Ciwan Birjabê. ( Teyib, Bibore Qurban Min Le Derewey Bazinem, 2015, s. 8).

Helbestvan bi rêya peyva (birjanewe) wêneyekê bêhnî kişandiye, eşkereye ciwaniya pijandin amajeye ji bo xwarina bêhna xweş lê helbestvan rasterast bi me re nabêje ku ez jiyanêke xweş dixwazim lê narasterast bi rêya peyva (pijandin) ve daxwaza jiyanêke xweş dike ku dût be ji hemû nexweşiyên jiyanê.

#### **D- Hesta (Çeştin) Tamkirinê:**

Helbestvan bi rêya hesta tamkirinê wêneyên tehil, şûr, şîrîn, şil, zûha û diyardeyên xweş û nexweş ên jiyanê dikişîne, ew hest jî weke hestên din yê mirovan bandora xwe li ser helbestvan kiriye û di helbestên wî de rengvedaye û bûye sedema ku di hin helbestên wî de wan wêneyan bikişîne ku ew jî bandora xwe li ser xwendevan çêdike. Helbestvan di helbesta (Derdewan) de dibêje:

Ba Lewe Ziyatir Tal Nebin

Ba Lewe Ziyatir kal Nebin

Takey Rastgoytan Lê Debête Girê? (Teyib, Derdewan, 2016, s. 7).

Helbestvan li vir narazîbûnê li hemberî desthilatê nîşan dide û daxwazê jê dike ku di xizmeta gelê xwe de bin. Lewra bi rêya her dû peyvên (tal û kal) ku ber hesta tamkirinê dikevin, wêneyekê tamkirinê kişandiye, ew jî tevî ku peyameke ji bo haydarkirina desthilatê da ku ji xewa xafletê şiyar bibe.

Yan jî helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş) de dibêje :

Qîbley...ladêy ew binareye

Dirext û Dewenî Qerax Çeme

Çiyay befru kanyawî şîrîne . ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 69).

Muhbeta niştîman di dilê helbestvan de pengaye û tevaî cihan bipîroz dibîne ta digihîne asta pîroziya qibleyê û bikaranîna peyva (şîrîn) wêneyek ê tamkirinê kişandiye. Lewra helbestvan ti tiştêkî ji ava kaniyên niştîmanê xwe şîrîntir nabîne, ew jî ji bilî ku wêneyekê hestê dîtîne di vê mînakê de bi awayeke eşkere xuya dibe û helbestvan her dû wêne bi hev re kişandiye, helbestvan di beşeke din ya helbestê de dibêje:

Şîwenêk Bo Êwaran Degêrim

Taku Le kefî Tallî Nîwe Şew da..detwême. (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 75).

Diyare hatina êvarê û tariyê li cem helbestvan demeke nexweş e. Ji ber ku di wê demê de bi tena serê xwe dimîne û zêdetir bi nava jan û naxweşiyên ve diçe. Lewra helbestvan ji bo rewşa xwe digirê, helbestvan hêstirên xwe ji talî û nexweşiyên bi kefa deryayê şibandiye, piştî helbestvan berdewam dibe û dibêje (lenaw firmêskakanî xomda detwême) wate ez di nava hêstirên xwe de dhêlim

û bin dikevim û her şîne dikim digirîm. Wate helbestvan bi rêya anîna peyva (kefî tall) wêneyê tamkirinê kişandiye.

### **E- Hesta Dest Lêdanê**

Ji wan wêneyan pêkhatiyê ku bi sedema destlêdan û berketina mirovan hest pê tê kirin weke (germ, sar, nermî, reqî, gir, hulî, şil, zûwa û hrwkd) ev curên wêneyan bi astek kêmtir di helbestên wî de dûbare bûne bi beramberkrina tevî wêneyên din, tevî wê yekê jî girîngiya xwe her bi wî wêneyî jî daye.

Helbestvan di helbesta (Defêrbe) de dibêje :

Bo Ewey Hemîşe.

Leşit Nerm Bêt,

Çon Bodirey,

Aw Wişkewe bû

Le Xo Dedey. ( Teiyb, 2011, s. 74-75)

Bi rêya peyvên (nerm û hişk) wêneyê hestê dest lêdanê kişandiye û wêne ketine nava çarçoveya hesta berketnê. Helbestvan di helbesta (Min Demewê) de dibêje:

Min Demewê

Mîwandaî Sermaw Germa Bikem

Bo Malewe. ( Teiyb, 2011, s. 85).

Helbestvan ji bo xemilandina helbesta xwe peyvên (Serma û Germa) li pey hev aniye û bûye sedema çêbûna wêneyekê berketinê û dikeve nava çarçoveya hesta dest lêdanê. Helbestvan di helbesta (Dîsa Şew Hat) de dibêje:

Xudaye..

Çî şitê dadim dedat?

To bilêy dasakê..

Ruhî herasan û lalî min?

Lenaw gelay nermî kitêbda .

Ya bawesî germî kiçê? (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 101-102) .

Helbestvan wêneyên (Nerm, Germ) bikaraniye, peyvên din jî di xizmeta wan dû peyvan de haine daku erk bi wan bide û wêneyekê berketinê kişandiyê. Diyare helbestvan weke xwendevanekê gelek ji pirtûkan hes kiriye. Lewra hertim rûpelên pirtûkê bi hembêza keçan şibandiyê. Ji aliyê nermî, germî û xweşiyê ve. Hinek caran dû hest an jî zêdetir beşdariyê di kişandina wêneyên helbestî de dikin. Ji bo mînak helbestvan di helbesta (Binu Ey Yar) de dibêje:

Girêy gencî (giley),

Turey hel da..

Giloley zibrî (îreyî).

To binû xewn bibîne,

Xewnî tam xoş.

Bese îtir.. Wirk megre,

Giwê radêre..

Bo girugalî (şêneyî)

Xot bişo..

Be Gulalî (Sadeyî).

Bihonewe..

Desrazeyî (pêkeweyî). (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 88-89).

Helbestvan tevayî curên wêneyên hest di vê helbestê de kişandiye û bi rêya peyvên (girêy genc) ku ber hesta dîtînê û (giloley zibir) ber hestê dîtîn û berketinê û (tam xoş) ber hesta tamkirinê û (gir û gal) ber hesta bihîstinê û (gulaw) ber hesta bêhn kirinê dikevin. Eşkereye mebesta helbestvan di civandina wan hemû wêneyên hest de di hinek nîv rêzan de zêdetir ji bo xemilandina helbesta xwe bûye, tevî ku karîn û şîyanên xwe jî nîşandaye di çîna peyv û wêneyên hunerî de.

Helbestvan di helbesta (Em Şî're Wazim Lê Nahênê..!!) de dibêje:

Zor Car Hezdekem Derga Le Ser Xom Dabixem.

Ne Giwê m Le Deme Qalêy Sêberû Xoretaw Bêt .

Ne Çawim Be Çarey Naçarî Bikewêt.

Ne Tamî Derfet Bizanim

Ne Hest Be Şêy Deng Bikem. (Teyib, Em Şî're Wazim Lê Nahênê, 2013, s. 8).

Helbestvan di vê helbestê de dixwaze behsa bêzarî û bêçareserîya xwe ji wê jiyana ku têdeye ji me re bike. Lewra naxwaze tu kesekî bibîne û derî li ser xwe dadixe û xwe dûrî her kesekî dixîne daku ji vê zêdetir neweste, helbestvan bikanîna hêjmareke peyvên hilbjartî kariye tevayî corên wêneyên hestî bikişîne bi rêya bikaranîna peyvên (demeqalê) ber hesta bihîstinê û (çare) wate enî yan jî bi wateya awayê ser û sîma tê ku ber hestê dîtînê dikeve û (bonî kizeba) ber hestê bêhnkirinê û (tamî derfet) ber hestê tamkirinê û (şê) ku bi wateya şil tê ber hesta berketinê û destlêdanê dikeve. Eşkereye mebesta helbestvan ji bo xemilandina helbesta xwe ew hemû wêneyên civandine.

### **3.2.5 Hinek Curên Din Ên Wêneyan**

#### **1-Wêneyê Me'newî (Wateyî) El-Sure El-Me'newiye – (AbSTRACT Image)**

Wêneyê wateyî ew wêneye ku bi hizir û bîran hest pê tê kirin û ber ti yek ji hestên mirovan nakeve û dikeve derveyî sînorê hestên mirovan. Ji ber ku



"wêneyê hizrî wêneyeke ji derûna mirovan desteber dibe ku ji derve ji bo mejî hatiye û wiha derdikeve ku di rastiye de wêneyê hizrî yê wî tiştî bi xwe ye" (Şino, 2007, s. 174). Wate, wêneyê wateyî desteberkirina hest, soz û xwestekên mirovane ku xwezatî û derdor gelek bandor li ser hene. Ji ber ku " Eger wêneyê hestî ber yek ji hestan bikeve wêneyê hizrî ber tu yek ji hestan nakeve" (Aso, 2007, s. 109). Eger li gorî vê dîtin û nêrînê be "wêneyê hizrî ev wêneye ku helbestvan di hizra xwe de texmîn dike" (Serdar , 2004, s. 120).

Ji bo mînak; helbestvan di helbesta (Serdemanê Tarîkî Spî Bû) de dibêje:

Serdemanê Dinya Zor Ciwan Bû

Zewî Hêlaney Gul,

Încaney Mirwarî

Sebetey Pepule,

Qozaxey kipî bû

Asman.. Baxî Tîşk

Desmalî Tirîfe

Guldanî Estêre

Tarîkî Spî bû. ( Teyib, 2015, s. 78).

Eve yeke ji wan afirandinan û ciwankariyên helbestên Teyyib Cebbar ku rê bi hizra xwe daye weke çemek biherike nava cîhana honandinê. Li vir (zewî hêlaney gul, încaney mirwarî, sebetey pepule, qozaney kipî bû, asman baxî tîşk, desmalî tirîfe, guldanî estêre, tarîkî spî bû) ev hemû wêneyên hizrî yan jî wateyîne ku di helbesta xwe de kişandiye û aliyê hundirî yê mirovan desteber dike. Wate, helbestvan bi corekî wêna dike û lihev dixe ku di rastiye de nabin û nîne tenê di derûn û hizra helbestvan de rû didin. Aliyê ciwankariya wê jî her ji wê derê ve

çavkanî digire ku ji derveyî hestên mirovan balê dikişîne li ser wêneyên hizrî yan jî wateyî.

Helbestvan di vê helbestê de erd dike qûpik (kavil) ya bêdengiyê ku bi hêl û rengan mehal e, ew wêne bête kişandin, helbestvan kariye bi rêya hizra xwe hêjmareke wêneyên sihirbaz ên bilind yek li pey yek pêşkêş bike. Wate ji heman wan tuxim û mijaran pêkhatîne ku di rastiye de hene lê di bi hev re di girêdaneke nû de di asteke hizrî ya wiha de ku di rastiye de ti caran çênabe, di demekê de bi zimanê hesta hundirî mirovan (zimanê honandinê) dikare û rastîne. Wate, "teveyî ew wêneyên ku helbestvan di vê malika helbestê de amaje pêkiriye, bal kişandine ji bo serdem û çaxên berê dema ku erd hêlîna gulan û qûbik bêdengiyê bû. Her wiha amajeyê ji bo jiyana sade û sakar ku weke niha pêşkeftî nebû, bi beramberkirina tevî ew rastiya ku em niha têde dijîn ku jiyana bi sedema pêşveçûnê, zanist û teknolojiyê gaveke rasterast ji bo ser jîngeha xweza û bigire heta ji bo ser hebûna mirovatîyê jî" (Sedîq, 2014, s. 10).

## **2- Wêneyê Şibandînê**

Yek ji hunerên rewanbêjîyê, her ji kevin ve ji bo mebesta bi zelalî derbirînê hatiye bikaranîn û helbestvanan weke hunereke girîng lê nêriye û girîngî pê daye. Hêjmareke wêneyên hunerî li ser avakiriye û li cem helbestvanan ji tevayî hunerên din girîngitire. Ji ber ku karê wê hunerê eşkerekirina wan taybetmendiyaneyê ku di tişteke de hatine veşartin bi sedema tişteke din ku heman taybetmendî têde hebe tene zelalkirin. Ji ber ku mirov dema tişteke bi tişteke din dişibîne û bi hev re dike hevbeş dive taybetmendiya wî tiştî zelaltir be ji bo ghiştina bi wate û mebesta wî tiştî. Wate, "şibandin weke hunereke rewanbêjîyê tişteke nîne ku taybet be bi ziman û nivîsandina neteweyekî lê cihek berfireh di nivîsandin û axaftinê neteweya Kurdî de jî girtiye. Weke behreyeke zigmakî û giştî di derbirîn û balkişandinê de, gelek caran kesên nexwandevan jî bi rêk û rewanî balê dikişînin li ser wê behreyê daku endazeya şîrîniya xwarinekê bizanin, dibêjin weke hingivîn e" (Mûhsîn, 2013, s. 121).

Lewra ew dû tiştên ku şibandin di navbera wan de tê kirin nabe di hemû tiştan de wekehev bin lê divê hinek taybetmendiyan cûda hebin. Ji ber ku eger wiha nebin wê bibin yek tişt û şihandin di navbera wan de nayête kirin "ji ber ku şibandin yeke ji wan şewazên ku wêneyê hunerî li ser tê avakirin û helbestvan bi şeweyeke gelek fireh bikartînin. Ev corê wêne pişt bi dû aliyan girê dide, ew dû alî di hinek tiştan de weke hevin, di hinekên din de cûdane û peywendiya navbera wan dû aliyan peywendiyeye hemberîkariye" (Serdar , 2004, s. 288).

Teyyib Cebbar bi rêya hunera şibandinê, wêne dikişîne û ew berjengên (sifetên) hevbeş ku di navbera tiştan de hene zelal dike û bi rêya wê peywendiyê wêneyeke ciwantir û balkêştir xuya dibe. Ji bo mînak di helbesta (Serdemanê ... Tarîkî Spî Bû) de dibêje:

Hendê car.. Şa'îr : Şihîner

Tayî sard damdegirê kirm : pêre şibandî

Sê jeme wek kirm, wek : Ewzare

Qur dexom. (Teyyib, 2015, s. 91). Xwarina heriyê: Rûyê şibandinê ye

Helbestvan xwe şibandiye bi kirm, bi sedema nexweşiyên derûnî tayên sar leşî wî digire. Lewra helbestvan her xwarinekê dixwe weke wê ye ku heriyê bixwe. Ji ber ku ti tamedê jê nagire, yan jî laşê xwe ji sarbûn û bêhêziyê bilaşê kirm şibandiye. Li vir " xwendevan naçar dike eger ji bo tenê çirkeyekê jî be li rewşa wî binêre, wêne bike û biçê nava çermê kirm û bi helbestvan re heriyê bixwe" (Necmedîn F. E., 2011, s. 27).

Helbestvan di helbesta (Silêmanî) de dibêje:

Le şarêkî pir bereket da .

Hejarî...wek ba hejarî: Şihîner

Be arezûy xoy ba: pêre şibandî

Gerek be gerek desurêtewe wek: Ewzare

Le dergay zorbey desurêtewe: Rûyê şibandinê ye

Malekan deda. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 84).

Helbestvan bi rêya hîlbijartina hinek peyvan wêneyekê şibandinê çêkiriye.

Helbestvan di helbesta (Tepelû) de dibêje:

Nîwero bû

Tepelûy Ciwan û Êsk Suk

Tepe lûy Ciwan û Şeng Wek Bûk

Bû be komellî Xolemêş . ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 35).

Tepelû ew gunde ku helbestvan piraniya jiyana zarokatiya xwe têde derbas kiriye. Lewra li cem helbestvan gelek qedirgiran û birêz bûye, ji ciwanî û can siviikya wî bi bûkê şibandiye, helbestvan bi rêya hîlbijartina hinek peyvan ciwantirîn wêneyê şibandinê kişandiye.

Tepelu: Şibhîner

Bûk: pêre şibandî

wek: ewzar

ciwanî û êsk suk: Rûyê şibandinê ye.

### **3.3-Zimanê Şî'ri**

Ziman jî komeke deng û peyvan pêkhatiye û wateyê digihîne, bi wê sedemê mirov ji hev têdigihin. Her bi sedema peyv û ziman bûye Xûdayê mezin mirov ji candarên din cûda kiriye. Wate, ziman rola berçav di geşkirina jiyana mirovan de heye û bûye beşek ji pêdiviyên sereke yê mirovan û nikare jê cûda bibe, bi şeweyeke giştî ziman sedemeke ji bo gihandina dîtin û nêrînên hundirî mirov ji bo derveyî xwe, ji ber ku " Eger ziman neba civaka mirovayetiye jî bi vî

awayî çênedibû, lewra ew peywendiya ku ziman bi hundirê mirov û dike û tiştên derdor re çêdike ji sedê sed dîtin û nêrîna her kesekê wê civakê heman dîtin û wate ji bo yekîneyên ziman nîne, li vir xuya dibe ku her mirovek li gorî asta çand û têgihîştina xwe dikare peyvan bi wateyên zêdetir û xûrtir nixandinê jê re bike” (Letîf, 2009, s. 105).

Lewra dîtin û nêrînên mirovan û dûbarekirina bîr û dîtin bi qalib û şêwazên cûda dibe sedema zêdetir geşkirina ziman. Ji ber ku ziman bi berdewamî di guhertin û nûbûnê de ye, mirov piştî derbirîn û axaftinên xwe dibe beşek ji dîrokê. Lewra ewa ku niha derdibire nabe carek din bi heman form û wate dûbare bike, ji ber ku her dûbarekirinek hinek wateyên cûda li xwe digire. Ji ber "Ziman peyrewêke dengiye ji bo ji hev têgihîştina bi rêya hevokan cûda, gotin û bihîstinê” (Mihemed M. F., 1990, s. 104).

Ziman roleke girîng di civaka mirovayetiye de dilîze û şaristaniyete ava dike, faktoreke ji bo gihandina çand û şaristaniyeta gelekî ji bo geleke din. Ji ber ku "bê hebûna ziman şaristaniyete berdewam nabe" (Mihemed M. F., 1990, s. 3).

Lewra mirov ji wê dema ku ziman bikaraniye karînen derbirîna deng û peyvan peyda kiriye û ketiye xema wê yekê ku bikare bi derdora xwe re serederiye bike û bi rêya derbirînan ewa ku di hundirê wî/wê de heye bi derdora xwe re rabigihîne, ew jî bûye sedema xûrtbûna peywendiya civakî, her ziman bû karî mirovan ji jiyana sade ya nava şikeftan veguheze ji bo jiyana malbatî, hoz, eşîrî û piştî gund û şaristanî, ew bi tevî ku ziman sedem bû ji bo tevlihevbûn û gihiştina mirovan bi hev re, di heman demê de sedemek jî bû ji bo mirov karên girantir û mezintir li stûyê xwe bigire ew jî xwe di pêşveçûna jiyana şaristanî û civakî ya mirovantiyê de dibîne. Wate, em dikarin bêjin ziman bi qasî cihê xweşbextiya mirovan bû ji mirovan re ewqas jî cihê bargiraniyê bû ji mirovan re.

Eve weke zimanê axaftin û têgihîştina asayiye di asta civakî de lê zimanê tuxmên wêjeyê cûdaye, xûrt û aloztir e û bi hêsanî mirov lê têngahin. Ji ber ku tuxmên wêjeyî bi taybetî helbest ji komeke peyv, hevok, zarav, awaz û mûzîkan pêkhatiye. Lewra "her dema ku zimanê honandinê karî xeyal, bîra xwe û fantaziya

helbestê li hemberî darijtina helbestê veke ew qas jî şêwaza helbestê ber bi hîmê zimanê helbestê ve diçe” ( Necat, 2013, s. 113).

Ji ber ku ew peyvên ku helbestvan bi kartîne, heman ew peyvin ku di axaftina asayî ya rojane de têne bikaranîn lê helbestvan bi soz, fikar û xeyala taybet bi xwe re tevlihev dike û peywendiiyeke nû di navbera peyvan de dibîne û bi awayeke cûdatir amaje pê dike. Ew jî ji bilî ku peyvan bi corek wiha bikartîne ku hilgirê soz, awaz û mûzîkeke taybet bin, bi vî corî "ziman di helbestê de rûyek taybet werdigire, erkê helbestvan li vir bilindkirina asta zimane di şêwaza giştî de û guhertine ji bo dengê taybet, bi rêya hîm û behreyeke taybet bi xwe dibîne û organîze dike” ( Azad E. K., 2008, s. 9). Lewra helbestvanê xwedî karîn hewl dide zêdetir ji wateyekê ji bo peyvan bibîne, cûda ji wê wate û ferhenga ku heye û bikare bi peyvan re bilehîze ji bo avakirina teksteke helbestî ya ciwan û bibandor. Wate, lehîstina bi peyvan ji bo pêkanîna teksteke helbestî ya ciwan rol û bandora xwe heye lê nabe wê yekê jî ji bîr bikîn ku "her lîstineke di nava ziman tekstê de bi asta helbestbûnê nagihîne” ( Fûad, 2007, s. 104).

Helbestvanê xwedî karîn kar ji bo wê yekê dike ku peyvên kevin di helbestên xwe de bikarbîne lê bi wate û ramanên cûdatir ji wateya ferhengiya wê ku di berê de hebû. Ew jî dibe sedema parastina peyvan û ji navçûnê têne rizgarkirin û carek din bi wate û ramanê nû têne nava ziman. Ji ber ku helbestvan ew peyv ji nava civakê wergirtiye û afirandinekê di wateya wan de dike. Ji ber ku taybetmendiya helbestê di ziman de derdikeve.

Lewra divê helbestvan ew sîhîrbaz (cadokar) be ku can dide bi peyvan û zîndîbûnê pê bide daku asta helbestê nizim nebe. Wate, zimanê helbestê biha û girîngiya helbestê zêdetir dike û bandoreke temam li ser xwendevan bicih dihêle. Lewra helbestvan bi awayeke cûdatir ji bingeheke din ên wêjeyî bi giştî û helbestê bi taybetî zêdetir girîngî bi zimanê helbestê daye û weke bingeheke sereke di helbestên xwe de lê nêriye. Lewra helbestvanên her qonaxekê ji qonaxên helbestê bi sedema zimanê wan yê helbestî tînan naskirin û pile û asta helbestvaniya wan derdikeve. Ji ber ku "ziman aliyeke girîng e pêşveçûna wêjeyê

ye û bi taybetî jî yê helbestê ye. Lewra dibînîn hêjmareke teoriyên taybet bi lêkolînan li ser ziman di dîroka zanista rêziman de hatine rojevê" (Saman, 2010, s. 203). Ji ber ku ziman beşeke serekeye ji pêkhate û naveroka helbestê û erkê qiseker di zimanê helbestê de girane û helbestvan bi hizreke hûr û hesteke nazik dixwaze soz û hesta xwendevan biazirîne. Lewra Arîsto dibêje "Zimanê helbestê ji zimanê asayî cûdaye û ew di vê baweriyê de ye ku helbestvan ew maf heye zimanêke taybet bikarbîne ku ji zimanê asayî yê berbelav ê nava civakê dûr be" (Pexşan, 2009, s. 135).

Di bin siha wê dîtîne de digehin wê yekê ku Zimanê helbestê divê hinek bingehên taybet bi xwe hebe, cûdatir be ji zimanê rojane yê xelkê. Ji ber ku "zimanê helbestê rewşek bicih û neguhertî wernagire û hertim di guhertineke berdewam de dibe. Ji ber ku li gorî guhertina rewşa derûnî ya helbestvan derbirînên wî/wê yên helbestî jî têne guhertin" (Perêz, Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Niwêkirdinewey Şî'ri, 2006, s. 284). Lewra axaftin li ser ziman bigiştî û zimanê helbestê bi taybetî behseke aloz e û her yek ji rexnegiran û nivîskaran dîtîn û nêrînên xwe yên taybet li ser zimanê honandinê heye.

Lewra Mihemed Marûf Fetah di vê baweriyê de ye "ku bi pîvana zimanê axaftina rojane û zimanê çîrok û zanistê, zimanê honandinê diyardeyeke pir aloz e. Ji ber ku rêz ne li dem û ne jî li cih û ne li rêziman, rênivîs, ne bihaneyên watesaziyê nagire" (Mihemed M. F., Zimanî Şî'rî Riwaneyekî Zimanewanî û Pragmatîkî, 2007, s. 43). Her wiha tevî wê yekê jî hinek di vê baweriyê de ne "divê helbestvan hewla dîtina ziimanek nû bide lê nabe rêzimanê peyrew neke" (Mihemed S. H., 2004, s. 5). Wate, divê helbestvan di çarçoveya giştî ya rêziman de binivîsîne û nabe distûrên rêziman têk bişkîne. Wêjeya Kurdî jî weke wêjeya gelên din bi taybetî zimanê honandinê li gorî çax û qonaxan guhertin bi serde hatine. "Ji ber ku her guhertinek ji aliyê siyasî, aborî û çandî ve rû dabe bi awayeke rasterast an jî nerasterast bandorên xwe li ser zimanê honandinê û geşbûna wêjeyê hebûye. Lewra zimanê honandinê jî weke yek ji bingehên sereke yên helbestê, helbestvan bi awayeke taybet serederiyê pêre dike û bê hebûna wê bingehê nikare tu

helbesteke balkêş berhem bîne. Lewra zimanê honandinê zimanek zîndiye û bi pêwera xeyal tê pîvandînek nek pêwera hiş û mantiq” ( Teyib, Zimanê Şîr, Lêkolînewe, 1996, s. 6-7). Ji ber ku helbestvan dibin siha xeyalê de hêjmareke peyv û destepeyvyan derdibire ku pêwera xeyal nebe ti deman bi pêwera hiş nayête pejirandin. Ji bo mînak helbestvan di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de dibêje: Ew rojey min demirim,

Lepêçî kolaneke man da,

Aw.. dexilîskê û bepişta dekewê.

Dest û pê derdeçê.

Natwanê serberz katewe.

Natwanê biculê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 5).

Eşkereye Teyyib Cebbar her ji destpêka hatina wî ji bo nava cîhana honandinê girîngiyeke taybet bi zimanê helbestê daye û li gorî wan ezmûnên ku wî hebûn hewl daye bi awayeke cûdatir ji helbestvanên din serederiyê bi zimanê honandinê bike. Hewl da zimanê wiha berhem bîne ku cihê wî zimanî bigire ku helbestvanên berî wî bi karaniye û bi awayeke balkêş bi peyvyan re bilehîze, Mihemed Kurdo dibêje "Ev helbestvan, peyvyan bi awayeke wiha dixîne pey hev ku di berê de ti caran bi vî corî me nedîtibûn, li cem wî helbestvanî, peyv dareke weke xwe nayête çandin lê bi (darên peyvên) din re fetrûm (aşî) dike” ( Mihemed K. , Zimanê Şîrî Lay Teyib Cebbar, 2015, s. 8).

Wate, helbestvan gelek bi zîrekî kariye peyvyan cûdatir ji wateya ferhengiya wan bi karbîne û kar û erka din bi wan peyvyan bide, ew ziman jî ku helbestvan bi kartîne, ta astek bilind balkêş û taybet e. Lewra zimanê helbestvan zimanek herî kûr dibire û hewl daye bi kêmtirîn peyv wateya temam bigihîne. Lewra "yek ji bingehên sereke yê ziman kurtkirina zimane (îqtîsad li luxe), helbesta baş ewe ku di bîranînê xeyalê de bimîne û hertim vebêje. Ne vexwendin hate temamkirin bête ji bîrkirin” ( Teyib, Geran Be Diway Îqaî Wîşeda, 2015, s. 59). Wate,



yek ji mercên helbesta serkeftî kurt birîne di ziman de ew jî dibe sedem ku tekst bi nemirî bimîne. Lewra nivîskarê mezin yê Erebi (Haşim Salih) dibêje: " Bi tenê qesîdeyê balkêş bes e ku helbestvan bi nemirî bimîne" (Necmedîn F. E., 2016, s. 83).

Lewra eger tekstên helbestên helbestvan bixwînin wê hinek helbestên balkêş bibînin ku helbestên nemir in û helbestvan bi nemirî dihêlê. Ji ber ku "ziman di piiraniya helbestên her sê komeleyên (Serdemanê Tarîkî Spî Bû) de zimanek sadeye ku ew jî gihandina teksta helbestê bi wergir hêsantir dike" (Selah, 2016, s. 8). Zimanê honandinê roleke temamkar dilîze di gihandina wate û mebesta helbestê de lewra helbestvan zimanek herî sade bikaraniye, gelek bi rêk û pêkî peyvan diçine û bi hev re girê dide daku xelk bi hêsani ji wateya helbestan tê bigihin. Lewra bi karanîna peyvan li cem helbestvan cûdaye ji bikaranîna kesekê/a asayî, wate "zimanê sade di helbestê de belgeya rastbêjiya helbestvane û rastgotinê jî bingeha helbesta zîndiye. Ji ber ku ziman rewanî ya helbestvan nîşana (dinya dîtina) zelal û xuya ya jiyana helbestvan bi xwe ye ku bi vê rêyê bikare kesê/a beramber têbigihîne û bandora xwe li ser çêbike, ew jî rewatiyê bi wê peyama honandî dide ku helbestvan bi erka ser milên xwe dizane, (Teyyib Cebbar) di vê rewatiya ziman de sûd wergirtiye ji bo gihandiina wê peyama ku bi xwe dixwest" ( Hisên, Ewrojey Min Demirim Lêkolîneweyê Le Ser Şîrêkî Teyib Ceba, 2017, s. 90). Wate, helbest li cem Teyyib Cebbar ew peyame ku bi awayêke ratbêj bi rêya derbirîna peyvên sade arasteya xwendevanan û guhdaran dike .

Lewra helbestvan bi hundirî xwe re rastbêj bûye û tu deman zorî li xwe nekiriye ku helbestan bêsedem binivîse, li cem helbestvan ciwantirîn û rastbêjtirîn helbest ewe ku ji hundirê helbestvan derbikeve û bi peyvan derbibire.

Lewra "Teyyib Cebbar di serederîkirinê de bi wî (zimanê honandina) sade ku dixwaze bi rêya wî bargiraniya li ser milên xwe pê sivik bike û hinek ji dilgiraniya xwe pê birevîne û xwe dilxweş bike. Ew zimanê sadeyê di karîna her kesekê de nîne û her kes nikare bi ceribîne. Ji ber ku ew jî behreyê ji hemû kesan re nabe û her kes jî ew karîna jêre peyda nabe" (Hisên Befrîn, 2017, s. 89). Wate, peyv li cem Teyyib Cebbar ewqas girîng û mifadar e ku renga her ew bi xwe

bikare çawan bikarbîne û serederiyê pê bike, lewra her kes nikare bi hêsanî bikarbîne, ew bi awayeke wiha peyvan dadirêje ku bêhn û berhemê helbestvan xuya bikin. Ji ber ku Teyyib Cebbar jiyan û hebûna xwe tevî peyvan dike û di nava tekstên helbestvan de reng rêj dike.

### **3.3.1 Peyvên Kurdî yên Resen û Nû**

Teyyib Cebbar di dawiya salên şêstan û destpêka salên heftêyan de hate nava cîhana honandinê. Ji ber ku helbestvan jiyê xwe yê zarkotî û destpêka jiyê xwe yê lawîniyê weke piraniya helbestvanên din li gund derbaskiriye û eşkereye ku jiyan gundan gencîneyeke (xezîne) mezine ji bo bikaranîna peyvên Kurdî yên resen. Lewra helbestvan di wê qonaxê de gencîneyeke baş ji peyvên Kurdî yên resen kom kiriye û pê aşna bûye ku di serdema xwe ya honandinê de bi hêsanî kariye di helbestên xwe de bi bê xwe westandin û geriyan li pey wan peyvan bikarbîne. Ew jî tevî ku helbestvan her ji jiyê lawîniyê ve hinek helbestên helbestvanên wêjeya klasîkî û helbestvanên din xwendiyê û çûye nava kûratiya gencîneya mezin ya folklorî Kurdî û aşnayetî bi hezaran peyvên Kurdî yên resen peyda kiriye, bi taybetî ew peyvên ku xem, kovan û nehameyî (nexweşiyên) civaka Kurdan nîşan daye, bandoreke mezin li ser helbestvan hebûye û di hizir û xeyala wî de mane. Wate, jêderên komkirin, hilbjartin û civandina peyvên Kurdî yên resen li cem helbestvan ji dû jêderan pêkhatine:

1-Jiyana sade ya gundan ku gencîneyeke zengîne ji bo peyvên kurdî yên resen.

2-Xwendina helbestên helbestvanên klasîk û helbestvanên din, çîrok, destan, pend û bûxçika Kurdî alîkarî ji bo çêkirina ferhengeke ciwan di mejiyê helbestvan de. Ev tevî ku helbestvan bikarînen xwe pena (hewarê) ji bo komkirina peyvên din biriye ku gelek bi kêmî hatine bikaranîn, ewî kariye carek din wan peyvan zîndî bike û di helbestên xwe de canê nemiriyê pê bide. Ji bo mînak helbestvan di helbesta (Lawandinewey Xolemêş) de dibêje:

Çon le gel tabim?

To rêbiwarî rêgayekî wêllî.

Çon le gel tabim?

To sengerî bîr becê dehêlî.

Nerrûnî rojim bo diyarî dekey...

Ne tarîkî şew.

Nebêdarim dekewêtewe... Nedemkeyte koşî xew.

Çon le gel tabim?

To taku êsta...

Nexalî seretat diyare...ne asmanî kotayî,

To...neko persitî ne tenyayî,

Temenêkî reşî rewî mêmûy,

Bê dilniyayî.

Çon le gel ta bim?

Ta êsta kêlgey bawer nakêlî . (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 66-67).

Ev helbesta ji heşt beşan pêkhatiye, beşa yekem di sala 1984'an de nivîsandiye lê beşên din di sala 1987'an de nivîsandiye ku temamkerên beşê yekemin, tevayî wan peyvên ku bikaranîne peyvên resen yên Kurdî ne ji bilî her sê peyvên (dûa, qîble, tewq) nebin ku peyvên Erebi ne û gelek di zimanê Kurdî de hatine bikaranîn û têne naskirin û wateya wan li cem xwendevan zela û eşkere ye. Helbestvan ew peyv her bi wateya wan ya Erebi bikaranîne, di demekê de ku her peyveke din ya Kurdî li cihê wan bikaranîba wateyên wan nedihatî guhertin û heman mebest dihate bidestxistin. Lewra helbestvan dibêje "Ez di helbestên xwe de gelek bi kêmî bi aliyê peyvên biyanî ve diçim, ew peyvên ku bikar jî tînim sîmayek Kurdî li xwe kiriye" (Teyyib Cebbar, Havdîtn, Silêmanî, 01.12.2016).

Wate, ew peyvên Erebî ku di helbestên wî de têne dîtin ti bargiraniyekê ji bo têgihîştina xwendevan çênake. Ji ber ku xwendevan ji mêj ve aşnayetî bi wan peyvên re peydakiriye û bigire tam û lezeteke zêdetir bi xwendevan dide. Ebdûlah Tahir Berzincî dibêje: "Di zimanê Teyyib Cebbar de xûrtbûn û baldariyek heye ku digihe wê astê ku peyveke zêde li xwe nagire. Weke çawan di jiyana endazyariyê de hesaba zêdekirin û kêmbûna tapokekî dike, bi heman awayî serekeriyê bi zimanê honandinê jî dike" (Ebdûllah T. B., 2016, s. 88).

Wate, ji xwe pena ji bo ti peyveke zêde nebiriye, bêsedem ti peyveke di helbestên xwe de bi karnaniye.

Peyv li cem helbestvan erk û wezîfeya xwe di helbestê de heye. Ji ber ku helbestvan di vê baweriyê de ye eger her rêzkirina peyvên be wê demê tu wateyek ji bo erkê honandinê û erkê peyvên namîne û dibin axaftineke asayî ya nava civakê. Lewra helbestvan girîngî bi hîlbijartina wan peyvên daye ku erkê helbestê pê tê spartin. Mihemed Kurdo li ser wê helbestê dibêje: "Her bi rastî û ta astek mezin (Lawandinewey Xolemêş) ji pêdagotina xweliyê pêktê. Mebesta min ewe xala diyar têde zêdetir ewe ku gotareke honandî be. Gotarek hilgira rehendên siyasî bi dirûşmeyên neteweyî û nîştîmanî ve" (Mihemed K. , 2015, s. 8).

Helbestvan di helbesta (Ew Rojey Min Demirim) de dibêje:

Ew rojey min demirm,

to pê xo....

Dexlête ser zewî.

Mang...fiş debêtewe.

Estêre...dêne xwar,

Çiwar dewrî şar degirin,

Amadebaş,

Çek dêne serpê.

Ew roj...

Zewî... Henawî dête jan û

Deawsê .

Asman...nizim debêtewe,

Dar û berd...

Henasey siwar debê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 3-4).

Yek ji helbestên balkêş ên helbestvane ku ji dû beşan pêkhatine û bi Kurdiyeke resen hatiye nivîsandin û tenê hinek peyvên Erebi têde hatine bikaranîn, weke (elhed, kifin, Nuh, çaket, pantol, kiras, dûkan, kitêb ,metbex, qelem, mêz, rebî ,cenet ,hetîw, betanî, doşek, çerçef, cizdan, erebane, ne'let, mexlûqat, nisan, refe, şî'r, paket, sabûn, firçe û me'cûn) helbestvan bi awayeke şarezayane peywendiya navbera peyvên rêk dixê û peyvên li cihê xwe datîne. Tevî ku helbestvan bi şarezayî û karînen xwe hinek peyvên nû afirandiine weke (topî xor, aw dexlîskê û be pişta dekewêt, agir le serma delerzê, paşay erşî sedey bîst û sê, tabutekey le tixey mang bê, kifinêkî bobiçinin le pirçî kiçê,şîley wişe, parçeyek pelke zêrîne, berd le xew heldesê,dirext pal dekewê, şax hel dê, rêgawban lul debê, bîranîn ture debê, çem delerzê, şiney tîjî bîr, nermegiyayî semfonya, meqamî kurteçîrok...hwkd ku tenha li cem ti helbestvaneke din nehateye dîtin. Helbestvan di helbesta (Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden) de dibêje:

Bom bas bike.

Babetêkim bo bas bike

Babetî çonyetî...

Destigîrkirdinî netwanîn û

Rifandinî lekîs çûn

Babetî planî...

Şardinewey çawşorî û...

Rêxistnî xelbe xelb û

kemîn danan.

Bo derbaz bûn

Babetî xistne gerî..

Germ û gurî û..

Ke wilkirdinî kem terxemî... ( Teiyb, 2011, s. 32-33).

Ew helbest ji çar beşan pêkhatiye û di sala 2010'an de hatiye nivîsandin piştê bûye nav û nîşanê dîwana sêyem a helbestvan û di sala 2011'an de hatiye weşandin. Di wê helbestê de helbestvan tu peyveke biyanî bikarnaniye û bi Kurdiyêke resen û rewan hatiye nivîsandin, yeke ji berhemên balkêş yê helbestvan hêjmareke lêkolîn û xwendina li ser hatiye kirin, çî ewên ku ji aliyê Ebdûllah Tahir Berzincî ve ji bo zimanê Erebî hatine wergerandin an jî ewên ku bi Kurdî hatine nivîsandin. "Helbestvan girîngiyê bi zimanê xwe dide ji bo teqandina karînen xwe û bîranîna wan îlhamên ku hene ji bo çêkirina wêneyên helbestî ku dikevin derveyî sînorê soz û hişan" ('Elwan, 2012, s. 6).

Wate helbestvan bi sedema wê karîna honandinê ku hebû zimanê xwe pêşve biriye tevî ku peyv û zaravên nû yê weke (destgîrkirdin, netwanîn, rifandinî lekîs çûn, şardinewey çawpoşî, berêxistinî xelbe, xelb, kewilkirdinî kemterxemî ,deste paçe , berelakirdinî hewanewe, kêwî pêşêlkarî, teşenedan,gemaroy dabeş bûn) bikaranîne û bi awayeke hunerî yê bilind û ciwan bi peyvên din re gûncandiye. Lewra "li cem Teyyib Cebbar peyv bi wan hêzên xwezayî yê xwe cihê xwe di hevokan de vedikin û her yek ji wan li gorî zînditiya xwe, erkê xwe di rengandina tabloyên helbestê de bicih dike û bala xwendevan ji

xwe re dikişîne” (Selah, 2016, s. 8). Wate, helbestvan bi rêya bikaranîna komeke peyvên nû kariye gencîneya peyvên Kurdî zengîntir bike. Lewra gelek caran helbestvan di bikaranîna peyv û destepeyvyan de ji peyrewa yasayî ya rêzimanî dûrxistiye, lê tevî wê yekê jî çarçoveya sînorê yasayên giştî yên zimanê Kurdî derbas nekiriye. Lewra helbestvan di helbestên xwe de pena ji bo dû curên peyvyan biriye:

### **1-Peyvên Kurdî**

Zimanê Kurdî zimanê şîr yê helbestvan û malbata wî ye. Ji ber ku li malbateke asayî ya nava civaka Kurdî perwerde bûye, lewra her ji zarokatiya xwe ve tevî çand û kelepura Kurdî bûye. Ew peywendiya civakî ku bi derdora xwe re hebûye bûye sedema resenayetiya zimanê helbestvan bi peyvên Kurdî yên resen. Ew tevî ku her ji çaxa lawîniya xwe ve aşnayetî bi folklorê Kurdî û helbestvanên din re bûye û ew jî sedemek bû ji bo tevîbûna wî bi gencîneya mezin a folklorê Kurdî û ewqas zêdetir karînen helbestvan zêdetir kirine. Tevî ku helbestvan li pey peyvên kevin de geryaye û hewl daye carek din bi wateyên nû bi karbîne. Tevê wê hemû yekê jî helbestvan hêjmareke peyvyan di ferhenga xwe de afirandiye ku tenê jî di ferhenga ti helbestvanekê din de nehatîne dîtin. Weke (Sostaw, birincî qaqa, şiley qîje, kiçî cam reş, goçanî tebayî, deqî nakokî, derdewan, keprî qaspe, bonî awirdanewe, meqamî gor, çetrî aweng, şiley wişe, xewnî neman, sabatî xolbarîn, beharî tîj, hawînî zil, payzî xew, nîweroy dir, şewî kal, çem dezirîkênê, şaxî text, herdey nizim, biyabanî sext, deştî berz, şî'î kem xoyî, gizingî wata, rawe çexmaxe û hwd).

### **3.3.2-Peyvên Biyanî**

Teyyib Cebbar di helbestên xwe de kêmtirîn peyvên biyanî (Erebî) bikaraniye, ew peyvên Erebî jî ku bikaraniye, bi dû rêyan bikaranîne:

A- Helbestvan şarezaiyeke baş di zimanê Erebî de hebûye, bandorên helbestên Erebî li ser hebûn, lewra di destpêkê de helbestên xwe bi zimanê Erebî nivîsandiye. Wate, helbestvan bi xwesteka xwe bikaraniye, ew jî ji bo xemilandina

helbestê. Vêca ew peyv bi wateya zimanê Erebi bi xwe bikaranîbe yan jî bi nêzîkatiya wateya Kurdî bikaraniye û sîmayeke Kurdî pê daye.

B- Ola Îslamê sedem bû ji bo bikaranîna hinek peyvên Erebi di helbestên wî de. Ji ber ku bavê wî xwedî hêjmareke pirtûkên olî bû, her çiqas bavê wî nexwande wan bû lê kesên nêzîkî wî ji wî re dixwendin û wan peyvan jî her ji zarokatiya Teyyib Cebbar ve bandor li ser wî çêkiribûn û piştî di helbestên wî de rengvedaye.

### 3.3.3 Xwestî (Mecazî)

Ji wan peyvan pêkhatiye ku ji bo wateya wan a rast û rast nayêne bikaranîn lê ji bo wate û mebesteke din têne bikaranîn. Lewra "xwestiya helbestê jî bi tenê guhertina wateyê nîne di peyvê de. Lê guhertina di xwezatî û curê (wateyê) de jî. Wate, veguhestin ji wateya çemkê ve ji bo wateya soz û azirandinê. Lewra her mecazek ji tariyê, yan jî bikorane xwestiyeke honandinê nayê binavkirin" (Can, 2008, s. 161).

Teyyib Cebbar girîngiyeke mezin bi mecazê daye. Lewra gelek caran ji aliyê helbestvan ve peyv ji bo ferhenga xwe nehatine bikaranîn lê ji bo hêjmareke wate û ramanên din hatine bikaranîn. Lewra bi rêya lêkolîn û şîrovekirin li ser wan peyvan dikarin nêzîkî wateyên wan peyv û helbestan bibin ku di mebesta helbestvan de bûne. Lewra bikaranîna peyvan li cem helbestvan zêdetir ji bo xemilandin, mebest û karînen veşartî yê hundirê peyvan bûye. Lewra tê gotin "Xwestî ya helbestê, yan jî veguhestina zimanê xweyî ji bo zimanê hêmayî, di vê qonaxa veguhestinê de, ziman di asta yekem de (wateya) xwe ji dest dide daku di asta dûwem de serî hil bide" (Can, 2008, s. 162).

Lewra helbestvan bi rêya xwestî (mecazî) hêjmareke mebest û hêviyên taybet ên xwe û gelê xwe derbiriye, weke di helbesta (Nameyek Bo Reşeba) de dibêje:

Le seretay mêjûwewe .

Le zuwewe



Pîşey karwanî em şare

Nesrewtin û pelamare

Zayeley dastanî helçûn .

Nebirawe le...qend îl û pîremegirun .

Sedan hîwaw sedan awat

Xoyan melas dawê le qelay karesat . (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 56)

Di vê helbestê de helbestvan ew mebest û xeyala ku hebûye weke peyamekê arasteya neheskiriyan kiriye. Ji ber ku gelek bi ciwanî peyv çinî kiriye, lewra her ji hîlbijartina nav û nîşanê wê (Nameyek Bo Reşeba) ewqas zêdetir wate û mebesta helbestvanîyê xuya kiriye û diyare (reşeba) (barove) ji bo wateya rast û dirûst a ferhenga xwe nehatiye bikaranîn lê ji bo wateya neheskirî û neyarên neteweya Kurd hatiye bikaranîn. Ji ber ku barove, ji mêj ve bi wateya malwêranî, alozî û naxweşiyên hatiye. Lewra ji destpêkê ve helbestvan peyama xwe arasteya neyaran dike û dibêje: Hûn çiqas zailm û destweş bin jî nikarin me ji nav bibin. Ji ber ku em ji destpêka dîrokê ve rahatîne (hî bûyne) û ji zilm sitemkariyê re natirsin. Di nîvrêza sêyem de peyva (karwan) bikaraniye ku bi wateya qehremanî û şoreşvanîyê bikaraniye. Wate mebesta helbestvan ewe ku bêje neteweya Kurd qehreman û çavnetirse û hertim di berxwedanê de ye, hundirê me dişewite û bi berdewamî dilive de ye weke destanê deng vedide, piştî helbestvan amaje ji bo du çiyayên bi heybet yê Kurdistanê (Qendîl û Pîre Megrûn) dike ku nîşan in ji bo çavnetirsî û qehremaniya neteweya Kurd.

Ji ber ku Kurd neteweyeke li ser mayîna di nava kelha karesatê hîn bûye û sîngê xwe ji ti tiştan nazivîne. Eşkereye xwe bi cîhanbûnê, tê şikandin, jîholêrakirina sînorên çêkirî û biçûkkirina cîhanê weke gundeke biçûk xewna piraniya helbestvanan bûye, lewra piraniya helbestvanan ji mêj ve di çarçoveya xeyala honandina xwe de destûr û sînorên çêkirî yê welatan guhertine û sînorek nû di berhemên xwe de afirandine. Diyare Teyyib Cebbar jî di helbesta (Sirodî

Diwaroj) de behsa wê cîhanîbûnê ji me re dike û weke Ebdûllah Tahir Berzincî dibêje "helbesta Sîroda Diwaroj a Teyyib Cebbar di vî warî de weke marşeke cîhanî xuya dike, xewna mirovan û cîhanê tevlihev dike û dike yek tişt" ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 13). Ji bo mînak helbestvan dibêje:

Rojê dadê

Girî behar

Berdebête şar û ladê

Hemû zemîn

Debêt be yek xanûy nexşîn

Hemû zemîn

Debête yek baxçey rengîn. (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 63).

Diyare peyva (gir) di nîvrêza dûyem de mecaziye û bi wateya xwe ya ferhengî ya rast nehatiye bikaranîn. Lê wateya pêşveçûn û avakirinê digihîne ku helbestvan di helbestên xwe de xwestiyê û xewnê bi wê yekê ve dibîne ku rojekê wê bê cîhan wê gelek pêşve biçê û wê weke yek xanî yan jî yek baxçeyî xuya bibe û mirov wê bi bextewerî bijîn bê ku ji reng, şewe, ziman û nijadê xwe cûda bin, wate xewna helbestvan li vir xewna bi cîhanîbûna û mirov dostiyê ye.

### **3.3.4 Sembol (Hêma)**

Her karek wêjeyî komeke hêmayan li xwe digire. Ji ber ku hêma di bilindkirina asta teksta helbestê de roleke girîng di pêdana wateyên nû bi tiştan dilîze. Lewra bikaranîna hêmayan li cem Teyyib Cebbar ji bo wê yekê bûye ku taybetî bi bîranînan (epistrakt). Bîrên Epistrakt ew bîrin ku ji tirsan desteber û eşkere nabin, vêca çî ji tirsî siyasî, civakî, çandî û olî bin. Ji ber ku xweza tejiye ji xwestekên negihîştî û bîrên xirab. Lewra hêma nûnertiya wan xwestek û hizran dike ku naxwazin eşkere bibin. Her çiqas helbestvan piraniya xwestek û bîrên xwe di helbestên xwe de bi dest dixîne. Ji ber ku hêma peywendiyêke temam bi

mecazê re heye bi awayeke wiha ku "naveroka mecazê pêktîne û li gorî peywendiyên di navbera teksta desthilatê de bi serde heye, bi curek wiha tevayî mecazên bikarhatî di xizmeta hêmayan de ye" (Hêmin, 2008, s. 174).

Sembol an jî hêma di helbesta Kurdî de tiştêk nîne û helbestvanan ji kevin ve pena ji bo biriye û bikaraniye lê taybetmendiyên wê di helbestên helbestvanên hevçax de zêdetir derketine. Rengê wê jî bi sedema vê rewşa nexwastî ya siyasî, civakî û rewşenbîrî be ku rastî helbestvanan hatibû, ne dikarîn bi awayeke rasterast xwesteka xwe derbibirîn. Lewra di helbestên xwe de bi naçarî pena ji bo bikaranîna hêmayan biriye. Ew jî sedemek bû ji bo pêşvebirina vê hunerê lewra hêma "pêkhatiye ji bikaranîna peyvekê yan jî deste peyvekê yan jî hevokekê ku dikare di ramanê dî rehendî de mebesteke rihênî xwe li pişt veşartî be. Ji bilî wateya ferhengê wê" (Fazil, 2007, s. 169).

Lewra helbestvanan bikaranîna hêmayan bi rêyekê dizanî ji bo derbirîna wê mebesta ku di hundirê wan de heye bê dûdîlî xwe ji metirsiyên wê serdemê diparast, ew bi tevî ku gelek ji helbestvanan di vê baweriyê de ne ta hêjmara hêmayan di helbestên wan de zêdetir bin, ewqas bêtir zimanê teksta helbestê wê bilindtir be û bandorên zêdetir li cem xwendevan çêdike, her çiqas hest pêkirin bi wateya hêma li cem her kesekî wekehev nîne. Ji mînak xwendevanek asayî hêmayekê di helbestan de dibîne renga tenê rûyê diyar û eşkere diyarî bike lê xwendevaneke rewşenbîr û şareza ku heman hêmayê dibîne, rehendên veşartî diyarî dike. Lewra bikaranîna hêmayan ji serdemekê ji bo seredemeke din û ji helbestvanekê ji bo helbestvanekê/a din jî cûdaye. Ji ber ku "helbestvan ew hêmayên bikartîne divê ligel rewşa serdema wî/wê bigûnce û wateya nû têde desteber bike. Ew hêmaya ku erkekê pê dide divê amaje bi rastiyan nihênî yên nava mijara hunerî bike" (Şino, 2007, s. 203).

Hêma di helbestên Kurdî de bi yek ji şewazên zelal ên nehiştina wateyê tê dîtin. Ji ber ku dema peyv ji bo wateya rast û dirûst a ferhenga xwe nayêne bikaranîn, hêma û sembolên nû jêre tên gotin ku di berê de hilgirên wan wate û amajeyan nebûne. Ew jî bala xwendevan ji bo bîrkirin û hizrînê dikişîne û bi awayeke

nerasterast peyam pê digihîne, ev şêwaz jî ne asayîbûnê çêdike ku ji xwe nehiştine. Wate helbestvan yek ji wan kesên serkeftî yên di nava civaka xwe de ye ku dikare bi rêya hêmayan helbesteke bibandor bi nivisîne, hizir û bîrên xwe ligel tevlihev bike, lewra helbestvanê/a xwedî karîn dikare heman hêmayê ji bo dem û cihên cûda bi wate û ramanên cûda bikarbîne. Li gorî teoriya Freud jî "hêma taybetmendiyek nîne ji taybetmendiyan xewnê lê taybetmendiyan bîrkirina binşîûrî û bîrkirina gel e bi cureke taybet" (Serdar, 2004, s. 259).

Teyyib Cebbar bi şêwaz û karînen xwe hêma di nava helbestên xwe de bikaraniye, her çiqas li cem helbestvan peyvên ji bo dû mebestan hatiye bikaranîn. Wate mebesta eşkere û veşartî li xwe digirin, ew hêmayên ku helbestvan bikarîne, ji wan hêmayên taybet pêkhatîne ku ji hizra helbestvanên afirîner tene afirandin bê ku mînakê ji berê hebe, ew jî bi rêya peywendiyên hevbeş û nû bi mijarê re bi rêya xeyal û fikara xwe ya afirîner pêktîne.

## - **Gelek Corên Hêmayan Hene Ji Wan Jî**

### **1- Hêmayên Efsane**

Helbestvanên nû û hevçax li gorî asta rewşenbîrî, karîn û şêwaza xwe di helbestên xwe de dest ji bo wan hêmayên efsaneyî dirêj dikin ku wateyeke veşartî li xwe girtin. Vêca her ji efsaneyên Sûmerî, Romanî, Yûnanî, Babilî û Fîrewnî ve bigire ta digihe efsaneyên Kurdî jî, helbestvan sîd ji efsaneyên cîhanî û xwemalî werdigire û hewl dide wan hêmayan bi awayeke wiha bikarbîne ku ligel serdema wê bi gûnce û bi rêya bikaranîna efsaneyan amaje bi hêvî û xwestekên xwe yê veşartî bike. Wate, "Efsane curekê wêjeyê ye ku astengan dide aliyekî û ber bi pêşveçûn û guhertinan ve diçe, dewlemendiya cîhana efsaneyê bûye sedema mayîna çavkaniyeke rengîn di destên helbestvanên nûxwaz ve tenê weke pêdiviyekê lê hatiye" (Kemal M. M., 2004, s. 144).

Hêma weke alaveke honandinê nîşana karîn û şîyanên helbestvane bi wê mercê ku bi serdema xwe re girê bide. Ji ber ku eger helbestvan bi serdema xwe ve girê nede, wê demê eger xwendevan şarezaiyek baş di warê efsaneyê de

nebe li mebesta helbestvan tînagihe. Wê cîhaneke aloz li hemberî wî/wê çêbibe, her çiqas efsaneyên kevin jî bin û ji kûratiya dîrokê hatibe derxistin. Wate, helbestvan bi veşartina wateyên zelal û eşkere efsaneyan bikartîne, lewra helbestvan Teyyib Cebbar jî gelek caran ji bo veşartina wateyên helbestên xwe hewar (pena) ji bo hêmayên efsaneyî biriye.

Helbestvan di helbesta (Silêmani) de dibêje:

Le şarêkî pir req û helmet da

qelay serberzî,

Hezaran dêwî hênaye serçok

hezaran bazûy...

Tûnid û estûrî.

Kird be darêkî puçel wiqir çok. ( Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 86-87).

Helbestvan peyva (dêw) weke hêmayeke efsaneyî bikaraniye ji bo destlata reş û zordariya rejîma Be'esî (Seddâm) ya hilweşayî li dijî gelê Kurd û çewisandin hizra azadî, serbestî, komkujî û ji tûnekirina wan. Ji bo kuştin û girtina li dijî hilgirên bîra azadîxwaziyê û tevgera şoreşên Kurd li Başûrê Kurdistanê, piştî helbestvan li ser helbesta xwe berdewam dibe û şanaziyê bi bajarê Silêmaniyê dike û bi kelha serfiraziyê bi nav dike li dijî tevayî rejîmên yek li pey yekê yên Iraqê ku ti deman serê xwe netewandiye û rû bi rûyê wan bûye, weke darên qûrmiçî û pûç lê kirine û can ji wan standiye. Eşkereye dara qûrmiçî ew dare ku hişk û zûwa bûye û ti sûdeke wê nemaye. wate li vir helbestvan sereferiyê nû bi peyvên (dêw, darî qirçok) re kiriye û delalet û amaje û wateyên nu pêre dayîne da ku bi helbesta nû ya hevçax re bi gunce.

## **2-Hêmayên Olî**

Ji mêj ve helbestvanan pena ji bo wan hêmayên olî birine, bi taybetî ew hêmayên ku dibin sedema nixaftina zimanê helbestên wan, ew hêma jî ji pirtûkên

olî yên weke Qoran, Incîl, Tewrat. û Avestayê wergirtine ku her yek ji wan hêjmareke bûyer û kesayetiyên cûda li xwe digirin. Helbestvanan jî ji bo derbirîna hizir, xwestek û hêviyên xwe hêjmareke wan bûyer û kesayetiyên weke hêmayek bikaranîne ku dibin sedema nixaftina zimanê helbestên wan. Ji ber ku piraniya wan bûyer û kesayetiyên li cem her kesekî ne eşkere ne, Teyyib Cebbar jî weke her helbestvanekê berê xwe û serdema xwe mifa (sûd) ji wan jêderên (çavkanî) olî wergirtiye ji bo ku wan tiştên hizir, hest û xwesteka wî de hene bi rêya wan bûyer û kesayetiyên der bibire.

Helbestvan di helbesta (ew rojey min demrim) de dbêje:

Ew rojey min mirdim

Bumelerze yek

Asman şeq şeq deka

Dûnya hemûy tarîk debê

Wek çon êsta kareba debirê

Herçî awî gerdûn heye derijê,

Ser zewî pir debê.

Şar û şax û deşt û der

Hemûy dadepoşê

Her çî belem û papore nuqim debê

Xelkî hemûy dexnikê

Çen kesê nebê

Be pişte mele bo...

(Keştî nuh)degerên

Pêy ranagirin,

Ewîş win debê. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 16-17).

Helbestvan amaje bi lehiya Hz. Nuh û gemiya wî dike, wêneyekê helbestî pê xemilandiye û mebestên xwe pê derbiriye. Helbestvan dixwaze bi rêya vê çîrokê behsa mirina xwe ji me re bike ku mirineke asayî nine. Ji ber ku helbestvan xwe bi şahê erş dibîne, bi mirina wî karesat rû dide. Her weke çawan xwedayê mezin xezeb li qewmê Hz. Nuh kirî, lehî û lêser jêre şand da ku ji nav bibe. Helbestvan wê bûyerê ji me re vedibêje ku çawan erdhej esman şeq şeq dike û tevayî cîhanê tarî dibe û cîhan tejî av dibe, zûwa namîne, tenê ew rizgar dibin ku bawerî bi Hz. Nuh hebûne û li gemiya wî siwar dibin ewên din jî ku bêbawer bûn nekarîn bigihin keştiyê û xwedayê mezin ew ji nav birin. Helbestvan bûyer bi wê serdemê re gûncandiye, ji ber ku helbestvan qûtkirina elektirîka niha bi wê tariyê şibandiye ku bi sedema lehî û barova wê çaxê çêbûy. Wate helbestvan li vir bi sedema bûyera (Keştiya Nuh) komeke mebestên taybet bi xwe derbirîne, weke hêmayeke olî bikaraniye û bi bûyerên wê serdemê re gûncandiye. Yan jî di helbesta (Kirêwey Hewrêkî Tînû) de dibêje:

Deyanewê

Bra...bê serupêkanim

Rastewebin

Xuşke le xaç dirawekanim helfirin

Kifinî tiwaneweyan bidirin. (Teyib, Lawandinewey Xolemêş, 2008, s. 31-32) .

Helbestvan dixwaze bi rêya bûyera li xaçdana Hz. Îsa behsa bi darvekirna ciwanên neteweya xwe ji aliyê rejîma Be'es ve bike ku çawan canê Hz. Mesîh bilindî esman dibe û heta roja dawiyê bi zîndî dimîne. Bi heman şêwe canê lawên neteweya wî jî bi nemirî dimîne, raste her kes dizane Hz. Îsa kiye lê nizanin peyama wî çi bû ku bû sedema li xaçdana wî. Wate helbestvan li vir li xaçdana Hz.

Îsa weke hêmayekê ji bo derbirîna mebestên xwe bikaraniye û bi serdema xwe re gûncandiye.

### 3-Hêmayên Dîrokî

Dîroka mirovayetiye bi jêder û gencîneyeke dewlemend a hêma û sembolan li ber destê helbestvanan tê danîn. Vêca ew hêma navên kes an cih an jî bajar, gund an bûyereke dîrokî ya diyarkirî bin, helbestvan bi şêwaza xwe hêmayeke xwezatî jê hildibijêre û di helbesta xwe de bi awayeke wiha organîze dike ku ligel serdema wî bigûnce. Helbestvan weke maskeyekê yan jî perdeyekê bikartîne ji bo derbirîna mebest û hîviyên xwe, divê helbestvan di hilbjartina hêmayên xwe de nîşanekê dane da ku xwendevan bi rêya wê nîşanê deriyên daxistî yê wêne û mebestên nixamtî yê helbestvan pê veke û ji mebest û karînen helbestvan têbigihe. Helbestvan di helbesta (Min Hez Dekem) de dibêje:

Min hezdekem

Lew eşkewtey,

Mirasimî yekbûnî...

Dalde da,

Xom mat bidem.

Giwê le tirpey..

Dilî aw bigirim,

Wextî xak helî demijê. ( Teyib, 2015, s. 23). Eşkereye çiyayên Kurdistanê dewlemendtirîn cih in di hebûna şikeftan de û her kes ji şikeftan têdigihe lê ewa ku her kes nizane ewe ku şikeft çi rolek di dîrokê de lehîstiye. Her ew jî ye nixamtina zimanê helbestê çêkiriye, ji ber ku şikeft her ji kevin ve cihê xwe parastina mirovên destpêkê bûye. Cihek bû ji bo xwe parastin û veşartina ji hov û dirindeyan û bûyerên xwezayî, li pey wê jî di çaxa niha de bûye cihê şoreşgerên li dijî rejîmên yek li pey yek ên dagirkerên Kurdistanê. Wate ji kevin ve tenê şikeft



hêmaya parastin û berxwedana mirovayetiye bûye. Helbestvan di helbesta (Takey Wabim) de dibêje:

Takey wabim

takey Mame Xemey bîrûrabim

Nemtwanî hormonî..

Nemirî peydabikem

sal dêt û derrwat

Nemtiwanî hewênî...

Hîç werzêk paşekewt bikem

bo çareserî pekewtin... Bigirmewe. ( Teyib, 2015, s. 188).

Helbestvan kesayetiya Mame Meme weke hêma bikaraniye ji bo ku li pişt wê kesayetiye ewa ku di hundirê wî de heye derbibire û mebesta xwe pê bidest bixe. Diyare Mame Meme ji mêj ve bi kesekî tê gotin ku xem û kovanan ji bo her tiştekî dixwe lê ti karîneke wî nebe. Eşkereye helbestvan jî kesayetiya Mame Meme di xwe de desteber kiriye, bi awayeke wiha di helbesta xwe de bikaraniye ku bi jiyana serdema wî re bigûnce.

Teyyib Cebbar di helbesta (Kem Xwê) de geşteke ji bo esman dike û hêjmareke diyardeyên xwezayî yên weke stêrk bi hêmaya evîndariye dibîne û bi rêya wan hêmayan mebest û hêviyên xwe derdibire. Helbestvan di vî warî de diyardeyên xwezayî bi mirovan şibandiye û bi vê rêye jî li deriyê hêjmareke mebestên din xistiye. Wekî dibêje:

Berêy kakêşanda...

Deçim bo şarî (hewtewane).

Ta direnganî şew

Legel Estêranî Pirç Pexşan

Dekem Gemew Yarî.

Demew Beyan be Diziyewe

Dekişêm bo şuqekey (sîwe îl xan)

Her Leber Dergawe,

Dekewime Maç baran

Legel memik guşîn

Le jûrî pir pirşnig

Des dekem be bezmî dildarî,

Le ser sîsemî dû serî.

Takubike wîne ziguzâ

Minaldanî terî pir şî're pasarî. (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 48-49).

Helbestvan stêrk (sîweylî) weke hêmaya evîndariyê nîşan daye. Wate helbestvan naxwaze rasterast navê evîndara xwe bîne lê bi rêya stêrkan (sîweyl) li deriyê hinek mebestên din biqûte û ligel serdema xwe bigûncîne.

#### **4-Hêmayên Folklorî**

Folklor bi gencîneyeke dewlemend a hîmê zimanê honandinê tê danîn û ji kesayetî, qehreman û bûyerên cûda tejiye, ku dikare weke hêma bêne bikaranîn. Helbestvan Teyyib Cebbar jî sûd ji folklorî Kurdî wergirtiye û bi şêwaza xwe di avakirina helbestên xwe de bikaraniye. Ji bo mînak di helbesta (Serdemanê... Tarîkî Spî Bû) de dibêje:

Emêsta...

kêw be asanî degat bekêw,

Gird deçê begij girda.

Dest naxrête naw dest.

Lêwîş nagat belêw.

Şem welî nanasê,

Mem, pişt deka le Zîn

Şiwênî maç...

Debête daristanî birîn

cêjwan debête goristanî (şîrîn). (Teyib, Ew Rojey Min Demirim, 2010, s. 62-63).

Helbestvan her dû destanên (Şem û Welî), (Mem û Zîn) weke hêmaya evîndariyê wergirtîne û hîmê zimanê helbesta xwe li ser vê ava kiriye û bi rêya van destanan hizir û mebesta xwe derbiriye û ligel helbesta xwe gûncandiye.

## ENCAM

Em di dawiya teza xwe de ghiştin van derencamên li jêr:

1-Teyyib Cebbar weke her dengekê honandinê, sûd ji taqîkirinên helbestên Kurdî yên kevin û nû, yên neteweyên cîran jî wergirtiye û bûye beşek ji hêvênê helbestên wî.

2- Teyyib Cebbar şêwazeke nû di helbestên xwe de bikaraniye ku li cem tu helbestvaneke din nehatiye dîtin. Bi taybetî jî di her dû komeleyên helbestên (Ew Rojey Min Demirim) û (Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden) de .

3- Teyyib Cebbar kariye bi awayeke hişyarane û hunermendane hunera honandinê bike hêvênê mebestên xwe yên siyasî, mirovatî, felsefîk, evîndarî û bûyerên guhertinên jiyana xwe ya rojan e. Ev curê arastekirina helbestê jî ji ber bi wan mebestan, nebûye sedem ku helbestvan ji serederîkirineke ciwankariyane ji helbestan dûr bixe, karînen wî yên honandinê lawaz bike û ji nav bibe.

4- Bûyerên Başûrê Kurdistanê û Iraqê bandorên mezin li ser dîtin û nêrînen helbestvan hebûye û di helbestên wî de rengvedaye û çarenivîsa xwe bi çarenivîsa neteweya xwe ve girêdaye. Bi awayeke gelek zîrek û çavnetirsane weke helbestvaneke rewşenbîr û xwedî karîni di rêzên pêşî ya şoreşê de cih girtiye û behsa karesatên neteweya xwe kiriye. Ji bo niha û siberojê dikare weke çavkaniyeke dîrokî sûd jê bê wergirtin. Ji ber ku gelek bi zelalî behsa wan bûyer û nexweşiyên dike ku bi serê neteweya wî de hatine.

5- Teyyib Cebbar di warê rexneyê de desteke bilind û şarezaiyeke baş di rexneyê de hebûye û bi taybetî rexneya wêjeyî. Di vî warî de jî hinek berhemên rexneyî yên balkêş hene ku hêjayê dîtin û nêrînan e. Ew jî bi tevî ku bi honandinê rexne li partî û desthilatdarên siyasî yên Iraqê û Kurdistanê girtiye. Weke Kurdekê xwedî helwesteke neguher û xemxwerê gelê xwe dest daniye li ser kêmasî û hewlên tamam daye.

6- Teyyib Cebbar sûdeke mezin ji çanda neteweya xwe wergirtiye û di helbestên xwe de bikaraniye û heta asteke baş helbest û wêneyên xwe yên helbestan pê xemilandiye. Her wiha xwendina berdewam û bilindkirina asta xwe ya rewşenbîrî bûye sedem ku helbestvan hûrtir bihizire û bi hiş û hizreke kûr li tişt û diyardeyan binêre. Ew jî rêxweşker bû ku ber bi cîhana fireh a felsefîk ve biçê, ezmûn û şîrovekariyên xwe tevî fikar û sozan bike û bi zimanek helbestvanî di vî warî de helbest û wêneyên rengîn pêşkêşî me bike.

7- Teyyib Cebbar girîngiyekê zêde bi wêneyên hunera helbestê daye û weke pêşekarekê dest rengîn tabloya xwe nexşandiye. Bi dehan wêneyên ciwan di berhemên wî de reng vedidin. Piraniya wan wêneyan jî milkê taybet ê helbestvan in, soz, fikar û hizra hûr têde mezaxtiye.

8- Em dikarin bêjin di vê lêkolînê de helbestvan mijarên rewanbêjîyê bi başî datîne û ji gelek aliyên wê hunera berfireh ve desthilata xwe nîşan daye. Bi taybetî di şibandin, peyvên dûçeng û dijhev de.

9- Helbestvan pîvana tilî û pîvana serbest di helbestên xwe de bikaraniye. Bi taybetî pîvana tilî ku pîvaneke resen, xwe malî û bi nijada Kurdan e.

10- Helbestvan qafiyeya serbest di helbestên xwe de bikaraniye, tenê hinek caran nebe ku hinek nîvrêz li ser yek curê qafiyê diyarkirî hatibin.

11- Helbestvan di helbestên xwe de zimanek sade bikaraniye ku ew jî gihandina peyama helbestvan bi wergir re hêsan dike. Ev zimanê sade jî gelek balkêş, taybet û kurtbirî û hewl daye bi kêmtirîn peyvan ve zortirîn wateyê bide .

12- Gelek sûd ji peyvên Kurdî yên resen û nû wergirtiye. Kariye hinek peyvên nû darêje ku milkê taybet ê helbestvan in. Wate, Teyyib Cebbar ferhengeke taybet bi xwe çêkiriye ku milkê taybet ê wî ye û ew peyv ji aliyê ti helbestvaneke din ve nehatine bikaranîn û nehatine dîtin.

13- Naveroka helbestên wî piraniya mijaran li xwe girtiye, taybetî mebestên siyasî, mirovatî, felsefîk û evîndarî.

14- Ji aliyê siyasî ve helbestvan, di helbestên xwe de gelek bi hûrî serederî ligel bûyerên siyasî yên serdema xwe kiriye, çî bi awayeke rasterast an jî narasterast be.

Bi awayeke giştî ji encama wê behs û lêkolînê xuya dibe ku Teyyib Cebbar helbestvanek mezin û xwedî karîn ê Başûrê Kurdistanê ye. Kesayetiyeke rewşenbîr û Kurdek xwedî helwest e û di serdema wî ya honandinê de bi dehan guhertinên mezin bi ser Iraqê û Başûrê Kurdistanê de hatine. Ew jî her li ser rêbaza xwe ya xizmetkirinê berdewam bûye û nehatiye guhertin û bi tevî vê yekê jî kariye helbestên nemir bihone.



## ÇAVKANÎ

Azad , E. K. (2008). Zimanî Şî'rî Le Nêwan Ezmûnî Şa'îr û Îstatîkay Deq Da (Nalî Wek Nimûne). *Kovarî Zankoy Silêmanî*(24), 8-12.

Bilawgey, P. (2005). *Dîwanî Goran* (Cilt Iv). Tehran: Çapxaney Dalaho.

Birhan, Q. (1974). *Namekanî Qanî'e* (Cilt I). Bexda: çapxaney (Dar El-Tezamin) Ehî.

Çarliz , B. (2002). *Rexney Edebî û Qutabxanekanî* (Cilt I). (Y. Ebdalxaliq , Çev.) Hewlêr: dezgay çap û bilawkirawey Aras.

Casim, A. (2014, 2 17). Belaxet El-Îltîfat Îla El-Emam...El- Mewqif Wel Îhtîcac. *Cerîdet Terîq El-Şe'b*(126).

Dilawer, N. E. (2015). Direng Hatinî Şa'îrêk. *Kovarî Helmet*(5).

Dilawer, Q. (2011). Xwêndineweyek Bo Her Sê Dîwanî Şa'îr. *Rojnameya Lomonr Dîlyomatîk*(19).

Dilşad, E. (1998). *Binyatî Helbest Le Honrawey Kurdî da* (Cilt I). Silêmanî: çapxaney Renc.

Elî,T. Hevdîtin. Silêmanî. 20. 8.2016

Ebdulle , T. B. (2002, 7 25). Şar Wek Deqêk Xwêndinewey Teyyib Cebbar Emîn. *Rojnameya Kurdistanî Niwê*(2817).

Ebdulle, T. B. (2016, 8 16). Ladan..... Pêwerêk Bo Şî'rîyet. *Rojnamwya Peyk*(18).

Ebdûlqadir, M. E. (2004). *Wênay Şî'rî Le Rêbazî Romansî Kurdî da* (Cilt I). Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem.

Ebdûlrezaq, B. (1992). *Kêş û Musîqey Helbestî Kurdî* (Cilt I). Bexdad: çapxaney (Dar El-Huriyet).

Ebdûselam , N. E. (2008). *Şîkirdinewey Deqî Şî'rî Le Rûy Zimanewaniyewe* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Hacî Haşim.

Ebdulxfar, E.-E. (2012, 2 22). Teyyib Cebbar Fî(Qesaid Telteft Îla El-Emam) Me'alm Xaset. *Cerîdet El-Meşriq El-Bexdadiye*(2299).

Ezîz, G. (1999). *Serwa* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Wezaretî Perwerde.

Ezîz, G. (2014). *Kêşnasî Kurd* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Narîn.

Faruq, M. (2010, 9 16). El-Şa'îr Teyyib Cebbar Fî Zate Zeman El-Zulam Kane Ebyez Qesayd El-Henîn We Henîn El-Qesayd. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(2501).

Faruq, M. (2012, 4 22). El- Şa'îr Teyyib Cebbar ...îtlale Ela Beytîhî El-Şî'rî. *Cerîdet Terîq El-Şe'ib*(166).

Faruq, M. (2012, 7 26). El-S'ud Îla(Heware Berze)Behsan 'En Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bazdadiye*(3031).

Faruq, M. (2013, 5 8). Fî Terîq Îla El-Şa'ir El-Muhendis Teyyib Cebbar. *Mecelê Seutul Axer*(438).

Fayeq , H. H. (1990). *Dîwanî Pîremêrd* (Cilt I). Bexdad: çapxaney Wezaretî Roşinbîrî.

Fethulla, H. (2010, 6 16). Fî Zate Zeman...El-Zulam Kane Ebyez Mecmu'et Haflet Bîqsayd Lîehlam Muxtelfet. *Cerîdet El-Îtîhad El- Bexdadiye*(1823).

Fûad, R. (2007). *Deqî Edebî (Edkar, Çêj, Behar)* (Cilt I). Hewlêr: Dezgay Çap û Pexşî Araz.

Hazim, H. (2012, 11 4). Seda Yelteft Wela Yemut, El-Tîkrar Fî El-Tecrbet El-Şa'r Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(3108).

Hîşam, E.-Q. (2011, 5 12). Tetuy' El- Tehewlat El-Şi'rye. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(2687).



Hisên, B. (2017). *Ewrojey Min Demirim Lêkolîneweyeke Le Ser Şî'rêkî Teyib Ceba* (Cilt I). Silêmanî: çapxaney Pîremêrd.

Kemal, M. M. (2004). *Remiz Le Şî'rekanî Şêrko Bêkesî Şa'îr Da. Kovarî Zankoy Silêmanî- Beşî B(14)*.

Kerîm, Ş. (1997, Azarî). *Wêney Şî'rî Le Honrawey Kurdî Da Çon Dirûst Debê û Be Çi Hestêkî Werdegîrê. Kovarî Raman(9)*.

Luqman, M. (2010, 10 3). *El-Şa'r Teyyib Cebbar We Îqa El-Ehasîs Fî Zate Zeman El-Zulam Kane Ebyez. Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye(2515)*.

Luqman, M. (2012, 3 11). *Ruq'e Cuxrafya El-Îtîsal Fî Qesaîd Telteft Îla El-Emam Lî Teyyib Cebbar. Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye(2928)*.

Mehmud, N. (2011, 10 31). *Teyyib Cebbar Le Lubnae. Rojnameya Çawdêr(286)*.

Mihemed , M. F. (2007). *Zimanî Şî'rî Riwaneyekî Zimanewanî û Pragmatîkî. Govarî Kongrey Zansit û Ziman Le Pênaw Perepêdan û Çespandinî Zimanî Kurdî(2)*.

Mihemed , S. H. (2004). *Ew Pîvaney Le Dilewe Helde Qulên* (Cilt I). Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirawekanî Aras.

Mihemed , S. M. (2011). *Binemakanî Rexney Edebî* (Cilt I). Kerkûk,: Çapxaneya Karo.

Mihemed , S. U. (2010, 9 27). *El-Qesîde El-Banuramiye...Înftah El-Feza El-Teşkilî El-Hur. Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye(2794)*.

Mihemed, D. E. (2004). *ROjnamenurûsî Kurdî û Bizutnewey Edebî Le Sayey Yekemîn Deselatî Siyasî Kurdî da* (Cilt I). Çapxaney Jîn.

Mihemed, E. E. (2012). *Pêkhênanî Zimanî Şî'rî Le Riwaney Rexney Edebî Niwê we* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Mûkriyan

Mihemed, K. (2015, 6 5). Dirûstkirdinê Dinyayekî Taze Lay Teyyib Cebbar. *Rojnameya Kurdistanê Niwê*(6698).

Mihemed, K. (2015, 5 15). Teyyib Cebbar Le Nêwan Sê Dîwan Da. *Rojnameya Kurdistanê Niwê*(6679).

Mihemed, K. (2015, 5 22). Zimanê Şî'rî Lay Teyyib Cebbar. *Rojnameya Kurdistanê Niwê*(6686).

Mûhsin, A. (1979). Rengdanewe Le Şî'rî Niwêy Kurdî da. *Govarî Roşinbîrî Niwê*(75).

Muhterem, M. (2014, 12 31). El-Şa'ir Teyyib Cebbar We Qete' El-Şeterenc El- Luxewiye. *Cerîdet El-Sebah*(3282).

Necat, H. E. (2013). *Ziman Ê Fikir Le Nêwanî Tiyor û Praktîk Da* (Cilt I). Silêmanî: çapxaneya Bînayî.

Necmedîn , F. E. (2016, 10 20). Derwazeyek Bo Nasandinê Şî'rî Niwêgerî Le Şî'rî Teyyib Cebbar Da. *Rojnameya Kurdistanê Niwê*(7096).

Perêz, S. (2006). *Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Niwêkirdinewey Şî'ri* (Cilt I). Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirawekanî Aras.

Pexşan, E. E. (2009). *Şêwazî Şî'rî Goran* (Cilt I). Silêmanî: çapxaneaya Renc.

Sebah, Ş. (2015, 1 12). Xwêndinewey Şî'rî Lewaneye..! *Rojnameya Hewlêr*(5056).

Se'îd , F. Y. (2011). *Binyatî Hunerî Le Şî'rî Ehmed Mûxtar Begî Caf Da* (Cilt I). Hewlêr Binyatî Hunerî: çapxaneya Roşinbîrî.

Se'îd, M. E. (2014). *Rehendî Rextneyî Le Govarî Ayinde*. Kerkûk: Çapxaneya Karo.

Sewsen, E.-B. (2012, 7). El-Teşkilat El-Lewnye Fî Şi'r Teyyib Cebbar. *Mcelet Gelawêjê Niwê El- Erebî*(32), 163-170.

Tehsîn, Î. D. (2005). *Mem û Zîn* (Cilt I). Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Parwerde.

Teyyib, C. (2011). *Ew Şî'raney Awir Bo Pêşewe Deden* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaney Pencere.

Teyyib, C. (1995, 7 6). Şî'r û...Yarî Topî Pê. *Rojnamey Kurdistanî Niwê*(1028), 6-7.

Teyyib, C. (1996). Zimanî Şî'r, Lêkolînewe. *Kovarî Êsta*(2), 6-7.

Teyyib, C. (2008). *Lawandinewey Xolemêş* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaney Karo.

Teyyib, C. (2009). Edebî Jin û Edebî Piyaw. *Kovarî New Şefeq*(67).

Teyyib, C. (2015). Bibore Qurban Min Le Derewey Bazinem. *Rojnamey Kurdistanî Niwê- Paşkoy Edebu huner*(903).

Teyyib, C. (2015). *Geran Be Diway Îqa'î Wişeda* (Cilt II). Silêmanî: Çapxaney Pencere.

Teyyib, C. (2015). *Serdemaê Tarîkî Spî Bû* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaney Pencere.

Zuhêr, E.-C. (2010, 10 19). Bunyet El-Wîlade El-Şi'rye. *Cerîdet El-Sebah El-Bexdadiye*(2087).

Adil, M. P. (2010). *Sozî Lîrîk Le Ezmûnî Şî'rî Kurdî da* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Roşinbîrî.

Amced, N. E.-Z. (2012, 10 21). Bunyet El- Daxl Bunyet El- Xarc:Qraet Fî Nisus Qsaid Tlteft Îla El- Emam Lîşa'ir Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Nas El-Bexdadiye*(353).

Arî , S. K. (2002). Wêney Hunerî Le Şî'rî Nalî da. *Govarî Kosar*(2-3).

Aso, E. M. (2007). *Behay Îstatîkyekanî Şî'rî Lay Pîremêrd û Şêx Nûrî Şêx Salih û Salim û Goran*. M Têz, Kolêjî Perwerde, Zankoy Selahdîn, Hewlêr.

Azad, E. K. (2013). *Rexney Edebî*. Silêmanî: Çapxaneya Karo.

Bekir, D. (2012, 8 5). Teyyib Cebbar ...El- Îltîfat Îla El-Emam Qsaid Bîluxe El-Eqeliye. *Cerîdet El- Îltîhad El- Baxdadiye*(3039).

Bnkeî Edebyu Runakbîrîy Gelawêj, B. (1999). *Tîrajekan û Şî'rî Şêrko Bêkes, Lêkollînewe* (Cilt I). Silêmanî: çapxaneya Danaz.

Can, K. (2008). *Binyatî Zimanî Şî'rî* (Cilt I). (A. E.-E. Berzincî, Çev.) çapxaney Arbixa.

Cebar Ehmed Hûsên. (2008). *Îstatîkay Deqî Şî'rî Kurdî Kurdistanî Iraq(1950-1975)* (Cilt I). Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem.

Ebdûhxefar, E.-E. (2010, 10 23). El-Te'emuq El-Înfialî Lîl Heyat Fî Zate Zaman ...El-Zulam Kane Ebyez. *Cerîde El-Meşriq El-Bexdadiye*(1828).

Ebdulkerîm , Y. E.-z. (2010, 8 3). Mîras El-Kiurdye Zete Zaman...El-zulam Kane Ebyez. *Cerîdet El-Îltîhad El-Bexdadiye*(2467).

Ebdûllah , X. M. (2004). *Lêkolîneweyek Le Şî'rî Hemdî* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Berêweberayetî Roşinbîrî.

Ebdûllah, T. B. (2016). *Endazey Wişe û Wêne Le Barey Ezmûnî (Teyyib Cebbar) Şa'îrewa* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaneya Pencere.

Ebdulle , T. B. (2011, 10 31). Derbarey Em Deqe Cogeyek Aw Lay Daye Malî Ême. *Rojnameya Çawdêr*(286).

Ebdulle , T. B. (2016, 4 28). Formalîzmî Rûsî Bnema û Praktîk Şî'rî Teyyib Cebbar Be Nimune. *Rojnameya Kurdistanî Niwê*(6957).

Ebidûlqadir, Y. (2005). *Dengî Beluî Deq*. Silêmanî: Çapxaneya Raz.

Ednan , E. T. (2009). *Şî'rî Folklorî Kurdî Le Rojhellatî Kurdistan*. M Têz, Zankoy Silêmanî.

'Ednan, E. (2013, 1 30). Îxtîraq El-'Etmî B'în Brîet El-Şa'r Teyyib Cebbar Fî El-Zulam Kane Ebyez. *Cerîdet El- Sebah El- Cedîd El-Bexdadiye*(2486).

'Elwan, S. (2012, 5 29). El-Xîtab El-Şî'rî Fî (Qsaid Telteft Îla El-Emam) Lewhat Fenyet Muqtesîdet Fî El-Fazîha Memluet Fî Meanîha. *Cerîdet Terîq El-Şe'b El- Bexdadiye*(189).

'Eqîl, H. E.-Z. (2011, 12 17). Mersyet El- Remad Fî Kîtab Zate Zeman...El-Zulam Kane Ebyez. *Cerîdet El- Zeman El-Bexdadiye*(472).

Erselan , B. Î. (2003). *Sîmay Şî'rî Kurdî Diway Raperîn (1992 – 2002)* (Cilt I). Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem.

Ezîz Gerdî. (1999). *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî* (Cilt I). Hewlêr: çapxaneyaya Wezaretî Roşinbîrî.

Faruq, M. (2011, 8 16). El-Şa'îr Teyyib Cebbar ...El-'Ewdet Îla Uxinyat Beraetul Ma. *Cerîdet El-Îtîhad El-Baxdadiye*(2763).

Faruq, M. (2011, 1 30). Zate Zeman...El-Zulam Kane Ebyez...Teyyib Cebbar, We Neqil El-Yewmî Şi'ryen. *Cerîdet El-Nas El-Bexdadiye*(144).

Faruq, M. (2016, 3 4). Teyyib Cebbar...El-Hekîm We Xwayat Exanî hî El-Muereqe. *Cerîdet El-Zeman Erebî*(5358).

Fayeq, M. (2012, 10 25). Yotobya Teyyib Cebbar. *Cerîdet El- Zeman El-Lendenye*(4339).

Fayeq, M. (2013, 6 19). Fî Tecrbet El-Şi'rye Lî Teyyib Cebbar Hedsî Min Kurdistan Yelqî Şi'reh Min Murtefe'at El-Ruh. *Cerîdet El- Zeman El-Lendenye*(4534).

Fazil, M. M. (2007). *Sirûşt Le Şî'rî Goran Da* (Cilt I). Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem.

Ferhad , Q. K. (2009). *Binyadî Wêne Le Şî'rekanî Hemdî Da*. D Têz, Kolêcî Ziman, ZankoySilêmanî, Silêmanî.

Ferhad, P. (2002). *Rêbaze Edebiyekan*. çapxaneya Wezaretî Perwerde.

Ferîd, E. (2013, Şita). Şî'rî Teyyib Cebbar ...Ezwa Ela Tecirbet Şa'ir Kurdî Me'asr. *Mcelet Serdm El-Erbî*(36), 163-166.

Hawjîn , S. Î. (2008). *Binyatî Wêne Hunerî Le Şî'rî Şêrko Bêkes Da*. M Têz, Zankoy Koye.

Hekîm , N. E.-D. (2010, 12 10). Hedase Ma Be'de El- Hedase. *Cerîdet El-Îtîhad El- Bexdadiye*(2584).

Hemîd, E. (2005). *Seretayek Le Felsefey Klasîkî Yunanî* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaneya Şivan.

Hêmin, O. E. (2008). *Çend Layenêkî Şî'ryet Le Koçîrokî Jakonî (Cebare Cemal Xerîb) Da*. M Têz, Kolêcî Ziman- Zankoy Selahedîn.

Hîşam , E.-Q. (2013, 1 10). Telteft Îla El-Emam...Yenabî' Xeyr Mehçure Teitî Îla Haza El-Mkan. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(3156).

Hisên Befrîn. (2017). *Ewrojey Min Demirim Lêkolîneweyeke Le Ser Şî'rêkî Teyyib Cebbar* (Cilt I). Silêmanî: çapxaneya Pîremêrd.

Hisên, B. (2016, 12 15). Xwêndnewey Şî'rî Ew Rojey Min Demrimî Teyyib Cebbar. *Rojnameya Kurdistanî Niwê*(7144).

Hîtler , E. H. (2001). *Wêney Şî'rî Lay Nalî*. M Têz, Zankoy Selahedîn, Hewlêr.

Îbrahîm, E. (1973). *Musîqa El-Şî'r* (Cilt IV). Beyirt: Metbe'e(Dar El-Qelem).

- Îbrahîm, M. (2013, 9 20). Qesaid Telteft Îla El-Emam Lî Teyyib Cebbar Neq Yelteft Îla El-Xelf. *Cerîdat El-Qdis El-Erebî*(7545).
- Idrîs, E. (2011). *Ciwankarî Şî'rî Klasîkî Kurdî* (Cilt I). Hewlêr: çapxaneyaya Hêvî.
- Idrîs, E. (2013). *Şêwazgerî Ladan* (Cilt I). Silêmanî: çapxaneyaya Lerya.
- Îsma'îl , Î. S. (2005). *Edebî Rojnamenûsî Baxdad (1970- 1974)Qonaxêkî Niwê* (Cilt I). Baxdad: Çapxaneyaya dîlman.
- Kejal, H. E. (2010). *Binyatî Hunerî Le Şî'rekanî (Fereydûn Ebdûl Berzincî)da*. M Têz, Zankoy Silêmanî, Silêman.
- Kemal, M. M. (2003). Wêne Le Şî'rekanî Qûbadî Celîl Zade. *kovarî Zankoy Silêmanî Beş B(12)*.
- Mihemed, K. (2008). Endazyarêk Ciyawaz Qise Le Şî'ri û Huner û Endaze Dekat. *Kovarî Henar(26)*.
- Letîf, B. (2009). *Sabrî Le Dû Dûtwey Çend Lêkolîneweyek Da* (Cilt I). Kerkûk: Çapxaney Kurdistan.
- Mehmud, L. (2012, 9 23). Muqabele. *Cerîdet El-Taixî*(6408).
- Me'ruf , X. (1962). *Kêş û Serwa Le Şî'rî Kurdî da* (Cilt I). Bexdad: çapxaneyaya El-wefa.
- Mihemed , M. F. (1990). *Zimanewanî* (Cilt I). Hewlêr: çapxaneyaya DarEl-hikme.
- Mihemed , N. E. (1976). *Dîrasat Fî El-Şirul El- Farisî* (Cilt I). El-Qahîre: Dar El-Seqafet Lîltîba'et Welneşir.
- Mihemed , S. U. (2012, 11 13). Hereket El-Mefariqe El-Şi'rye ...El-Ruiya Wel Teşkîl. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(3116).

Mihemed, F. M. (2011). *Dengî Pîremêrd Le Bizutnewey Şî'rî Niwêy Kurdî da* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Rojhellat.

Mihmûd , N. (2011, 10 31). Teyyib Cebbar Le Lubnane. *Rojnamey Çawdêr (Paşkoy Rexney Çawdêr)*(264).

Mûhsîn, E. M. (2013). *Behay Reewanbêjî (watenasî, rûnbêjî, ciwankarî)* (Cilt I). Hewlêr: çapxaney Narîn.

Necmedîn , F. E. (2016). *Ciwanî Mehal Derwazeyek Bonasandinî Niwê Gerî Le Şî'rî Teyyib Cebbar Da* (Cilt I). Silêmanî: çapxaney Pencere.

Necmedîn, F. E. (2011, 1 8). Ciwanî Mehal Le Honrawey Serdemanê... *Tarîkî Spî Bû. Kovarî Henar*(60), 9-39.

Necmedîn, F. E. (2016, 10 31). Derwazeyek Bo Nasandinî Niwêgerî Le şî'rî Teyyib Cebbar Da. *Rojnameya Kurdistanî Niwê*(7090).

Nesrîn, R. Î. (2010). *ERKÎ Şî'rî Le Edebî Kurdî Da* (Cilt I). Hewlêr: Çapxaney Rojhillat.

Şakir , M. S. (2010, 10 16). Bunyet El-Mîtafîzîqya Welruia El-TeXelye Fî Nes Yewme Emut Lî Şa'ir Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Îtîhad El-Baxdadiye*(2544).

Saman, E. (2010). *Binyatî Wêney Şî'rî Letîf Helmet* (Cilt I). Silêmanî: çapxaney Kemal.

Sedîq, S. R. (2014, 5 14). Retkirdnewey Êsta û Geranewe Bo Rabirdû Le Serdemanêy- Teyyib Cebbar Da. *Heftenameya Rêgay Kurdistan*(1078).

Sefa, Z. (2017). *Îwrişd El-Zulam Îla Terîq Fî Tecrîbe Teyyib Cebbar El-Şî'riye* (Cilt I). El-Besre: Dar Weraqun.

Selah, H. (2013, 6 14). El-Întîfazet El-Kurdiye Fî Qesaid Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Heyat*(18333).



Selah, R. (2016, 8 18). Rengdan Be Wişe Le Komele Şî'rî Sardemanê Tarîkî Spî Bûda. *Rojnamaya Kurdistanî Niwê*(7048).

Senger, Q. (2012). *Le Roxî Rûbarî Wêjewe*. Kerkûk: Çapxaney Karo.

Serdar , E. H. (2004). *Binyadî Wêney Hunerî Le Şî'rî Kurdî Da (1970-1991)* (Cilt I). Silêmanî: Dezgay Çap Û Pexşî Serdem.

Şino, M. M. (2007). *Rolî Siwarey Îlxanîzade Le Niwêgerî Şî'rî Kurdî Da* (Cilt I). Silêman: çapxaneya CWar Çira.

Suha, Ş. (2010, 7 22). Muqabele. *Cerîdet El-Qbis EL-kuîtiye*(13344).

Şukiriye, R. (1989). *Edebî Kurdî Û Hunerekanî Edeb* (Cilt I). Erbî: çapxaneya El-Te'lim El-'alî.

Teyib, C. (1995, 10 9). Baznekanî Gul Bê bazney Şî'r. *Rojnameya Kurdistanî Niwê*(1108).

Teyib, C. (2008). Hevdîtin. *Kovarî Henar*(26), 125-133.

Teyib, C. (2010). *Ew Rojey Min Demirim* (Cilt I). Silêmanî: Çapxaneya Şivan.

Teyib, C. (2013, 7 10). Em Şî're Wazim Lê Nahênê. *Rojnamey Çawdêr- Paşkoy Rexney Çawdêr*(365).

Teyib, C. (2013, 10 7). Goranî Ewaney Xewiyan Dezirê. *rojnamey Çawdêr*(365).

Teyib, C. (2014). Ta Êsta Hîç Şî'rêkim Têr Xew Nebûwe..!! *Rojnamey Çawdêr, Paşkoy Rexney Çawdêr*(391).

Teyib, C. (2016, 4 21). Derdewan. *Rojnamey Kurdistanî Niwê- Paşkoî Eduhuner*(944).

Teyib, C. (2017). Ew Namaney Le Der Şarewe Bom Hatin. *Rojname Kurdistanî Niwê*(7202)

Teyib,C. Hevdîtin. Silêmanî. 10. 8.2016.

Teyib,C. Havdîtn, Silêmanî. 24.11.2016.

Teyib,C. Hevdîtin. Silêmanî. 5.12.2016.

Teyib,C. Hevdîtin. Silêmanî. 25. 2.2017

Wicdan, E. (2012, 2). Îsqat El-Ulfe We Î'adtha Bîeşya El-Muhît Dîwan(Qsaid Telteft Îla El-Emam Enmuzecen). *Mcelet Gelawêjî Niwê El-Erebî*(31), 164-166.

Yûsif, Y. (2014, 9 25). El-'Tibar We Hidud El-Nes El-Ş'rî. *Cerîdet El-Îtîhad El-Bexdadiye*(3637).

Yûsif, Y. (2014, 8 26). Sedmet El-Şi'r We Şi'r El-Cenet El- Mefqude....Teyyib Cebbar. *Cerîdet El-Îtîhad El- Bexdadiye*(3603).

Zuhêr, B. B. (2010, 7 30). El-Teqe El-Kamîne Lîl Nes Tuhqîq El-Teltfî El-Îcmalî Fî Mecmu'et El-Şa'r Teyyib Cebbar Fî Zate Zeman ...El-Zulam Kane Ebyez. *Cerîdet El-Îtîhad El-Baxdadiye*(2463).